

**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Ümit IŞIK**

**KÜRTÇE SÖZLÜKLER ÜZERİNE BİR ÇALIŞMA**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ-2017**

**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Ümit IŞIK**

**KÜRTÇE SÖZLÜKLER ÜZERİNE BİR ÇALIŞMA**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**  
**Prof. Dr. Abdullah KIRAN**

**MUŞ-2017**

**K.T.**  
**ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN**  
**ENSTÎTUYA ZANISTIYÊN CIVAKÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Ûmit IŞIK**

**XEBATEK LI SER FERHENGÊN KURDÎ**

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**  
**Prof. Dr. Abdullah KIRAN**

**MÛŞ-2017**

## SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönergesine göre hazırlamış olduğum “Xebatek li ser ferhengên Kurdî ( Kürtçe sözlükler üzerine bir çalışma)” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin 3 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, Dönem Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

07/03/2017

Ümit IŞIK

## TEZ KABUL TUTANAĞI

### SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Prof. Dr. Abdullah KIRAN danışmanlığında, Ümit İSİK tarafından hazırlanan bu çalışma 12./07/2017 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından .. Kült. Dil. ve Kültürü .. Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan: Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ

İmza:



Jüri Üyesi: Prof. Dr. Abdullah KIRAN

İmza:



Jüri Üyesi: Yrd. Doç. Dr Ayhan TEK

İmza:



## NAVEROK

NAVEROK .....	I
KURTE.....	III
ÖZET.....	IV
ABSTRACT.....	V
PÊŞGOTIN.....	VI
KURTEBÊJÎYA PEYVAN.....	XVIII
DESTPÊK .....	1

## BEŞA YEKEM

### XEBATEK LI SER FERHENGÊN KURDÎ

1.1 FERHENGNASÎ .....	5
1.1.1. Teorî Ferhengnasiyê.....	6
1.1.2. Dîroka Ferhengnasiyê .....	8
1.1.3. Qadên têkildariyêFerhengnasiyê.....	11
1.1.4. Termînolojiya Ferhengnasiyê .....	11
1.1.5. Bi zanistên din re têkildariyê Ferhengnasiyê.....	12
1.1.6. Armanca Ferhengnasiyê.....	15

## BEŞA DUYEM

### TESNÎFÊN FERHEHGÊN KURDÎ

2.1. TESNÎFÊN FERHENGÊN KURDÎ.....	17
2.1.1. Kurdî- Kurdî .....	17
2.1.2. Kurdî- Tirkî/ Tirkî- Kurdî .....	37
2.1.3. Kurdî- Erebî/ Erebî- Kurdî/ Kurdî-Erebî-Kurdî.....	56
2.1.4. Kurdî-Erebî- Farsî .....	74
2.1.5. Kurdî- Farsî/ Farsî- Kurdî.....	74
2.1.6. Kurdî- Îngîlîzî/ Îngîlîzî-Kurdî/ ‘Erebî-Îngîlîzî-Kurdî.....	79
2.1.7. Rusî- Kurdî /Kurdî- Rusî.....	83
2.1.8. Ermenî- Kurdî- .....	87
2.1.9. Kurdî- Îtalî... ..	87
2.1.10. Kurdî-Fransî.....	88
2.1.11. Kurdî-Fransî-Îngîlîzî.....	90
2.1.12. Kurdî -Holendî.....	92
2.1.13. Swêdî-Kurdî.....	93
2.1.14. Somerî-Kurdî .....	93

2.1.15. Tirkî-Îngîlîzî-Kurdî.....	94
2.1.16. Kurdî- Almanî/ Almanî- Kurdî.....	98
2.1.17. Kurdî- Azerbaycanî/ Azerbaycanî- Kurdî.....	99
2.1.18. Ferhengên Pirzimanî.....	99
<b>ENCAM.....</b>	<b>112</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>116</b>
<b>PÊVEK.....</b>	<b>120</b>
<b>KURTEJİYAN.....</b>	<b>139</b>
<b>ÖZGEÇMİŞ.....</b>	<b>140</b>



**KURTE**  
**TEZA MASTIRÊ**  
**XEBATEK LI SER FERHENGÊN KURDÎ**

**Ümit IŞIK**

**Şewirmend: Prof. Dr. Abdullah KIRAN**

**2017, 158 Rûpel**

Gelek lêkolîner, nivîskar, helbestvanên Kurd û yên biyanî, li ser ferhengên Kurdî xebat çêkirine. Ev xebat armanc dike ku xebatên ku li ser ferhengên Kurdî hatine çêkirin derxe holê.

Em dikarin bibêjin ku li hemû herêman li ser ferhengên Kurdî xebat hatine çêkirin. Xebatên ku li herêma sovyetê hatine çêkirin bêhtir bi alfabeya Kirîlî, yê ku li herêma başûr bêhtir bi alfabeya ‘Erebî, yê li Anatolî û Ewropayê jî bêhtir bi alfabeya Latînî hatine çêkirin û her wiha bi zaravayên (Kurmancî, Zazakî, Soranî, Behdînî) Kurdî jî ferheng hatine çêkirin. Çêkirina ferhengan ku em pê dizanin di sedsala 17an de bi lîsteya Evliya Çelebî ve dest pê dike û di *Seyhatnameya Çelebî* de cih girtiye (cilda 4. û 5.). Peyre di derheqê ferhengên din de em ê di xebata xwe de bi berfirehî derbarê kunyeyê de agahî bidin. Me qasê 150 ferheng peyda kiriye û di xebata xwe de behsa kunyeya wan kiriye.

**Peyvên Sereke:** Ferhengên Kurdî, Zazakî, Kurd, Ferheng, Peyv, Ziman, Grametîk, Fîlolojî, ‘Erdnigarî, Civakî, Têgeh.



**ÖZET**  
**YÜKSEK LİSANS TEZİ**  
**KÜRTÇE SÖZLÜKLER ÜZERİNE BİR ÇALIŞMA**

**Ümit IŞIK**

**Tez Danışmanı: Prof. Dr. Abdullah KIRAN**

**2017, 158 Sayfa**

Birçok Kürt ve yabancı araştırmacı, yazar, şair Kürtçe sözlükler üzerinde çalışma yapmıştır. Bu çalışmanın amacı kaleme alınmış olan Kürtçe sözlükler hakkında bilgi vermek ve söz konusu sözlükleri tanıtmaktır.

Araştırmamız neticesinde bütün coğrafyalarda Kürtçe sözlük üzerinde çalışmalar yapıldığı görülmüştür. Sovyet Rusya bölgesinde yapılan çalışmalar çoğunlukla Kiril alfabesi ile güney bölgesindeki çalışmalar çoğunlukla Arap alfabesi ve Sorani lehçesine göre, Anadolu'da ki çalışmalar genellikle Latin alfabesi ve Kurmancî lehçesine göre yazılmıştır. Bunun yanında Zazaca ve Behdini lehçeleri üzerinde çalışmalar da yapılmıştır. Kürtçe sözlük çalışmaları ilk olarak 17. yüzyılda Evliya Çelebi'nin Kürtlerin yaşadığı coğrafyaya yaptığı seyahat esnasında derlemiş olduğu Kürtçe kelimelerle başlamıştır. Evliya Çelebi, Seyahatnamesinin 4. ve 5. cildinde bu çalışmaya yer vermiştir. Bu araştırmamızda söz konusu elde ettiğimiz 150 sözlük hakkındaki geniş bilgiler verilmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Kürtçe sözlük, Zaza, Kürt, Sözlük, Kelime, Dil, Gramatik, Filoloji, Coğrafya, Toplum, Sözcük.

**ABSTRACT**  
**MASTER'S THESIS**  
**A STUDY ON KURDISH DICTIONARIES**

**Ümit IŞIK**

**Advisor: Prof. Dr. Abdullah KIRAN**

**2017, Page 158**

Many Kurdish and foreign reserchears, writers, proets and philosophers have worked on Kurdish dictionaries. This study aims to introduce the Kurdish dictionaries that were studied between 1655 and 1990 and provide information about them.

This study shows that there has been research on Kurdish dictionaries in every region. The studies in Soviet Russia were carried in the Cyrillic alphabet, whereas the ones in the southern region were mostly done in the Arabic alphabet according to Sorani diaect. On the other hand, the dictionary researches in Anatolian region were done in the Latin alphabet in Kurmanji dialect. Furthermore, there are studies on Zazaki and Badinani dialects, too. Studies on Kurdish dictionaries started when Evliya Celebi made a list of Kurdish words that he collected while travelling Kurdish region in the 17th century. Evliya Celebi put these studies in the 4th and 5th volumes of his travel book. This study provides extensive information about the 150 dictionaries which were written between.

**Key words:** Kurdish Dictionaries Kurd, Dictionary, Language, Grammar, Philolog, Geography, Society, Word.

## PÊŞGOTÎN

Alfabe, rêziman û ferheng; sê stûnên zimanekê ne. Ferheng; xezîneya peyvên zimanekê an jî zimanan e. Digel awayê gotin û nivîsandina peyvên rehê wan jî bi bingeşê berhev dike, bikaranînên wan ên cuda nîşan dide. Bi rastî ferheng tenê peyvên nade nasîn jî aliyekê ve jî çand û zimanê gel jî derdixe holê.

Ferheng bîra gelan e. Wisa tê xuyakirin ku heya mirovahî hebe jî bo nasandina civak û zimanê civakan lazim e ku peyvên di nava gel de tê bikar anîn bî berhevkerin û qeydkirin. Amadekirina ferhengan, karekî zehmet e û zêde hesasiyet dixwaze. Di salix û diyarkirinan de heke hevkeşe neyê pêkanîn, xeletiyên mezin çêdibin. Bo nimûne îhmalkirina bêhnokê bi serê xwe dibe sedema pîrsgirikeke mezin. Ji ber vê jî, ji hîlbijartina peyvên heta nivîsandina wan, ji dorkirina xalên hundir heta salix û diyarkirinên ku hatine kirin, di her gavê de pêwistiya baldariyê heye. Piştî van xalên girîng, ji bo pêkhatina ferhengeke baş, pêwist e ku rêbazeke tekûz jî were şopandin. Di qadeke ev qasî hessas de, nehêsan e ku mirov berhemêke bêqûs amade bike. Demêke dirêj û sebreke fireh lazim e.

Amadekirina Ferhengan karekî zor û zehmet e, barekî giran e û karekî bi rûmet e. Digel xebat û lêkolîneke dûvdirêj cesaretê dixwaze. Li hember evqas asteng û zor û zehmetî heya niha gelek zana û nivîskarên biyanî û yê Kurd li ser ferhengên Kurdî xebitîne. Têkiliya dîroka nivîsandin û çapkirina ferhengên Kurdî bi dîroka fêrbûna zimanê Kurdî re heye; her wisa têkiliya wê bi tarîxa komkirin û çapkirina nimûneyên folklorî û lîteratûra wan re jî heye. Di derbarê ferhengnasiya Kurdan de walatên din de gelek xebat hatine çêkirin. Li Tirkiyê di vê mijarê de di demên dawî de xebat hatine çêkirin xebatên kevn gelek kêmtir in. Li ser komkirina bêtir nimûneya herî pêşî, xebata Evliya Çelebî (1611-1682) tê zanîn. Evliya Çelebî di sala 1655an li herêmên ku Kurd dijîn derketiye gerê listeya bêtir nimûneyên Kurdî çêkiriye. Piştî Evliya Çelebî, Ehmedê Xanî (1651-1707) di sala 1683an de bi navê *Nûbihara Biçûkan* ferhengek amade kiriye. Li ser ferhengan di lîteratûra Ewropayê de xebata ewil a di derheqê zimanê Kurdî de Gramatîk û Ferhengoka Garzonî ye ku di sala 1787an de bi navê *Rêziman û Ferhenga Zimanê Kurdî* ye tê zanîn. Zimannasê Polonî M. Auguste Jaba (1801-1894) Ferhenga Kurdî-Fransî amade kiriye. Di sala 1879an de li bajarê Petersburgê Alman Ferdînannd Justî li ser vê ferhengê xebitiye û wê xebata xwe çapkiriye. Di derbarê ferhengan de xebata herî mezin bi destê nivîskar û

zanayên Kurd li Iraqê û Îranê û li yekitiya Sovyetê hatine kirin. Li herêma Iraqê Gîwî Mukriyanî (1920-1986) di sala 1950an de ferhengeke amade kiriye. Mukriyanî ne tene ferhengek çê kiriye, çend ferhengên din jî amade kiriye. Pişt re li herêma Rusyayê bi taybetî Qanatê Kurdo, Farîzov, Bakoev, Maksimê Xemo, P.Lerch, M. U. Khamoian, A.Êgîazarov divê qadê de xebitîne. Me di xebata xwe de di derbarê wan ferhengan û yên wekî din ku me peyda kirî dê bi awayekî berfireh agahî dane.

Me di vê xebatê de nêzê 150 ferheng bi dest xist û me wan bi çend aliyan ve dan nasîn. Ji wan hin ferhengan wekî kitêb, hin pdf, hin jî li ser internetê hatine peyda kirin. Me di vê xebatê de bi perspektîfeke berfireh behsa ferhengên di hemû diyalektên Kurdî de kiriye. Me wek rêbaz di derbarê her ferhengê de agahiyên kunyeyê daye û di derbarê naverokê de jî bi kurtasî agahî daye. Ferhengên ku me bi dest xist ji hêla alfabe, navên ferhengan, bi çend rûpelan û çend peyvan pêk hatiye, li kîjan herêmê hatiye çêkirin, hin muqayesekirina wan, di kîjan demê de hatiye çêkirin, kînga û li kîjan weşanxaneyê de hatiye weşandin, cureyên ferhengan hwd. Li gel vê ferhengên ku di vê xebatê de cih girtine ji aliyê kêmasiyan ve jî hatine rexnekirin. Herwiha me ji nusxeyên resen yên hinek ferhengan ji bo ku bibe mînak rûpel li xebata xwe zêde kiriye. Dema ku ev xebat hate amadekirin heta ji dest hat, tevgerê hûrbijêr hate kirin.

Me di vê xebata xwe hinek behsa ferhengên soranî kir lê di derbarê ferhengên goranî de me tu agahiyek nedaye. Di dawiya xebatê de derbarê ferhengên zazakî bi beşek cuda me agahî daye.

### **Ferhengên Gotinên Pêşiyên Biwêjan**

Çiya Mazî bi navê Ferhenga *Gotinên Pêşiyên*, Mustafa Borak bi navê *Ferhenga Biwêjan*, Mehmet Öncü bi navê *Ferhenga Biwêjan* ferhengek, Dîlawer Zeraq bi navê *Deyimler Sözlüğü-Ferhenga Biwêjan*, Ferhengeke bi navê *Gotinên Pêşiyên û Biwêjên Botan* ji aliye Abdulkadir Bingöl, Sadiq Bahaeddîn bi navê *Îdyomêt Kurdî*, bi navê *gotinên pêşiyên ên kurdan* Mele Üsivê Celalî, Mehmet Oncu bi navê *101 Biwêj- Çîrok* hwd.

### **Ferhengên nebatan**

Ahmet Kasımoğlu/Ehmedê Dirihî bi navê *Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî bi Kurdî-Kurdî-Latînî-Tirkî*, *Tirkî-Latînî-Kurdî*, *Latînî-Kurdî-Tirkî*, Lêkolîner Mehmet Fırat bi Latînî-Kurdî-Tirkî bi navê *Ferhenga Navên Riwekan* ferhengeke amade kiriye.

### **Ferhengên hiqûqê**

Ferhenga Hiqûqî ya yekem ku tê zanîn bi Kurdî (Sorani)-'Erebî-Îngîlîzî-Fransî ji aliyê Nouri Talabany (Nûri Talabani) ve hatiye amade kirin. Ferhenga Hiqûqî ya *Tirkî-Kurdî, ferhengeke peyvên dadnasî/hiqûqî* ya ji aliyê parêzer Hüseyn Özdemir ve hatiye çêkirin. Ferhenga huquqî ya Sezgin Dinç bi Tirkî- Kurdî hatiye amade kirin.

### **Ferhenga Erdnîgariyê**

Bi navê *Ferhenga Erdnîgariyê* ji hêla Qonseya Ewrûpayê ve di sala 1967an de, *Ferhenga Erdnîgariyê* di sala 2008an de ji aliye Abdurrahman Önen ve hatiye amadekirin.

### **Ferhengên menzûm**

Di edebiyata kurdî ya klasîk de tradîsyona ferhengnivîsiya menzûm ji aliyê Ehmedê Xanî, di sala 1683yan de bi Nûbehara Biçûkan dest pê kiriye. Gulzar ji aliyê Îsmailê Bazîdî (1655-1710) hatiye nivîsîn ku bi Kurdî- Farisî- 'Erebî ferhengeke sêzimanî ye. Luxetnameyî Ehmedî ya Şêx Marûfê Nodeyî ku Kurdî(sorani)- 'Erebî ye di sala 1790an de hatiye nivîsîn. Xeleka dawî ya vê tradîsyonê ferhenga menzûm Mîrsadu'l-Etfal e ku bi kurdî-farsî ye û ji aliyê Şêx Mihemed Kerbelayî ve di sala 1912an de hatiye nivîsîn.

*Ferhengên Etîmolojîyê, Ferhenga Mîtolojiya Kurdî, Ferhenga Çapameniyê, Ferhenga Peyvên Dadwerî ya Kurdî (Kurmançî)-Îngîlîzî/Kurdish-English Dictionary of Legal Terms bi navê Mafname, Ferhenga bi navê Ji bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî, Ferhenga Zanyarî, Ferhenga Mîtolojîyê, Wêneferhenga (Photodictionary) English-French-Kurdish, Ferhenga Aboriyê, Ferhenga Zanistên Civakî, Ferhenga Botan[Peyvên Wenda], Ferhenga Bêwar; Dar û Ber, Sewze û Mêwe, Ajal û Sewal, Alav û Amûr, Ferhenga Termên Fenî Kurdî (Kurmançî)-Tirkî- Îngîlîzî/Fen Terimleri Sözlüğü Türkçe-Kürtçe- İngilizce, Dictionary Scientific Terms, Ferhenga Termên Matematikê hwd.*

### **Ferhengên Zazakî**

Me di xebata xwe de ferhengên ku bi zaravayên Zazakî (Dimilî) hatine amadekirin, di dawî de bi beşeke cuda daye nişe kirin. Komala Xebata Vateyê, Malmîsanij, Roşan Lezgîn, Harun Turgut, Mehmet Aydar, Kamber Akbalık, Serkan Oğur, R. Hayıg û B. Werner, Alî Ekîcî, Çeko Kocadağ, Hüseyn Çakmak, Musa Canpolat,, Mesut Özcan, Munzur Çem, Turan Erdem û Orhan Erdem, Seîd Verroj û

Abdurrahman Uçaman bi hev re û Seîd Veroj bi tenê ferhengeke jî amade kiriye. Di vî xebata min de yên ku alikarî û hêvîşandina xwe ji me kêr mekirin mamoste Ayhan Tek, Şeyhmus Orkin, Eyyüp Görtürk û ji aliyê teknîkî ve Nevzat Erdoğan û Cihan Kaynar re spasîyên xwe ji wan dikim. Rêvebirê xebata min û şêwirmendê min mamoste Abdullah Kîran re spasîyên xwe peşkeş dikim.



Ferhengên Kurdî (Li gorî kronolojiya çapê)

SALA ÇAPÊ	NAVÊ FERHENG	ZIMAN	ALFABE
1655	<i>Evliya Çelebi Seyahatname</i>	Kurdî- Tirkî	Latîn
1683	<i>Nûbihara Biçûkan(Ehmedê Xanî)</i>	Kurdî- 'Erebî	'Erebî
.....	<i>Gulzar/ Kurdî-Erebî-Farisî (Îsmailê Bayezîdî (1655-1710))</i>	Kurdî- Erebî- Farisî	'Erebî- Latîn
1787	<i>Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda(Dal P. Maurizio Garzonî)</i>	Kurdî- Îtalî	Latînî
1787	<i>Muqayeseya Hemû Ziman û Zaravayan (P.S.Pallas)</i>		
1790	<i>Luxetnameyî Ehmedî (Şêx Marûf Nodeyî)</i>	Kurdî (Sorani)- 'Erebî	'Erebî
1858	<i>Forschungen Kurden Die Iranischen Nordchaldaer(P. Lerch)</i>	Kurdî- Rûsî	Latînî- 'Erebî- Kirîlî
1879	<i>Dictionnaire Kurde-Français (A. jaba)</i>	Kurdî- Fransî	'Erebî- Latînî
1892-1935	<i>El-Hediyyetu 'l Hemîdiyye fi 'l luxetî 'l-Kurdiyye Yusif Ziyaeddîn Paşa</i>	Kurdî - 'Erebî	'Erebî- Latînî
1912	<i>Mîrsadu 'l-Etfal/ Şehranê Kodekan (Şêx Muhemmed Kerbelayî)</i>	Farisî- Kurdî	'Erebî
1916	<i>Kratkii Russko-Kurdskii Voennyi Perevodchik (Basil Nikitin)</i>	Rusî- Kurdî	Latînî- Kirîlî
1919	<i>A Practical Kurdish Grammar/Ferhenga Kurdî-Îngîlîzî(Fossum)</i>	Kurdî- Îngîlîzî	'Erebî- Latînî
1926-1935	<i>Luxetnameyî Ehmedî/ Ehmedî-Kitêbî Luxetî Kurdî û Tatî (Erebî)( Seyîd Huseyn Huznî el-Huseynî Mukriyanî)</i>	Kurdî- 'Erebî	'Erebî
1950	<i>el- Murşîd/Rehber(Gîwî Mukriyanî)</i>	Kurdî - 'Erebî	'Erebî- Latînî
1955-1957	<i>Ferhenga Kurdî- 'Erebî- Farisî (Merdux)</i>	Kurdî- Erebî- Farisî	'Erebî.
1957	<i>Russko-Kurdskiyi/ Ferhenga Ūrisî-Kurmanc (Îvan Ömer)</i>	Kurdî- Rûsî	Latînî- Kirîlî
1957	<i>Kandîdatê Îlmê Fîlolojiyê /Kurdî-Rusî(Ç. X. Bakoev)</i>	Kurdî- Rûsî	Kirîlî
1957	<i>Ferhenga Ermenî-Kurdî (Siyabendov A.Çaçanî)</i>	Ermenî-Kurdî	Kirîlî
1958	<i>1958/ Emîne 'Evdal Xebername Kurdiye Rastnivîsandinê/ Kurdî-Rusî</i>	Kurdî- Rûsî	Kirîlî

SALA ÇAPÊ	NAVÊ FERHENG	ZIMAN	ALFABE
1960	<i>1960/ Qanatê Kurdo Ferhenga Kurdî-Rusî/ Kurdî-Rusî</i>	Kurdî- Rûsî	Latînî- Kirîlî
1960-1964-1976	<i>Ferhengê Xal/ Kurdî-Kurdî (Muhammed Xal)</i>	Kurdî- Kurdî	'Erebî- Latînî
1962	<i>Ferhenga 'Erebî-Kurdî (Cegerxwîn)</i>	Kurdî - 'Erebî	'Erebî
1962-2006	<i>Ferhenga Ronak (Sêfidîn Ehmed Ebdo)</i>	Kurdî-'Erebî	'Erebî- Latînî
1965	<i>Kurde-Turc-Français- Anglais/Kurdish-Turkish- French-English Dictionary/ (Joyce Blau)</i>	Kurdî-Fransî-Îngîlîzî	Latînî
1966	<i>A Kurdish-English Dictionary(Teyfîq Wehbî û Cecil John Edmons )</i>	Kurdî- Îngîlîzî	Latînî
1967	<i>Ferhenga Khurdî-Tirkî/ Kürtçe- Türkçe Sözlük- 8Musa Anter)</i>	Kurdî- Tirkî	Latînî
1967	<i>Ferhenga Kurdî-Îngîlîzî (Ernest Nasseph McCarus)</i>	Kurdî- Îngîlîzî	'Erebî
1967- 1975	<i>Ferhenga Êrdnîgariyê Konseya Ewrûpayê ( Sami Öngör)</i>	Tirkî- Frensî- Almanî- Îngîlîzî	Latînî
1968	<i>Ferhenga Kurdî-Farisî (Awrang Murat)</i>	Farisî- Kurdî	'Erebî
1972	<i>Ferhenga Kurdî-Kurdî a Çandiniyê (Maruf Karadaxî Merdux)</i>	Kurdî- Kurdî	'Erebî
1973	<i>Îdyomêt Kurdî (Sadiq Bahaeddîn)</i>	Kurdî- 'Erebî	'Erebî
1974	<i>Kurmanji-English, English- Kurmanji Lexicon (Margaret Khan)</i>	Kurdî- Îngîlîzî	Latînî
1974	<i>Ferhenga Zanyarî (Kemal Celal Xerîp)</i>	Erebî-Îngîlîzî-Kurdî	'Erebî
1977- 1979	<i>Qamusî Zimanî Kurdî (Abdulrahman Muhammed Emin Zebihî)</i>	Kurdî-Kurdî	'Erebî
1979	<i>Ferhenga Kurdsko-Russkii Frazeeologicheskii Slovar (M.U. Khamoian)</i>	Kurdî-Rusî	Kirîlî
1981	<i>Ferhengoka Swêdî (Monika Holm û M. Mathlein)</i>	Swêdî-Kurdî	'Erebî- Latînî
1982	<i>Ferhenga Med (Sadiq Safizade Borrekayî )</i>	Kurdî- Farisî	'Erebî
1982	<i>Ferhengê Farisî- Kurdî/ (Şukrullah Baban)</i>	Farisî- Kurdî	'Erebî
1983	<i>Ferhenga Bivêjan/ Kurdî- Rusî (Maximo Xemo)</i>	Kurdî-Rusî	Kirîlî



SALA ÇAPÊ	NAVÊ FERHENG	ZIMAN	ALFABE
1987	<i>Qamûsu 'l-Heyat/ Ferhenga Jîn(Muhemed Cemil Seyda)</i>	Kurdî (Kurmançî)- 'Erebî/	'Erebî- Latînî
1987- 1992	<i>Ferhenga Dimilkî-Tirkî (Malmîsanij)</i>	Zazakî- Tirkî	Latînî
1989	<i>Ferhenga Swêdî-Kurdî/ Svesk- Kurdiskt Lexikon(Reşo Zilan)</i>	Swêdî- Kurdî	Latînî
1990- 2002	<i>Ferhengî Kurdî- Farisî (Ebdulrehman Şerefkendî)</i>	Kurdî- Farisî	'Erebî
1991	<i>Ferhenga 'Erebî-Kurdî (D.Cano û M.Şêrgo)</i>	'Erebî-Kurdî	'Erebî- Latînî
1992	<i>Ferhenga Torî (Mehmet Kemal Işık)</i>	Kurdî-Tirkî, Tirkî- Kurdî	Latînî
1992	<i>Ferhenga Kurdî-Almanî /Kurdish-Deutsches Wörterbuch (Feryad Fazil Omar)</i>	Kurdî- Almanî	'Erebî- Latînî
1992	<i>Wörterbuch Kurdish- Deutsches/Kurdî- Almanî(Amîrxan)</i>	Kurdî- Almanî	Latînî
1993	<i>Dictionary/ Ferheng Kurdî- Îngîlîzî/Îngîlîzî-Kurdî (Rizgar Baran)</i>	Kurdî-Îngîlîzî/Îngîlîzî- Kurdî	Latînî
1994	<i>Kurdish/Kurdî- Îngîlîzî/Îngîlîzî-Kurdî/ (Eziz Amindarov)</i>	Kurdî-Îngîlîzî/Îngîlîzî- Kurdî/	Latînî
1994	<i>Kurdisk-Svensk Ordbok/ Kürdçe-İsveççe Sözlük/Kürtçe-İsveççe/ (Müjde K.Raşîd)</i>	Kürtçe-İsveççe	Latînî
1994	<i>Ferheng Kurdî (Kirmackî/Zazakî)-Tirkî (Munzur Çem)</i>	Kirmackî/Zazakî- Tirkî	Latînî
1996- 2006	<i>English-Kurmanji Kurmançî-Îngîlîzî Word List (By Şîrîn)</i>	Îngîlîzî- Kurdî	Latînî
1997	<i>Zazaca-Türkçe sözlük (Mesut Özcan)</i>	Zazakî- Tirkî	Latînî
1997	<i>Ferhengî Pizîskî: Swedî- Kurdî (Tıp Sözlüğü: İsveççe- Kürdçe) (Müjde K. Raşid)</i>	Kürtçe- İsveççe	Latînî
1997	<i>Ferhengekê Kirdkî-Pehlevkî- Kurmançkî (Malmîsanij)</i>	Kirdki- Pehlevki- Kurmancki	Latînî
1997- 2006	<i>Ferheng Zazakî-Tirkî/Tirkî- Zazakî (Turan Erdem- Orhan Erdem)</i>	Zazakî-Tirkî/Tirkî- Zazakî	Latînî
1998	<i>Salah Saadallah Saladin's English-Kurdish Dictionary/ Îngîlîzî- Kurdî</i>	Îngîlîzî- Kurdî	'Erebî- Latînî
1998	<i>Kurdish Guide With Dictionary/ Îngîlîzî- Kurdî</i>	Îngîlîzî- Kurdî	Latînî

SALA ÇAPÊ	NAVÊ FERHENG	ZIMAN	ALFABE
1998	<i>Ferhenga Kurdî-Tirkî/Tirkî-Kurdî (Ahmet Zekî Okçuoğlu, Habib Çinar û Beşir Ant)</i>	Kurdî- Tirkî/ Tirkî-Kurdî	Latîni
1999	<i>Ferhenga Mişarên Zimanê Kurdî / Kurdî- Azerî (Şamil Esgerov)</i>	Kurdî- Azerî	Kirîli
1999- 2010	<i>Gîwî Mukriyanî Ferhengî Kurdistan/ Kurdî- Kurdî</i>	Kurdî- Kurdî	'Erebî- Latîni
2000	<i>Ferhenga Peyvên Dadwerî ya Kurdî- Îngîlîzî/Kurdish-English Dictionary of Legal Terms Maşname (Husein Muhammed)</i>	Kurdî- Îngîlîzî	Latîni
2000	<i>The Sharezoor Kurdish-English Dictionary (Şaftiq Qazzaz)</i>	Kurdî- Îngîlîzî	Latîni
2000	<i>Ferhenga Tirkî-Kurdî( Zana Farqîni )</i>	Tirkî- Kurdî	Latîni
2001	<i>Husein Muhammed Ferhengoka Peyvên Wêjeyî/Vocabulary of Literary Terms/ Kurdî-Îngîlîzî/ Kurdish-English</i>	Kurdî- Îngîlîzî	Latîni
2001- 2006	<i>2001-2006/Harun Turgut Zazaca-Türkçe sözlük/ Zazakî-Tirkî</i>	Zazakî- Tirkî	Latîni
2001- 2004- 2009-2011	<i>Ferhengaê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî/ Kirmancca(zazaca)- Türkçe Sözlük (Komala Xebatê ya Vateyê)</i>	Kirmanckî (Zazakî)- Tirkî	Latîni
2002	<i>Ferhenga Tirkî- Kurdî (Mehmet Tanrikulu)</i>	Tirkî- Kurdî	Latîni
2002	<i>Ferhenga Gulî (Mes'ûd Xalid Gulî)</i>	Farisî-Kurdî	'Erebî
2002	<i>Ferhenga Kurdî- Holendî/Koerdisch- Nederlands (Mahabad B.Qilorî û Nêçîrvan Qilorî)</i>	Kurdî-Holendî	Latîni
2002	<i>Ferhenga/Vajname Kurmancî-Hewramî-Zazakî (Seîd Veroj - Abdurrahman Uçaman)</i>	Kurmancî-Hewramî- Zazakî	Latîni
2003	<i>Kurmancî-Dimilî(Seîd Veroj)</i>	Kurmancî-Dimilî	Latîni
2003	<i>Ferhenga Zimanê Kurdî-Tirkî/ Türkçe-Kürtçe/ Tirkî-Kurdî/ (Sinan Alptekin)</i>	Kurdî- Tirkî/ Türkçe-Kürtçe	Latîni

SALA ÇAPÊ	NAVÊ FERHENG	ZIMAN	ALFABE
2003	<i>Zazaca-Türkçe sözlük/ (Mehmet Aydar)</i>	Zazaca- Türkçe	Latîni
2004	<i>Kırmanckî-Dimilkî-Sobê (Hüseyîn Çakmak)</i>	Kırmanckî- Dimilkî- Sobê	Latîni
2004- 2006	<i>Ferhenga Hiqûqî (Nouri Talabany )(Nûri Talabanî)/Kurdî (Sorani)- 'Erebî-İngilizî-Fransî</i>	Kurdî (Sorani)-'Erebî-İngilizî-Fransî/	Latîni - 'Erebî
2005	<i>Ferhenga Qazî Kurdî- Erebî/ Erebî- Kurdî// 'Erebî- Latîni</i>	Kurdî- Erebî/ Erebî- Kurdî	'Erebî- Latîni
2005	<i>Dilawer Zeraq- Deyimler Sözlüğü-Ferhenga Biwêjan/ Tirkî- Kurdî/ Latîni</i>	Tirkî- Kurdî	Latîni
2005	<i>Gotinên Pêşiyên û Biwêjên Botan -Abdulkadir Bingöl/ Tirkî- Kurdî/ Latîni</i>	Tirkî- Kurdî	Latîni
2005	<i>Ferhengê Xal/ Kurdî- Kurdî(Şêx Mehmud Xal)</i>	Kurdî- Kurdî	'Erebî- Latîni
2005	<i>Çiya Mazî Ferhenga Gotinên Pêşiyên/ Kurdî- Kurdî</i>	Kurdî-Kurdî	Latîni
2005	<i>Ferhenga Biwêjan Kurdî- Kurdî (Mustafa Borak)</i>	Kurdî- Kurdî	Latîni
2005	<i>Ferhengê İdyomanê Kırmanckî (Zazakî)-Tirkî (Roşan Lezgîn)</i>	Kırmanckî (Zazakî)- Tirkî	Latîni
2006	<i>Ferhenga Kamêran- Kamêran Silêman Botî / Kurdî-Kurdî / Latîni</i>	Kurdî- Kurdî	Latîni
2006	<i>Ferhenga Destî (Umîd Demîrhan)/ Kurdî-Kurdî</i>	Kurdî- Kurdî	Latîni
2006	<i>Ferheng/ Kurdî-Tirkî (Mustafa Gazî)</i>	Kurdî- Tirkî	Latîni
2006	<i>Ferhenga Kurmancî/ Swenska- Kurdiska Lexsikona / (Mustafa Aydoğan, Vildan Tanrikulu, Mahmud Lewendî)</i>	Swêdi- Kurdî	Latîni
2006	<i>Ferhengê Zazakî-Tirkî (Musa Canpolat)</i>	Zazakî-Tirkî	Latîni
2008	<i>Ferhenga Erdnigariyê/ Kurdî-Tirkî-Fransî-Almanî-İngilizî(Abdurrahman Önen)</i>	Kurdî-Tirkî-Fransî- Almanî-İngilizî	Latîni
2009	<i>Ferhenga Kurdî –Kurdî (Celadet Bedîrxan)</i>	Kurdî- Kurdî	Latîni
2009	<i>Ferhenga Çapameniya Kurdî (Osman Aslanoğlu)</i>	Kurdî- Tirkî	Latîni

SALA ÇAPÊ	NAVÊ FERHENG	ZIMAN	ALFABE
2010	<i>Kirmanckî (Zazakî)- Kurmancî/Kurmancî- Kirmanckî (Zazakî) (Çeko Kocadağ)</i>	Kirmanckî (Zazakî)- Kurmancî/Kurmancî- Kirmanckî (Zazakî)	Latîni
2010	<i>Alî Ekîcî, Türkçe- Zazaca/Qesexaniya Tirkî- Kirmackî/ Dımilki-Zazaki</i>	Tirkî- Kirmackî/ Dımilki-Zazaki	Latîni
2010	<i>Ferhenga Aboriyê ya Tirkî- Îngilîzî-Kurdî (Huseyîn Denîz)</i>	Tirkî-Îngilîzî-Kurdî	Latîni
2010	<i>Ferhenga Kurdistani- Bedai'u- Luxet(Bedai'el- Luxet-('Elî Ekber Kurdistani)</i>	Kurdî-Kurdî	Latîni
2011	<i>Ferhenga Kurdî- Kurdî (M.Emin Bozarlan(A-D)</i>	Kurdî-Kurdî	Latîni
2011	<i>Wêneferhenga (Photodictionary) English- French-Kurdish(Ali Balkhkanlou</i>	English-French- Kurdish (Kurmanji)	Latîni- 'Erebî
2011	<i>Ferhenga Somerî- Kurdî/Kurdî-Somerî (Mamê 'Elî û Suleyman Yıldırım)</i>	Somerî-Kurdî	Latîni
2011	<i>Ferhenga Pirzimanî (Osman Aslanoğlu, Bedirhan İslamoğlu, Zeki Gürür, Hayrullah Acar û Evren Aslanoğlu)</i>	Tirkî- Kurdî (Kurmancî, Zazakî, Soranî)- Farisî- Îngilîzî	Latîni - 'Erebî
2011	<i>Ferhenge Kirmanckî- Tirkî/ Türkçe- Kirmancki Sözlük (Kamber Akbalık)</i>	Kirmanckî- Tirkî/ Türkçe- Kirmancki	Latîni
2012	<i>Ji bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî(Kurmancî)-Tirkî- (M.Malmîsanij)</i>	Kurdî- Tirkî	Latîni
2012	<i>Ferhenga Navên Riwekan / Latîni-Kurdî-Tirkî (Mehmet Fırat)</i>	Latîni- Kurdî- Tirkî	Latîni
2012	<i>Ferhenga Kurdî- Tirkî/ Türkçe -Kürtçe/ Tirkî- Kurdî/ (Mirkan Baran)</i>	Tirkî- Kurdî	Latîni
2012	<i>Zazaca- Türkçe Sözlük/ Türkçe- Zazaca Sözcük Listesi (R. Hayıg û B. Werner)</i>	Zazaca- Türkçe Sözlük/ Türkçe- Zazaca	Latîni
2012	<i>Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Farisî /Koma Kurdîya Kurmancî (Azad Makûyî, Haşim Mehmûdî yd.)</i>	Kurdî-Farisî	'Erebî- Latîni

SALA ÇAPÊ	NAVÊ FERHENG	ZIMAN	ALFABE
2013	<i>Kurdî (Zazakî)-Tirkî û Tirkî-Kurdî (Zazakî) (Roşan Lezgin)</i>	Tirkî- Kurdî (Zazakî)	Latînî
2013	<i>Ferhenga Kurdî Almanî/Kurdish-Deutsches Kurdî-Almanî (Yusuf Budak)</i>	Kurdî- Almanî	Latînî
2013	<i>Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî (Ahmet Kasımoğlu/Ehmedê Dirihî)</i>	Kurdî-Kurdî-Latînî-Tirkî, Tirkî-Latînî-Kurdî, Latînî-Kurdî-Tirkî	Latînî
2013	<i>Ferhenga Botan[Peyvên Wenda]- (Bahadîn Robar)</i>	Kurdî- Kurdî	Latînî
2014	<i>Ferhenga Bêwar, Bêwar Diyadinî(Mehmet Kemal IŞIK)</i>	Kurdî-Kurdî	Latînî
2014	<i>Ferhenga Hiqûqî (Hüseyin Özdemir) Tirkî- Kurdî</i>	Tirkî- Kurdî	Latînî
2014	<i>Ferhenga Kurdî- Tirkî/ Tirkî- Kurdî/ Fevzi Karademir, Nezir Gûmûş, Ziver İlhan û Ahmet Korkut / Saziya Zimanê Tirkî (TDK)</i>	Tirkî- Kurdî	Latînî
2014	<i>Abdullah Kiran Ferhenga Zanistên Cıvaki /Kurdî-Tirkî-İngîlîzî</i>	Kurdî-Tirkî-İngîlîzî	Latînî
2014	<i>Rojnameya Kurmancî /Kurdî-Tirkî-Fransizî-İngîlîzî</i>	Kurdî-Tirkî-Fransizî-İngîlîzî	Latînî
2014	<i>Ferhenga Kurdî-Tirkî /Tirkî-Kurdî (Mevlut Aykoç -Xunav Altun)</i>	Tirkî- Kurdî	Latînî
2014	<i>Farsça- Zazaca- Kurmancca Mukayeseli Gramer ve Temel Sözlük (Serkan Oğur )</i>	Farsça- Zazaca- Kurmancca	Latînî
2014	<i>Gotinên pêşiyên ên kurdan (Mele Üsivê Celalî)</i>	Kurdî- Kurdî	Latînî
2015	<i>101 Biwêj- Çirok( Mehemet Oncu)</i>	Kurdî- Kurdî	Latînî
2015	<i>Ferhenga Biwêjan/ Kurdî-Kurdî( Mehmet Öncü)</i>	Kurdî-Kurdî	Latînî
2015	<i>Ferhenga Kurdî- Kurdî (M.Emin Bozarlan(E-K))</i>	Kurdî-Kurdî	Latînî
2015	<i>Ferhenga Kurdî(Soranî-Kurmancî)-Tirkî -(Abdullah Ekici)</i>	Kurdî- Tirkî	Latînî
2015	<i>Ferhenga Standart(Fono yayınları)</i>	Kurdî-Tirkî	Latînî

<b>SALA ÇAPÊ</b>	<b>NAVÊ FERHENG</b>	<b>ZIMAN</b>	<b>ALFABE</b>
2015	<i>Ferhenga Termên Fenî Kurdî (Kurmancî)-Tirkî-Îngîlîzî/Fen Terimleri Sözlüğü, Türkçe- Kürtçe-İngilizce, Dictionary Scientific Terms (Bahattin Güngüm)</i>	Kurdî (Kurmancî)-Tirkî- Îngîlîzî	Latînî
2015	<i>Ferhenga Termên Matematikê (Dilawer Zeraq û Mem Wenda)</i>	Kurdî- Fransî- Îngîlîzî- Almanî- Tirkî	Latînî



## **KURTEBÊJE**

a: ad

b.s: bireser

b.z: beriya zayînê

bak: bakur

d: dîşîl

e: erîl

f: fiil

h.c: hokerê cih

h.d: hokerê demkî

hewra: hewramî

HK: Hevalkar

HN: Hevalnav

hwd. : her wekî din

j: jêder

jev: ji hev

ke: kerkûk

n.d: navdêr

n.k: navê kara

n: nav

N: Nav

RD: Rengdêr

Rêz: Rêzman

s.n: sernav

## DESTPÊK

Di jiyana xwe ya rojane de her xwendevan, xwendekar, herî kêm carek du car li ferhengan nêriye û peyvên ku me'neyên wan nizane ji ferhengan derxistiye an jî îstîfade kirine. Em, ne bi tenê ji bo peyvên ku me'neyên wan nizanin, ji bo fêrbûna kokê peyvan, nivîsîna peyvan, xwendina peyvan û cureyên peyvan jî li ferhengan dinêrin.

Piştî fêrbûna xwendin û nivîsînê pêşî prensîp û rêbazên bikaranîna ferhengan li ber me tê fêr kirin. Di nav agahiyên 'ewil de rêza peyvan ku bi awayekî kurt tê fêr kirin. Me îmtihanên, ku ji çend vebijarkan pêk tên de peyvên ku bi awayekî belavbûyî hatine dayîn û ji me daxwaziya rêzkirina wan tê kirin jî dîtine. Di derbarê ferhengan de agahiyên me bi giştî ji van pêk tê.

Lê belê gelek xusûsiyetên cuda yên ferhengan hene. Kesên ku van taybetiyan nezane nikare ji ferhengan îstifade bike. Ji ber vê ji bo ku meriv bikare ji ferhengan îstifade bike, divê ku pêşî agahî û îzahatên bikaranîna ferhengan baş bixwîne.

Ferheng bi rastî hişê ziman û mirovan e. Ji xuliqandina însanê yanê ji peyvan 'ewil heta niha çî peyvên ku hatine gotin û bi hezaran ferhengên ku di nav vê dema berfireh de hatine amade kirin digel peyvên zimanan di derbarê paşeroj û pêşeroja însanan de jî agahiyên girîng dide.

Belê di ferhengan de ji xeynê agahiyên peyvan tiştên din jî hene. Cureyên peyvan, nivîsîna peyvan, xwendina peyvan, cureyên bikaranîna peyvan, eger ku peyv biyanî be ji kîjan zimanê hatiye wergirtin, kişandina lêkeran û gelek agahiyên cuda yên di derbarê peyvan de jî di çarçoveya usûlek de têne dayîn. Va ev rêz û pergala ferhengan bi prensîbên amadekirina ferhengan ve têne ava kirin. Ev hemû rêbaz û qaîde, ji bo ku xwendevan ji ferhengan çêtir îstifade bikin û ferhengên bikêrhatîtir derkevîne holê ye.

### **Zanista Peyvan**

Di zimanekî de beşa *zanista peyvan* ku di bin banê zimannasiyê de ye û li ser şaxên ku rêjeya peyvan diyar dike, me'neyên peyvan, guherînen peyvan pêşketina wan vedikole.



Di hin çavkaniyan de jî tê dîtin ku bi *zanista peyvan* ve *zanista ferhengan* hatiye qest kirin û di hin çavkaniyan de jî xebatên li ser ferhengan raste rast bi navê *zanista ferhengan* (ferhengnasiyê) ve hatiye terîf kirin.

*Zanista peyvan* ku zanisteke raste rast li ser peyvan vekolînan pêk tîne bi bineşaxa xwe re yanê bi *zanista ferhengan* re tê tevlihev kirin. *Zanista peyvan* li ser kokê peyvan, saziya peyvan, me'ne û di warê şiklî de pêşketina wan vedikole û bineşaxên wê yên mîna *zanista ferhengan* û *zanista hevokan* jî hene.

Karê amadekirina ferhengan ne bi tenê *ferhengvanî* ye, lewra karê *zanista ferhengê* tespîtkirina hebûna peyvên zimanan e û divê ku *zanista ferhengê* bi têgeha *ferhengvaniyê* neyê sînordar kirin.

Nayê zanîn ku ferhenga ewil li ku derê û bi kîjan armancê hatiye nivîsîn. Lê belê ji ser nivîsên tabletên kilî ve meriv dikare bibêje ku tarîxa ferhengê digihîje Akadan û Medan (B.Z. 2600) ku bi hezaran sal berê niha bûne. Lewra tê zanîn ku Babîlî û Akadî, ji bo fêmkirina zimanê sumerî, peyvên hemwate di forma ferhengê de li ser tabletên kilî nivîsîne. Ev kitabe, di heman demê de nimûneya ewil ya ferhengên du zimanî ye. Heta salên 1990î wisa dihat texmîn kirin ku ev kitabe ferhengên ewil in. Lê belê piştê vekolînên salên 1990î hate îddia kirin ku însan di pêşiya fêrbûna zimankekî din de fêrbûna zimanê xwe û parastina zimanê xwe hewce dibîne. Ji ser vê fikrê ve hat îddia kirin ku ihtimal heye însan di pêşiya ferhengên du zimanî de ferhengên yek zimanî nivîsîbin. Ji ser vê feraziyeşê ve vekolîneran bawer kirin ku ferhengên weil ne ferhengên du zimanî ne, divê ku ew yek zimanî bin. Bi vê texmînê ve tarîxa ferhengan heta heyama Misra Antîk çû (Baskin, 2014: 446).

Bi hezaran cureyên ferhengên ku bi hezaran sal in hatine nivîsîn derketin holê. Ji ber vê vekolîna li ser ferhengan ji vekolîna cureyên din ên kitêban diwartir e. Lewra xusûsiyetên van kitêban ji kitêbên din cudatir e. Di van kitêban de digel hêmanên zimanî divê ku hêmanên derveyê zimanî jî baş bêne dîtin. Bi kurtahî meriv dikare ji bo vê bibêje dengeya 'erz û talebê. Ji bo vê dengeyê kesên ku bi ferhengan re eleqe dikin, divê ku ji gelek merhaleyan bi serkeftî derbaz bin. Ev merhale: diyarkirina xusûsiyetên giştî yên peyvan, pêkanîna planên amadekirî û gihîştandina hilberînên rast ji bo xerîdaran. Ji ber ku di vî karî de merhale zêde ne, divê ku vekolînên demdirêj û sistematîktir bêne kirin. Ji

ber vê amadekirina ferhengê li gorî karên din diwartir û bi mesreftir e. Lê belê di demên dawî de derfetên pêşketî yê teknolojîyê di derbarê teoriyên ferhengan de û di derbarê metodên ferhengî de guherînên mezin derxistine holê. Ji bo ku ev cure guherînên mezin bêne kontrol kirin sazî, di fe'liyetên ferhengî de pêşengî kirin. Saziyên mîna "European Association for Lexicography (Euralex)", "Dictionary Society of North America (DSNA)", "African Association for Lexicography" (Afrilex), "Asian Association for Lexicography (Asialex)", "Australasian Association for Lexicography (Australlex)" li çar aliyên cîhanê ji bo pêşketina zanista ferhengê hewl dan. Digel van rêxistinên herêmî yê mîna "Southeast Asian Lexicography (SeaLex)", "Spanish Association for Lexicography" jî fa'aliyetên ferhengî dikin (Baskın, 2014: 446).

Li Tirkîyeyê jî navê ferhengê û Saziya Zimanê Tirkî êdî bûne wekî cewiyê. Ev sazî ji bo ku di mijara ferhengnivîsiyê de xwedî tecrubeyên mezin e û di mijara xebatên li ser ferhengan de di warê madî û ilmî de piştgiriyên mezin kiriye navê wê bi peyva ferhengê tîne bîra meriv. Bi taybetî piştê sala 1990î xebatên vê saziyê li ser fergengan geştir bûye. Di nav van xebatan de "Ferhenga Zimanê Tirkî" xebateke hêja ye. Saziya Zimanê Tirkî her ku çû naveroka vê ferhengê geştir kir û cardin çap kir. Digel van ji ser înternetê ve bi ferhengên anlajn ve sazî xwe gihande pêşketinên rojane. Li cem van dema ku meriv li xebatên derbarê dîroka ferhengên zimanê tirkî û ferhengên zimanên din ên ku ji malbata tirkî ne dinêre meriv dibîne ku Saziya Zimanê Tirkî xebatên giranbaha pêk anîye. Lê belê ji ber ku di vê saziyê de ji xeynê ferhengnivîsiyê karên din jî tîne kirin û ji ber ku hijmara xebatkarên wê jî kêm e di qedandina gelek karên saziyê de giraniyek derketiye holê. Ji ber vê divê ku saziyeke serbixwe bê saz kirin û ew sazî jî pêketinên zanista ferhengê ya cîhanê ji nêzîk ve teqîb bike. Ji ber ku saziyeke wiha tune li Tirkîyeyê xebatên ferhengî di asta amatorî de û bi awayekî şexsî tê kirin. Ji ber vê di piyaseyê de gelek ferhengên ku ji armanca xwe dûr in û bikêrnayên hene. Lê belê kesên mîna Ali Püsküllüoğlu, Mustafa Nihat Özön, Mehmet D. Doğan, Ahmet Doğan, Kemal Demiray, M. Ali Ağakay, Mehmet Kanar ku dil dane karê ferhengnivîsiyê û di mijara ferhengan de derketin pêş jî hene. (Dursunoğlu, 2011: 270). Ji xeynê amadekirina ferhengên şexsî û saziyan, bi taybetî di mijara vekolînên li ser ferhengan de û di pêşketina zanista ferhengan de rola zanîngehan pir girîng e. Mesela di pêşiya sala 2014an de bi pêşengiya zanîngehên Tirkîyeyê du sempozyumên navneteweyî hatine li dar xistin. Di sala 2014an da dîsa bi hevkarîya Şaredariya Hendekê û Zanîngeha Sakaryayê ve "Sempozyuma Navneteweyî

ya Ferhengnasiyê: Di Sed sala 21. De Ferhengnasî” hatiye lidarxistin. Her wiha tê dîtîn ku di vî warî de pêşketinên girîng hene. Lê belê digel xebatên zanîngehan û Saziya Zimanê Tirkî em dibînin ku li Tirkiyeyê xebatên ferhengnasiyê li ber xebatên welatên din paş maye. Mesela em dizanin ku li welatên din kovar û weşanên ku li ser ferhengnasiyê va demeke dirêj e weşanê dikin lê li Tirkiyeyê bi tenê kovareke neteweyî bi navê “Sözlük Dergîsî/Kovara Ferhengê” heye. Digel vê hin weşanên ku hijmarên taybet li ser ferhengnasiyê çap kirine jî hene. Lewra li Tirkiyeyê di zanîngehan de hê makezanista Ferhengnasiyê jî nehatiye damezirandin. Ev hemû sedem xebatên ferhengnasiyê li gorî cîhana îroyin paştir dixê (Baskın, 2014: 446- 447).

Ferhengnasî di nîvê sed sala dawî de pêşketinên mezin pêk aniye. Di vê pêşketinê de du sedemên bingehîn hene. Sedema ewil bi awayekî balkêş pêşketina kompîtîrê ye. Di kompîtîrê de agahî bi hêsanî têne qeyd kirin û bi taybetiyên cuda ve di kompîtîrê de têne tesnîf kirin, ev taybetiya kompîtîrê piştgiriyeke mezin daye xebatên ferhengnasiyê. Sedema duyem jî ew e ku xebatên li ser metaleksikografîyê zêde bûne û qada ferhengnasiyê bûye qadeke zanista akademîk. Ev pêşketinên civakî û teknolojîk ji bo xebatên ferhengnasiyê qadeke nû vekiriye. Mesela di salên 1990î de karê amadekirina ferhengan ji ser civandina fişan ve yek bi yek dihat kirin, lê belê îro di qada sanalê de bi awayekî lezgîn gelek ferheng têne amadekirin.

## BEŞA YEKEM

### XEBATEK LI SER FERHENGÊN KURDÎ

#### 1.1. FERHENGNASÎ (LEKSİCOGRAPHY- SÖZLÜKÇÜLÜK)

Têgeha *ferhengnasiyê* di ferhenga Tirkî de wiha tê terîf kirin, karê nivîsîn û amadekirina ferhengê, nivîskariya ferhengan. *Zanista fergengê* jî bi heman awayî tê terîf kirin (TDK, 2009).

Ferhengnasî di ferhengên Kurdî de wiha tê terîf kirin; Bêjeyên zimanekî, digel hemwateyên bêjeyan ya xwe an jî zimanekî din bi awayekî nişe kirin. Lê dewlemendiya zimanekî tenê peyvan û wateyên wan ên cuda nayê hesibandin. Ferheng bîra gelen e, ji dîroka bîr û bawerî û kesayetiya gelan in. Çimkî di her gotinan de rewşa gelan xweya dike.

Ferhenga Meydan Larousse jî peyva lexsîkografîyê di cihê ferhengnasiyê de bikaraniye. Di çavkaniyên Tirkî û Kurdî de mefhûmên zanista ferhengan, ferhengnasî, ferhengsazî jî hatine bikaranîn.

Ji bo ku aloziya têgehan dernekeve holê li gor kolandina me em ji bo *ferhengnasiyê*, bikaranîna lexsîkografîyê çêtir dibînin. Ji ber ku di li berhemên Tirkî, Îngîlîzî û Kurdî de kesên ku m'eneya peyvan dinivîsin yanê ferheng dinivîsin bi navê leksîkolog têne terîf kirin û di zimanê Kurdî û Tirkî de ji bo leksîkologê ferhengvan jî tê gotin em têgeha *ferhengnasiyê* di cih de dibînin.

Li gor vekolînerên ku dibêjin pênaseyên ku di derbarê ferhengnasiyê de hatine kirin exleb li ser aliyê wî yê bizavî disekin. Ferheng nivîsîn, parçeyekî ferhengnasiyê ye lê şertekî ku dev jê neyê berdan jî nîne. Lewra di ferhengnasiyê de ya girîng bi rêya serîlêdana çavkaniya zimanê çalakî kirin e.

Her çiqas kesên ku ferhengnasiyê hê jî wek şaxekî zanistî qebûl nakin hebin jî ferhengnasi bi aliyê xwe yê zanistî yan jî ne zanistî pratîk û çalakiyekî ye. Ferheng jî fêkiyê vê çalakiyê ne. Ji aliyê ku me eleqedar dike ve ferhengnasiya zanistî, çalakiyekî serbixwe ye, ji aliyê jiyana civakî û dewletê ve girîng e. Wisa tê qebûl kirin ku, kesên ku di vê qadê de dixebitin jî perwerdehiya akademîk standine (Yüksekkaya, 2001: 208, ji Wiegand 1988 neql.).(Usta, 2010: 93- 94).

Ferhengnasî, ji aliyê hinek vekolîneran ve jî wek parçeyekî leksikolojiyê (wek şaxekî zanistî) ku di zimanê de hebûna peyvan terîf dike tê dîtin. Lê dema ku erka peyvan bidine ber çav, wek xizmetekî ku têkiliya di navbera zimannasî û civakê de ye xuya dike.

Zimannasê Alman Herbert Erns Wiegand, di sala 1983an de di kongreya ferhengnasiya navnetewî ya ku li Îngilterê hatibû li darxistin de van iddayan kiriye.

- Ferhengnasî (leksikografi) tu wext şaxekî zanistê nebû û dê nebê jî.
- Ferhengnasî, wek ku tê gotin, beşekî zimannasiya tetbîqî nîne.
- Ferhengnasî (leksikografi) şaxekî leksikolojiyê nîn e.

Wiegand li gel vê yekê cihê ferhengnasiya nûjen qebûl dike û wî wek meta-leksikografi bi nav dike. Qada xebata ferhengnasiya giştî jî di sê xalan de berev dike. Yek Plansaziya ferhengê, yek jî amadekirina bazaya ferhengê ya dawî jî nivîsîna metna ferhengê ye. (Tabanakova, 1999: 3 ji Wiegand 1983 naql)

Li ber ronahiya van hemû agahiyên ferhengnasî, ew dîsîplîna zimannasiyê ye ku her peyv di nav koma xwe de tê nirxandin û teorî û pratîka ferheng hilberandinê ye.

Ferhengnasiya ku teorî û pratîka ferheng afirandinê ye ji aliyê din ve *şaxekî zimannasiyê ye ku eleqedarên agahiyên zimannasiyê herî zêde mêldarê wî ne.* (Usta, 2010: 92- 101)

### **1.1.1. Teoriya Ferhengnasiyê**

Dema ku kitêb û gotarên di lîteratûrê de hatin vekolîn kirin dixuyê ku peyva *teorî* ku di sernavê de cih digre di naveroka kitêbê de wek dîroka ferhengnasiyê tê dîtin. Li gel dayîna tarîxçeyê ji aliyê din ve jî kêmasî û nûjeniya ferhengan tê vegotin. Di dawiyê de jî armanc û pirsgerêkên ferhengnasiyê tê nîqaş kirin.

Teoriya ferhengnasiyê, ê metnên ferhengî ji aliyê dîroka çandî ya wî welatê ve vekolîn dike, veraseta di navberan peyvan de û bandora wan ya li ser hev diyar dike, deyn girtinê û agahdarkirina ferhengî tespît dike. Bi qasê kavneşopiya netewî ya navnetewî jî ji bo ferhengnasiyê gelek girîng e.

Bi heman awayê tîpolojiya ferhengê jî ji bo ferhengnsiyê gelek girîng e. Têkildariya ferhengên cuda yan jî li hember hev sekinandina wan bi awayekî giştî tîpolojiya ferhengan nîşan dide.

Mijarên ku dikevin nav teoriya ferhengnasyê di teza doktorayê ya V.V.Morkovkin de wiha tê rêz kirin:

- Firehî, naverok û sazûmaniyên têgehê ferhengnasyê
- Vekolînkirina element û parametreyan
- Vekolînkirina cureyên ferhengan
- Derfet û esasên projeyên ferhengê û dijîtalîzekirina wan
- Vekolînkirina materyalên ferhengê ya umumî
- Xebatên palankirina ferheng nivîsîn û bi rêk û pêk kirina wî
- Xebatên qaîdeyên ferhengnasyê û kêsimandina wan (Martinyuk, 2004:181).

Li gor agahiyên ku P.N Denisov dide di ferhengnasyê de hêmanên esasî ya rêbaza terîfkirinê hene. Ev hêman wek , "aîdbûna bikarhêner û şexsîbûn, standartî, ekonomîkbûn, sadebûn, tambûn, çalabûn, guncawbûna terîfan ya li merhaleyên semantîkê" tê rêz kirin.

Teoriya ferhengnasyê bi esasî di binê du serenavan de nirxandin:

Ferhengnasya Pratîk; Ji aliyê hînkirina ziman, pênaseya ziman, standart kirin, têkiliya di navbera ziman de û vekolîna ziman ya ji alê zimannasyê ve fonksiyonekî civakî pêk tîne. Ferhengnasî, hewl dide ku ji bo bikarhêneran usulên herî baş yê di derbarê agahiyên ziman de berhev bike (Usta, 2010: 95- 96).

Ferhengnasya Teorîk; ji bo amadekirina binyada ferhengê ya makro (berhevkirina peyvê, hecma bêjeyan û wesfê wan, rêbazên bicihkirina materyalan di ferhengê de) û binyada ferhengê ya mikro(şiklê serê maddeyê, cureyê pênaseya ferhengan, rêjeya cureyên agahiyên ya di derbarê ferhengan de, cureyê mînakên gramerê û hwd.) damezrandina tîpolojiya ferhengê û pirsgirêkên girêdayî tarîxa ferhengnasyê jî di hundirîne (Usta, 2010: 95- 96).

V.V Morkovkin ji bo têgeha ferhengnasyê van agahiyên temamker dide:

- Ferhengnasiya Teorîk (diyarkirina binyad, naverok û rehenda têgeha ferhengnasiyê; leksikolojiya ferhengê, cureyê ferhengan û perwerdeya cureyan, doktrînên xal û parametreyên ferhengê, doktrînên esasî yên di derbarê damezrandina ferhengan de; plankirin û organîzekirina amadehiya ferhengê )
- Dîroknasiya Ferhengnasiyê (dîroka ferhengan; tarîxa çareserkirina pirsgerêkên ferhengnasiyê)
- Ferhengnasiya Pratîk (amadekirina ferheng û cureyên ku di şiklê ferhengê de hatine amade kirin; berhevkirin û arşîvkirina keresteyên ferhengê) (Usta, 2010: 95- 96).

### 1.1.2. Dîroka Ferhengnasiyê:

Pergala nû ya ku piştê şerê cîhanê yê duyem de derket holê girîngiya di warê ragihandin û agahdarbûnê de derxist pêş, ev yek bû sedem ku hinek dîsîplîn û karên nû derkevin holê. Yek ji van şaxan jî ferhengnasî ye. Heta îro bi awayê zanistî yan jî ne zanistî li ser teorî, rêbaz û teknîkên wî vekolînên pîralî hatine kirin. Heta karê ferheng nivîsînê dewam bike, weşankariya di vê warê de jî dewam dike. Lê îro hê jî nîqaşa li ser mijara ku ferhengnasî şaxekî zanistî ye yan na ji berdewam e.

Esas, xebat û tecrubeyên ferheng nivîsîna pratîk ku heta sedsala XX. hatibû bi dest xistin, di nîveka vê sedsalê de hate sêwirandin û berfireh kirin. Ev berfirehbûn jî teoriya ferhengnasiyê derxist holê. Di damezrandina teoriya ferhengnasiyê de pêşani aîdê ekola Rûsî ye. Xebata L.V. Şçerba ya bi navê *Ceribandinek Li Ser Teoriya Ferhengnasiya Giştî* ku nehatiye temam kirin mînakê vê ye. Cara ewil e ku Şçerba di vê xebata xwe de wek şaxekî zanistî ya taybet nêzê ferhengnasiyê dibe ( Usta, 2010: 94-95).

Têkiliya dîroka nivîsandin û çapkirina ferhengên kurdî bi dîroka fêrbûna zimanê kurdî re heye; her wisa têkiliya wê bi tarîxa komkirin û çapkirina nimûneyên folklorî û lîteratûra wan re jî heye. Li ser komkirina bêjeyan nimûneya herî pêşî an jî dîroka ferhengnasiyan Kurdan xebata herî 'ewil Ewliya Çelebî (1611-1682) wextê ku di sala 1655an li herêmen ku Kurd dijîn derketiye gerê lîsteya bêjeyên Kurdî çêkiriye tê zanîn. Peyra Ehmedê Xanî (1651-1707) di sala 1683an de bi navê *Nûbehara Biçûkan* ferhengek amade kiriye. Li ser ferhengan di lîteratûra Ewropeyê de xebata ewil a derheqê zimanê Kurdî gramatîka û ferhengoka Garzonî tê zanîn. Zimannasê bi 'esle xwe polonî

M. Auguste Jaba (1801-1894) ferhengek bi Kurdî-Fransî amade kiriye. Di sala 1879an de li bajarê Petersburgê Alman Ferdînannd Justî li ser vê ferhengê xebitî û çapkirî. Der barê ferhengan de xebata herî mezin bi deste nivîskar û zanayên Kurd li Iraq-Îran û li yekitiya sovyetê hatiye kirin. Li herêma Iraqê Gîwî Mukriyanî (1920-1986) ferhengê gelek giranbaha û bi qîmet amade kiriye. Pişt re li herêma Rusyayê bi taybetî Qanatê Kurdo, Farîzov, Bakoev, Maksimê Xemo, P. Lêrx, M. U. Khamoian û hwd. Ev xebatên ku hatine kirin ji bo dîroka ferhengnasiya Kurdan re bûne binyad.

Her çiqas neyê zanîn ku mirov kengê fêrê axivîne bûne û dest bi axivîne kirine, dîsa nayê zanîn ku kengê mecbur mane zimanekî biyanî fêr bibin. Her wiha li ser rûyê cîhanê ferhenga ewil ji aliye kî ve di kîjan sedsalê de hatiye amadekirin û kîjan zimanê jixwe re kiriye mijar jî nayê zanîn. Di çavkaniyan de Ferhenga ewil ya ku dişibe ferhengên îro, ji aliye rêveberê mûzeyê Îskenderiyê Aristophanesê Bîzansî ve teqrîben B.Z di sedsala II. de hatiye amadekirin tê nîşandan. Ev ferheng, hinek peyvên ku di Yunanî de kêmtên emilandin û ravekirina wan dijwar e aniye cem hev. Her wiha di vê ferhengê de pênasê jî cîh digirin (Gelişim Hachett).

Piştê wextan di çavkaniyên curbicur de di navbera mînakên ewil de tê diyarkirin ku ferhengên Yunanî û Latînî hatine amadekirin. P.Z di sedsala I. de Pamphilyusê Îskenderî ferhengê Yunanî ku ji 95 kitêban pêk tê û berhema Latînî ya Marcus Verrius ya bi navê Flaccus, wek mînakên ewil in (Encyclopedia Americana, 1968).

Peyva “dictionnarium” ku di Latînî de tê wateya ferhengê, pîskoposê Kostanzê Salomon di sedala IX. de di wateya ansîklopediyê de bi kar aniye. (Dictionnarium, universale)

Piştê vê wextê çî li rojava, çî li rojhilat ferheng an jî ansîklopediyên girîng hatine amadekirin. Li dinyayê cara ewil têgeha ferhengê di sala 1225an de ji aliye John Garland ve hatiye emilandin tê zanîn. Heta serdema îro çend heb ferhengên girîng yê etîmolojiyê hatiye amadekirin. Li rojhilatê dîrokekî qedîm yê ferhengnasiyê heye. Li rojava jî pêşketinên ferhengnasiyê piştê serdeman û piştê rojhilatê pêk hatiye (Doğan. A, 1990: 72).

Di nav ferhengnasên rojhilatê de ferhengên ‘Erebîyên Ebu Nasr Îsmâil Cevherî yê Farabî, *Tac-ül-lügatû Sihah-ül-Arabiye* wek berhemên girîng tên qebûl kirin. Hewceye



ku behsa zimannasê ‘Erebî ku bi eslê xwe Îranî ye û di sed sala 14. û 15. de jiyaye Ebu Tahir Muhammed bin Yakup Firuzabadi’(1329-1414) bikin. Ferhengawî ya ‘Erebî *El Kamus-ül-Muhit* ji 60 cildan pêk tê. Dîsa li vir hêjayê behsê ye ku ev berhema mezin, ji aliye ferhengnasê mezin Mûtercim Asım ve di sed sala 18. de bi ser Tirkî ve hatiye wergerandin (Gelişim Hachett).

Li rojava xebata ewil tê zanîn ku bi fermana Çarîçeya Rûs Katerina ya II. bi seyyahê Alman P.S.Pallas hatiye kirin. Ev xebat di eslê xwe de li ser naskirina zimanên cîhanê û muqayesekirina wan e. Pallas, rêbaz û qaîdeyê zimanên di hidûdê Rûsyayê de diyar kiriye û bi îstîfadekirina wan 258 têgehwek esas hildaye, beranberiya van têgehan jî di 200 zimanên Ewropî û Esiyayî de diyar kiriye. Bi vê awayê cara ewil mînaka ferhengên pirziman nişan daye. Ferhenga Pallas ku di sala 1787an de bi navê *Linguarum Totius Orbis, Vocabularia Comparativa* hatiye weşandin, di çapa wî ya Petersburgê ya 1790-91an de amûrê hinek zimanên Afrîkayî û Amerîkayî lê hatiye zêde kirin (Doğan, 1990: 72).

Li gel vê yekê, xebata ku J.C. Adelung û J.S. Vater bihev re bi navê *Mithridotes* dikin û beje û du’ayen Latînî tinine cem hev ji çar cildan pêk tê. Ev xebat di xala qebûlkirina xebatekî ferhengî de biguman e. Ev berhema ku di navbera salên 1860 û 1817an de hatiye nivîsîn, bi 500 zimanan re têkildar e (Bloomfield, 1993: 7).

Pêşketina herî girîng ya ferhengnasîyê di sed sala 19an de pêk hatiye. Li Almanyayê wek avakarên vê zanistê Jacob Grimm û birayê wî Wilhelm Grimm di sala 1985an de li Leipzigê dest bi xebatekî 16 cildî dikin, her çendî ku çend beşên vê xebata bi navê *Deutsches Wörterbuch* nehatibe weşandin jî ev xebat bi alîkariya gelek zanyaran encax di sala 1961an de hatiye temam kirin. Ev xebat bikaranîna peyvekî di çavkaniyên herî kevn de tespît dike, her wiha di ziman û zaravayên cuda de jî ‘emilandina peyvan di de berhev û bikaranîna peyvan di nava hevokan de û ji her aliyê ve aşkera dike. Bi vê awayê ev xebat ji xebatên pişt xwe re bûye mînak û ji amadekirina ferhengên bi vê şiklê re rêve kiriye.

Ferhenga, zimannas, rewşenbîr, feylesof û fîzîknas Emile Littré’ ya binavê *Dictionnaire de la Langue Française* ku encama xebata sî salan e berhemekî lêkolînî ya gelek berfireh û kûr e. Ev berhema ku îro jî bi awayekî piştrast/ ewleh/ emîn jê tê îstifade

kirin di sala 1873an de li Parîsê hatiye çap kirin. Çapa vê ferhengê ya 1989an ji puntoyên gelek piçûk û çar cildan pêk tê, her wiha di vê ferhengê de wateya peyvên cuda û di derbarê cihên ku tê de derbas dibin de bi awayê hûr gilî agahî tê dayîn, paşê jî wek paragrefekî cuda dîroka ferhengê û rihê wî tê diyar kirin.

Xeyn ji van ferhengan Îngilîzan ya meşhur bi navê *The Oxford English Dictionary* ku bişilkê ferhenga Grimm û Littré' hatiye amadekirin jî i sala 1933an de wek 13 cild hatiye weşandin (Bingöl, Zekeriya, 2006: 198-202).

### **1.1.3. Qadên Têkildarê Ferhengnasiyê**

Ferhengnasî, di navbera leksikolojî û bikarhênerê ferhengê de erka qasidê/navbeynkarî pêk tîne û di navbera qadan de wek gihanek e. Yekem, eger ku binyada ferhengê peyv, ravek, û awayên peyvên be nexwe bi leksikolojiyê re têkiliyekî wî yê esasî heye. Duyem, dema ku leksikolojî li ser peyvên dixebite ji ber ku ji şaxa zimannasiyê sûd werdigre ferhengnasî jî ji teorî, rêbaz û teknîkê qadên gramerê yê binyadî (fonetîk, morfolojî, rêzkirina peyvên) û ji yê alîkar wek semantîkê sûd werdigre. Wek xala sêyem, mijarên wek bikarhêner û cihê emilandinê ku bê nirxandin aliyê ferhengê ya pratîk jî dikeve nav qada ferhengnasiyê. Navê çend qadên ku di ferhengnasiyê de carna rêbaz û carna jî çavkaniyan diemilînin wiha ye: Etîmolojî, fonolojî, gramera berawirdî, onomastîk, edebiyat, dîroknasiya edebiyatê, bibliyografi.

Ferhengnasî, ji ber ku qadekî înterdîsîplîner e bi zanistên têkildarê ziman re di nav danûstandinekî rasterast de ye: Leksikolojî, semasiolojî, gramer, stîlistîk, sosyolînguîstîk, psikolînguîstîk, teoriyên ragihandin û wergera mekanîk, rêbazên fêrkirina ziman ( Usta, 2010: 94-95).

### **1.1.4. Termînolojiya Ferhengnasiyê**

Di warê ferhengnasiyê de termînolojiyekî ji terminolojiya gramerê cudatir heye. Ji van têgehên çend heb ev in: tipoloji, klasifikasyon, parametre, madde, pênasê, daxuyanî, mînak, kurt kirin, berawird kirin, çavkanî, armanc, rehend, bîwar(boyit) hwd.

Di ferhengnasiya her zimanê de zimanekî taybet ya ferhengê tê çêkirin. Formulên ku pê xalên ferhengê tene nivîsîn vê zimanê taybet çê dike. Li gel formulên rave, nîşe, kurt kirin û îşaret jî di vê zimanê taybet de cih digre ( Usta, 2010: 97).

### 1.1.5. Bi Zanistên din re Têkiliya Ferhengnasyê

Qada bingehîn a xebata ferhengnasyê ferheng in. Ferheng jî bi terîfa giştî ew cure berhem in ku peyv di nav wan de li gorî hin rêzikan têne tesnîf kirin. Ji ber vê xebatkarên ferhengnasyê, di derbarê bêjeyan de rêzimanê, fonolojî, watesazî û telefuzê bikartînin. Ji ser van daneyan ve di derbarê peyvvan de berhemên bingehîn yanê ferhengan ava dikin. Her wiha ferhengnasî, bi morfolojî, sentaks, watesazî û fonolojiyê re ji nêzîk ve têkildar e. (Magay, 2000: 443). Digel van hêmanên derveyî zimên jî bi ferhengnasyê re têkildar e. Her wekî teknolojiyên ragihandinê, bazarî û hwd.

Ferhengnasî di nivê sed sala dawî de pêşketinên mezin pêk aniye. Di vê pêşketinê de du sedemên bingehîn hene. Sedema ewil bi awayekî balkêş pêşketina kompîtirê ye. Di kompîtirê de agahî bi hêsanî têne qeyd kirin û bi taybetiyên cuda ve di kompîtirê de têne tesnîf kirin, ev taybetiya kompîtirê piştgiriyeke mezin daye xebatên ferhengnasyê. Sedema duyem jî ew e ku xebatên li ser metaleksikografiyê zêde bûne û qada ferhengnasyê bûye qadeke zanista akademîk. Ev pêşketinên civakî û teknolojik ji bo xebatên ferhengnasyê qadeke nû vekirîye. Mesela di salên 1990î de karê amadekirina ferhengan ji ser civandina fişan ve yek bi yek dihat kirin, lê belê îro di qada sanalê de bi awayekî lezgîn gelek ferheng têne amadekirin. Mesela Ferhenga Berhevkerinên Saziya Zimanê Tirkî di encama du berhevkerinên mezin de hatibû nivîsîn. Ji van berhevkerinan a ewil di salên 1932-1934an de a duyem jî di salên 1952-1959an de hatine kirin. Di encama van de bi hezaran (153.500 û 450.000) fişên berhevkerinan derketine holê. Di nivîsîn sererastkirin û civandina van de gelek berhevkar wezîfe girtine. (Aydın, 2007: 131). Rewşeke wiha li Norwecê jî hatiye dîtin. Li wê derê di sala 1991an de dema ku Nordic Association for Lexicography (Komeleya Zanista Ferhengê ya Îskandinavê) hate saz kirin daxuyaniyek da ku armanca wan pêşxistina rêza termên ferhengî ye. Ji bo vê jî bi navgîniya komeleyê komeke hevpar a xebatê hat saz kirin. Ev kom Nordisk Leksikografisk Ordbokê (Ferhenga Zanista Ferhengê) di encama xebata 6 salan de çêkir ku digel termên Îngilîzî, Almanî û Fransîzî termên zimanên Îskandinavî jî di nav wê de hene. (Svensen, 2009: 4-5). Lê belê bi alîkariya teknolojiyên agahî, zanistên civakî û zanistên perwerdeyê ve xebatên nivîsîna ferhengan û şiklê wan di salên 2000î de guherîne. Mesela digel ferhengên kitêbî ferhengên di formata CD-ROMê de jî hatibûn amadekirin. Di salên 2000î de jî ji bo ku înternet zêdetir ket rewacê ferhengên onlîne derketin pêş. Di demên dawî de bi zêdebûna cureyên kompîtir û telefonên pêşketî ve

bernameyên ferhengê zêdetir têne bikaranîn. Bernameyên ferhengê ku di CD-ROMê de be yan jî di tablet û telefonan de be ferq nake ji ferhengnivîsiya kitêbî hêsantir, pratîktir û ekonomîktir e. Lewra dema meriv mîna kitêban ferheng binivîse yek bi yek amadekirina fişan û di metbe'eyê de çapkirina van lazim e. Di cihê van de meriv dikare ji komkirin tesnîf û qeyda kompîtiran îstifade bike. Ji ber van di navbera ferhengnasiyê û teknolojiyê de têkiliyeke xurt heye. Bi pêşketina teknolojiyê ve ferhengnasî di demên kurt de pêşketinên çêtir bi dest dixe.

Ferhengnasî qada xebatê ye. Ji ber vê jî bi peyvsaziyê re ji nêzîk ve têkildar e. Heta nêzîkiya herdu zanistan di navbera zanyaran de bûye sedema tevlihevî û fikrên nakok. Mesela Crystal, di berhema xwe ya *A Dictionary of Linguistics and Phonetics*ê de ku madeya ferhengnasiyê terîf dike, dibêje li madeya peyvsaziyê jî binêrin. Her wiha herdu qadan dike qadek. Madeya peyvsaziyê jî bi vî awayî terîf dike: “peyvsazî, di zimanekî de di derbarê peyvan de hemû xebatan di hundirîne û ev term di watesaziyê de tê bikaranîn. Ev kar ji huner û xebatên nivîsîna ferhengan cuda ye. Li gorî vê ferhengnasî bineşaxeke peyvsaziyê e”. Di vê terîfê de ferhengnasî wekî bineşaxeke peyvsaziyê hatiye diyar kirin. Akalîn jî terîfeke mîna vê kiriye. Li gorî wî ferhengnasî, bineşaxeke pratîk a peyvsaziyê ye ku bi hunera amadekirina ferhengan re eleqedar dibe. (Akalîn, 2010: 164). Kesên ku beşdarê vê fikrê nabin yan jî herdu zanistan wekî hev dibînin yan jî peyvsazî wekî metaleksikografiyê dibînin jî hene. Lê belê peyvsazî ne bi ferhengnasiyê re ne jî bi metaleksikografiyê re heman tişt e. Ev zanist ferhengnasiyê jî nagire hundirê xwe. Lê belê şaxezanistekê wisa ye ku ferhengnasî jê gelek îstifade dike. (Svensen, 2009: 3). Lewra ferhengnasî bingeh û pêşveçûna tarîxî ya hêmanên ferhengî (lexical items) û xebatên teorîk ên li ser peyvan pêk tîne (Burkhanov, 1998: 139). Pêşveçûna peyvan û têkiliya navbera wan (hevwaterî, dijwaterî) mijara peyvsaziyê ye. Ferhengnasî jî di merhaleya amadekirina ferhengan de ji vê cure daneyên peyvsaziyê îstifade dike. Bi kurtahî em dikarin bibêjin ku peyvsaziyê raste rast bi peyvan re eleqedar e û li ser wan dixebite lê belê ferhengnasî li ser bijartin, rêzkirin û terîfa wan dixebite. Ev têkiliya nêzîk gelek car bûye sedem ku zanyar her du şaxezanistan tevlihev bikin û yekî wekî binezanista ya din bibînin.

Xelet têgihîştina têkiliya navbera peyvsaziyê û ferhengnasiyê di mijara têkiliya zimannasî û ferhengnasiyê de jî tê dîtin. Di derbarê vê mijarê de jî fikrên cuda hene. Hin

kes ferhengnasiyê wekî şaxeke pratîk a zimannasiyê dibînin û hin kes jî vê fikrê red dikin. Mesela Aydın diyar dike ku hem ferhengnasî hem jî ferhengvanî(zanista peyvan) du beşên zimannasiya pratîk e. (Aydın, 2007: 129). Korkmaz û Aksan jî xwediyê heman fikrê ne. Ew jî ferhengnasiyê di nav qada zimannasiyê de wekî qadeke xebatê dibînin. Li gorî wan ferhengnasî şaxeke zimannasiyê ye ku rê û rêzîkên nivîsîna ferhengê li ser hebûna zimanekî yan jî çend zimanan nîşan dide (Korkmaz, 2007: 199; Aksan, 2007: 69). Armanca bingeşîn a ferhengnasiyê eşkerekirin û diyarkirina yekeyên zimanî ye. Dema ku meriv ji vê aliyê ve lê binêre dikare ferhengnasiyê wekî şaxeke zimannasiyê bibîne. Lê belê ev şîrove tê wê meneyê ku meriv qada ferhengnasiyê bi tenê bi daneyên zimanî ve sînordar dike. Lê belê divê ku neyê jibîrkin ev şaxezanist hêmanên derveyî zimanê jî dihundurîne. Ji ber vê meriv nikare vê şaxezanistê bi tevahî di nav sînorên zimannasiyê de bifikire.

Di nav zanistên ku bi ferhengnasiyê re di tîkiliyê de nêzîk de zanista watesaziyê jî heye. Watesazî zimanî di warê m'enyê de vodikole. Bêjeyan û hevokan di warê m'enyê de vedikole. Armanca bingeşîn a ferhengnasiyê jî ew e ku peyvan bi xwendevanan bide fêhm kirin. Ji bo vê jî ji daneyên watesaziyê îstifade dike. Xusûsen di t'erîfên destpêka madeyan de rola watesaziyê pir zêde ye. Digel van ferhengên dijwate û hemwate û ferhengên terman jî ancax bi alîkariya watesaziyê mumkun dibe. Ji ber vê di navbera ferhengnasî û watesaziyê de tîkiliyê xurt heye (Baskın, 2014: 451).

Ferhengnasî ji daneyên fonolojiyê jî îstifade dike. Lewra fonolojî di zimanekî de li ser avahiya teknîkî ya dengen yanî li ser foneman disekine. Taybetiyên dengen ji aliyê ferhengnasiyê ve gelek girîng e. Bi taybetî di vî demê de ji bo ku ferheng bi giştî alfabetîk in yanî ji bo ku deng zimanî li gorî dengên alfabe yê tene rêz kirin, rêza alfabetîk a dengen, di nav peyvan de cihê dengen û tîkiliya navbera wan ji bo ferhengnasiyê gelek girîng e. Digel vê di ferhengên du zimanî de û di gelek ferhengên din de jî di destpêka madeyan de teleffuza peyvan jî tê dayîn. Ji bo peydakirina teleffuza rastî a peyvan û ji bo rêzkirina rast di nav ferhengan de, daneyên fonolojiyê gelek girîng in. Ji bo vê di navbera fonolojî û ferhengnasiyê de tîkiliyê nêzîk heye. Burkhanov, xebatên cîhanê digire ber çav û diyar dike ku zanyar ferhengnasiyê çawa terîf dikin:

- ✓ Kesên ku ferhengnasiyê wekî qada zimannasiya pratîk dibînin (Richards Platt & Weber,1992).

- ✓ Kesên ku dibêjin ferhengnasî zanistek agahiyê ye (İlson, 1992).
- ✓ Kesên ku ferhengnasiyê wekî qadeke xabata filolojîk û tarîxî dibînin (Denison, 1977).

Burkhanov, piştê ku van tespîtan dîke di derbarê ferhengnasiyê de fikrê xwe wiha bilêv dîke. Ferhengnasî xwediyê aliyê teorîk e ku ev di çarçoveya zimannasiya teorîk de ye, aliyê pratîk jî heye ku ev jî di nav zimannasiya pratîk de tê nirxandin. Lê belê digel van di salên 1980î de tê zanîn ku kesên ferhengnasiyê wekî zanistek nabînin jî hene. Mesela Herbert Ernst Wiegant (1983) di derbarê vê zanistê de van gotiye:

- ✓ Ferhengnasî tu wext nebû şaxezanistek û dê nebe jî.
- ✓ Ferhengnasî bineşaxeke zimannasiya pratîk jî nîne.
- ✓ Ferhengnasî şaxeke peyvsaziyê jî nîne (Aktaran: Usta, 2010: 94).

Ev tespîtên ku rewşa ferhengnasiyê heta salên 1990î nîşan didin bi rastî êşa zayîna şaxezanistek jî diyar dikin. Sedema diwariya kifşekirina cihê wê jî ji ber vê ye. Piştê van şîrove û nêrînên cuda em dikarin bibêjin ku îro ferhengnasî şaxezanistek bi serê xwe û azad lê belê di heman demê de navberdisîplînî ye. Wekî şaxezanistek azad li gorî xwe xwediyê metod û disîplînan e (Baskın, 2014: 451-453).

#### **1.1.6. Armancên Ferhengnasiyê/ Armanc Rêbaz û Çarçoveya ferhengan**

Li gor agahiyên ku me bi dest xistiye armancên ferhengnasiyê bi esasî wiha tê rêz kirin:

- ✓ Armanca ferhengnasiyê ya bingehîn ji bo ku hebûna peyvan ya di ziman de di ferhengê de bê terîf kirin rê û rêbazên zanistî amadekirin e. Her wiha, armancekî wî jî ji bo emilandinên curbicur amadekirina ferhengan e.
- ✓ Yek ji mijarên sereke jî derxistina tipolojiya ferhengan e. Rêbazên ferhengnasiya pratîk jî (dijîtalkirin, faydekarî, rêbazên elektronîk, armancên ferhengan yê civakî û hwd) di pêşxistina tipolojiyê de xwedî bandor in. Derxistina tipolojiya ferhengan ji bo ku rêbazên ferhengnasiyê yê giştî derkeve holê lazim e.
- ✓ Teoriya ferhengnasiyê, ji wê rêya ku bi ferheng nivîsînê re gav davêje, ber bi rêya disîplînekî teorîk ve diçe. Tê xuyan ku ev disîplîn bi giştî ji sê aliyan ve pêş ketiye: Bi armanca perwerdekirinê, pîrzimanî, zanistî-teknîk ( Usta, 2010: 97).

Ferhenga baş, ew e ku agahiyên rast û bikêrhatî bide nasîn. Lê belê di derbarê pêkhatin û çêkirina vê de fikreke navneteweyî tune. Di cihê van de xebatên ku ferhengan çêtir bike û sepandinên ku qelîteya ferhengan bilindtir bike têne kirin. Ji bo van xebatan xebatên qada ferhengnasiyê tê gotin. Di derbarê ferhengnasiya Kurdî de li Tirkîyê û herêmên din de di qada ferhengnasiyê de problemên têgih, terîf û çarçoveyê hene. Digel van cihê ferhengnasiyê û têkiliya ferhengnasiyê bi makezanistên din re eşkere nîne. Armanca bingehîn a vê xebatê ferhengên Kurdî bidin nasîn û tesnîfa wan kirine. Her wiha di derbarê mijarê de nirxandineke nû bê kirin. Ji bo vê xebatên di derbarê ferhengnasiyê de yên ku li Tirkîyeyê û li dînyayê hatine kirin di vê xebatê de hatine kom kirin di navbera wan belgeyan de muqayese hatine kirin û ji ser agahiyan ve encamek hatiye derxistin (Sami Baskın, 2014: 447).

## BEŞA DUYEM FERHENGÊN KURDÎ

### 2.1. TESNÎFA FERHENGÊN KURDÎ

#### 2.1.1. Kurdî- Kurdî

Celadet Bedîrxan bi Kurdî –Kurdî ferhengek amade kiriye. Ev ferheng di sala 2009an de li Stenbolê û çapxaneya Berdan de hatiye çapkirin. Ferhenga Celadet Alî Bedirxan bi alîkariya rêzdar Celal Talebanî û Xatûn Hêro Îbrahîm Ehmed ji nû ve tê çapkirin. Ferheng ji 332 rûpelan û bi qasê 16800 peyvyan pêk hatiye. Di dawiya ferhengê de di ferhengoka Hawarê de nêzê 150 peyv jî cih girtine. Ev ferheng piştî belavbûna alfabeya Latînî, derxistin û rawestandina kovara Hawarê, bû pêdiviyek ji bo pêşveçûna zimanê Kurdî û belavbûna vî zimanî li hemû herêman. Sînemxan Bedirxan di pêşgotinê de wiha gotiye;

*Ez dikarim bibêjim ku yekemîn ferhenga kurdî-kurdî bû. Lê mixabin ji ber koçkirina bavê min û piştî koçkirina wî, astengî ketin nav jiyana me de, ev ferheng belav nebû heya niha. Piştî du sal li ser koçkirina bavê min, diya min Rewşen xanim ji rehetî Apo Osman Sebrî xwest ko arîkariya wê bike bo nivîsandina vê ferhengê. Her peyv li ser qartek hatibû nivîsandin, Apo Osman Sebrî her roj dihate malê û bi destnivîsa xwe ya delal van peyvyan li ser defteran dinivîsand. Demek dirêj kêşa heta ko Apo Osman Sebrî kare xwe temam kir û em gelek spasiya wî bikin. Piştê qedandina ferhengê, di sala 1970an de Rewşan Xanim, ji bo çapkirinê şande Beşa Kurdî ya Akademiya Bexdayê. Lê mixabin Akademî demekî dirêj çap nekir. Ez û Selah Sadallah me seredana Akademiye kir, ferheng li wir bêxwedî û li 'erdê bû. Me ferheng bi dizîkî ve bir û gihande mal. Li wir bala me kişand ko şeş tîpên (a-b-c-ç-d-e) ji Akademiya Bexda hatibûn dizîn (Bedirxan, 2009: 12).*

Ferhenga Celadet Bedirxan ji aliye Weşanxaneya Avestayê ve hatiye weşandin û wek ferhengên din yek beş nîne, ji ber astengî û kêmasiyan ferheng bi sê beşan hatiye çapkirin.

1. Beşa Yekem şeş tîpên (a-b-c-ç-d-e) Selah Sadallah
2. Beşa Duyem Ferhenga Celadet Bedirxan



### 3. Beşa Sêyem Ferhenga Kovara Hawarê.

Celadet Bedirxan di ferhengê de nivîsek bêîmze ku di derbarê rêziman û alfabeayan de ye nivîsiye. Di ferhengê de wateya peyvên gelek berfireh hatiye nivîsîn. Ji ferhengê çend mînak;

**gelemper:** *tiştê ko ne xweser e, ji bo her kesî an ji bo her tiştî ye. Qanûna mirinê qanûnekî gelemper e; tu kes jî nafilite. Bi gelemperî; bi awayê gelemper. Bi gelemperî kurdmanç çiyayî ne. ( gênêral)*

**havîna- pêşîn:** *meha salê a çaran. Ji xwe kurdmanç mehan bi du awan bi nav dikin. Bi navên ser xwe û bi navên çaxên salê.*

1. Adar (Buhara - pêşîn)
2. Nîsan (Buhara - navîn)
3. Gulan (Buhara - paşîn)
4. Hizêran ( Havîna- pêşîn)
5. Tîrmeh ( Havîna- navîn)
6. Tebax ( Havîna- paşîn)
7. Îlon ( Payîza- pêşîn)
8. Çiriya- berî ( Payîza- navîn)
9. Çiriya- paşî ( Payîza- paşîn)
10. Çileyê berî, kanûna- berî ( zivistana- pêşîn)
11. Çileyê paşî, kanûna- pêşî ( zivistana- navîn)
12. Sibat, gecok( zivistana- paşîn) (Bedirxan, 2009:274)

Gîwî Mukriyanî bi navê *Ferhengê Kurdistan* bi Kurdî- Kurdî ferhengeke amade kiriye. Bi salan di nava gelê Kurd de li hemû deveran geriyaye û ev ferheng amade kiriye. Çapa ferhengê ya yekem di sala 1999an de li Hewlerê bi tîpên Aramî hatiye weşandin. Gelek Kurd yê ku bi tîpên Latînî dixwînin ji ferhengê îstifade nekirine ji bo vê yekê ji keça Gîwî Mukriyanî Dr. Kurdistan Mukriyanî destûr heta xwestin ji bo latînîzekerina ferhengê û çapa duyem jî di sala 2010an de li Amedê bi tîpên latînî hatiye çapkirin. Ferheng ji aliyê Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve bi awayekî ku peyvên hemû zarava, devok, heremên tê de hene hatiye weşandin. Di pêşgotina ferhengê de bi daxuyaniyeke kurt di derbarê alfabea latînî û aramî de agahî hatiye dayîn. Di vir de ya herî girîng behsa tîpa ('eyn) kiriye di latînî de jî wek dabir (') tê bikaranîn. Di ferhengê de nêzê 65 hezar peyvên Kurdî hene û çavkaniya wan peyvên li kêleka wan hatine

nivîsandin. Hin peyvan jî bi kurte hatine nivîsîn. Wekî nimûne; erde. ‘Erdelanî ye; peh. Pehlewî ye; bak. Bakûrî ye; meh. Mehabad e; za. Zazakî(Kirdkî, Kirmanckî) ye; çî. çiyayê Kurmanc e. Ev ferheng li ser 185 referansan hatiye amadekirin. Ferheng bi giştî 1344 rûpelan pêk hatiye. Di pêşekê de nivîsek Dr. Kurdistan Mukriyanî jî cih girtiye (Mukriyanî, 2010:1-30).

Di ferhenga Qanatê Kurdo de bi vê awayê behsa ferhenga Gîwî Mukriyanî hatiye kirin;

*Ferhenga Gîwî Mukriyanî ya kurdî-farsî-erebî-fransîzî-înglîsî di sal 1955an de li Hewlêrê hatiye amade kirin. Ferheng qasê 130 belgeyan pêk hatiye. Tê da kêma û hindik melûmetiyên gramatika zimanê kurdî hatine nivîsandinê. Ev ferhenga wî bi tomerî ya xeberên têmatîkîne. Têda lêksîka rênçberîya-gundîtîyê ya zaravê kurdî soranî hatiye nivîsandinê. Tê de wisa jî navê parên can, navê xwarinê, yê fêkî, yê dar û diraxtan, navê cilan, yê heywan û teyrên malî û hovî, termîne xizmiyê hatine nivîsandinê. Hemû xeberên kurdî bi herfên erebî û trankrîpsîya latînî hatine çapkirinê. Ferhenga Gîwî Mukriyanî ya ‘Erebî –Kurdî ku sala 1950 hatiye çapkirinê, ferhengeke gelek giranbaha û bi qîmet e. Ev ferheng qasê çarsed rûpel bûye. Têda lêksîka zaravayê kurmançî, yê zaravên kurdên nehiyên Silemaniyê, Hewlêrê, Rewandîzê, Kermanshahê û Senendecê hatiye çap kirinê. Xwedînivîs hemû xeberên zani bûn, kirine nav ferhenga xwe. Ewî(Wî) hemû xeberên erebî rast wergerandiye ser zimanê kurdî û di tercîma wîda şik tune. Ewî(di wê) ferhengêda hemû fikirên xeberên erebî bi kurdî nivîsîne, lê rex xeberên erebî, yê ku gorî wan tune, ewî fikira(vêca) wan bi kurdî şirove kirine. Di ferhengêda gelek xeberên sînonîmî yê cur-cure zaravên kurdî hatine nivîsandinê.*

*(Kurdo, 1960: 20)*

Bi çend mînakana muqayesekirina ferhenga Gîwî Mukriyanî bi ferhenga Nûbihara Biçûkan re;

*reşbelek*: merêke reşî le leşî da le spiyekey pitir bê. dawetî jin û piyawan û kur û kiçan be têkelawî, ( bak. , şîka.) cergebez, govend. dû hewda ya benî reş û spî ye, ke pêkewe badrabin, reş û spî, reşbaz, (ke.) reş û çermig. (bak.) nûsrawe, name, Ehmedî Xanîle Newbaharî da gutûye: van çend reşbeleka.

Di ferhenga Nûbihara Biçûkan de peyva *reşbelek* bi mecazî yanî bi Tirkî bi wateya "müsvedde" hatiye bikar anîn (Yıldırım, 2008: 160).

*Peyrew(hewra)*: peyro. kesêke le guftar ye le kirdarêkî da çaw le pekêkî tir bikat-î (*hewra*): peyroyî, çawtêbirîn, çaw lêbirîn.

*peyro*: peyrew. -yî: (hewra.) peyrewî (Mukriyanî, 2010: 806).

Di ferhenga Nûbihara Biçûkan de "*peyrew*" bi vê awayê hatiye nivîsîn;

*Ku bûne peyrewê di wî*

*'Ereb û 'Ecem û Kurmanc û Romî*

*peyrew: takipçi, bağı.*

Di ferhenga Îzolî, Farqînî û bi gelemperî di ferhengên din de jî bi 'eynî me'neyê hatiye nivîsîn.

*vêk-êxistin (bak) : kokirdinewey çitî peragende*

Di ferhenga Nûbihara Biçûkan de "*vêk-êxistin*" bi vî awayê hatiye nivîsîn;

*Vêkêxistin Ehmedê Xanî*

*Navê "Nûbihara Biçûkan" danî*

"Vêkêxistin" bi me'neya tovkirin, berhevkirin hatiye bikar anîn. Gîwî Mukriyanî jî emilandina wî ya bi Tirkî wiha diyar dike: "toptan perekende".

Muhammed Xal, bi navê *Ferhengî Xal*, ferhengeke bi Kurdî-Kurdî amade kiriye. Ev ferhenga ku navê nivîskarê wê li ser e, yekemîn ferhenga Kurdî ya yek zimanî ye tê zanîn. Ferheng sê cildan pêk hatiye û tê de bêjeyên Kurdî dîsa bi zimanê Kurdî tên îzahkirin. Di salên 1960, 1964 û 1976an de li Silêmaniyê hatiye çapkirin (Akin, 2013: 61).

Şêx Mehmed Xal, bi navê *Ferhengî Xal* Ferhengek amade kiriye. Di sala 2005an de li Hewlêrê û weşanxaneyê Arasê de hatiye çapkirin. (Yıldırım, 2008: 105).

Abdulrahman Muhammed Emin Zebihî, bi navê *Qamusî Zimanî Kurdî* bi Kurdî-Kurdî ferhengeke amade kiriye. Ferheng deh cild e û heya niha du cildê wê ji nav

Weşanên Akademiya Kurd a Zanistiyê ve hatiye weşandin. Di salên 1977 û 1979an de li Bexdayê tê çapkirin. Bi alfabeya ‘Erebî nivîsiye (Burkay, 1991:5; Yıldırım, 2008:101-103).

Maruf Karadaxî Merdux, Ferhenga Kurdî-Kurdî a *Çandiniyê* çêkiriye û di sala 1972an de wek du cild çap bûye. Di her du cildan de nêzê 7 hezar peyv cih girtine. Ferheng bi alfabeya ‘Erebî û tê de navên nebatan, navên berên cotemenî û navên ajalan jî hene (Burkay, 1991:5; Yıldırım, 2008:101-103).

*Ferhenga Kamêran*, ji aliyê Kamêran Silêman Botî ve hatiye amede kirin. Ferheng bi Zimanê Kurdî-Kurdî di sala 2006an de li Çapxaneyê Wezareta Perwerdeyê/Hewlêr, Weşanxaneyê Spîrêzê de û li Duhokê hatiye weşandin. Ferhenga Kamêran ji 775 rûpelan pêk hatiye û nêzê 20 hezar peyvên sereke tê de cih girtine. Peyvên Kurdî, bi Kurdî tê de hatine şirovekirin û herwiha hevwateriyên peyvên jî hatine nivîsîn. Di ferhengê de gelek peyv bi awayê kurtkirî hatine bikar anîn. *Mînak; Nav: N, Hevalkar: HK, Hevalnav: HN, Rengdêr: RD, Rêzman: Rêz, Gelek: G hwd.* Navên çend welatan, navên rojan û navên mehan jî di ferhengê de cih girtine. Hêjayiyên ferhenga Silêman Botî gelek in. Ya ji hemûyan girîngtir ew e ku ev yekem ferhenga Kurmancî-Kurmancî ye ku li ber destê xwendevanan amade bûye. Ji bo asankirina têgihîştina peyvên di ferhengê de gelek wêne nîşan dane. Herwiha yek ji hêjayiyên vê ferhengê ew e ku tê de gelek peyvên xweş yê devoka Behdînî hene. Ferhenga Kamêran wekî kitêb jî heye û li ser internetê di malpera Weşanxaneyê Spîrêzê de jî li berdest e. Di ferhengê de bi serenavek “Çima Latînî” di derheqê taybetiyên alfabeya Latînî de wiha dibêje:

*Ji bo çi ferhenga kurdî-kurdî û bi rênivîsa latînî?*

*Zimanê kurdî êk ji zengîntirîn zimanên cîhanê ye, lê jiber rewşa sîyasî zîma jî parçe bû û gelek zarav û devok peyda bûn û dûratî keft di nav van devokan da, herweha çend rênivîs di zimanî da egereka neyînî heye, çunkî kurdên bi pîtên erebî di nivîsin û di xwînin nikarin mîfayî ji nivîs û kitêbên bi latînî hatîn nivîsin wer bi girîn û dîsan piraniya kurdên li ewropa, bakur û rojavayê nikarin rênivîsa pîtên erebî bi xwîn û mîfa jê bi wergirin.*

*Rênivîsa latînî zimanê Kurdî dirist û ciwantir pê di hên nivîn, wek nav, kiryar û corên kiryaran(xurî, darijttî, lêkadayî), herwesa bi pîtên erebî hendek pît û deng hinda di bin, bi şaşî di hên nivîsîn yan jî cihgurkî di bin, wek pîtê y;yarî, î;înan, ko du pîtên cudane lê di rênivîsa ‘erebî da di bin yek.*

*Hinde peyvên resen yên Kurdî, hene, jiber ko xelik hizir û nivîsîn wek ya erebî di ken, lewra lêvkirina wan wek erebî lê di hêt, herçende ew pît di zimanê Kurdî da nînin. Wek: Erd, Esman, lê bi ya Latîni ciwan û dirist di hên nivîsan û xwedîn.*

*Nav û kiryar ên darijtî û lêkayî bi latîni pir zalal û ciwan xuya di kin, mîna karkirin, berhevbûn, mêrçak, sermezin û htd, lê dema bitên erebî di nivêsin mirov nizane kanê yek peyve yan çend peyvekin.*

*Ji bo piranî jî di rênivîsa latîni gelek ciwan diyare, wek. Gul: gulan, Gule: guleyan, dehbe: dehbeyan û hw. lê bi erebî wek dehban û gulan di nivîsin û ev çende renga hinde caran ramana peyvê bi gihore (Botî, 2006: 11).*

Danerê Ferhenga Kamêran herwiha bi zanetî peyvên 'Erebî yên ku di zimanê Kurdî de tîn 'emilandin li derî ferhengê hêlane. Ev kêmasiyek mezin e ji ber ku ew peyv di axiftin û nivîsîna zimanê Kurdî de her tîn bikaranîn û belkî bikarînera/ê ferhengê hewcedarî têgihîştina wan be lê nikare wan di vê ferhengê de bibine (Botî, 2006:7-20).

Hin kêmasiyên ferhengê jî hene. Ji aliyê rêzimanî ve gelek şaşîti hene. Derbarê nivîs û îmlayê de gelek peyv (bi taybetî nivîsîna pirtikên peyvyan bi hev re yan ji hev cuda) bênizam hatine nivîsîn. Wek mînak; *jibo, boçî, di bin, di karin* hwd.

*Ferhenga kurdî- kurdî latîni jibo kê?*

*Mebest ji çêkirina vê ferhengê ewe ko bi dîtina min zimanê kurdî gencîyeka mizin ya pîrî peyv û pendê, lê mixabin em ne karîne weke pêwîst bi ka bi hînin, lewra li dîv şîyanên xwe min di xwast karekî bi kem jibo hînbûna pîtên latîni bi zimanekê xurî û dako xelkê me mîfayî jê bi wergire. Ev ferhenge ji zimanekê xurî û bijavtî pêkhatiye, hemû kes di hemû pileyên xwendinê di karin mîfayî jê bi bînin, çunke bi kurdiyeka sade û hêsane. Min gelek pêkol kirîya ko peyvên bîyanî û çewt ne êxim navda, lê gelek peyv heye, renga ne kurdî bin, lê jiber yên kkevtîn nav zimanê me da kurd rojane bi kar di hînin, herwesa zarava û peyvên navneteweyî û cîhanî wek xwe hatîne û ez bi pêdivî na bînin bi hên wergerandin wek: kompiyoter, televîzyon, radyo, faks û hwd. Kesên ji nû fêrî xwedîn û nivîsînê di bin, di karin bi hêsani mîfay ji vê ferhengê wergirin, çunke peyv ya hatî nivîsîn kanê çawa dê hîne nivîsandina wê bin, riste bi awayekê sade hatine darijtin, gelek pendên pêşinan û mamik têda hene, şîrovekirina peyvê û çawatiya lêvkirina wê û bi kar anîne di risteyan da (Botî, 2006: 11)*

Ferheng bi alfabeaya Latînî hatiye nivîsîn. Di ferhengê de navên meh û salan, navên rojan, navên çend welatan û çend danîşan jî cih girtine. Yek jî, di ferhengê de gelek peyv bi awayeke cuda hatine nivîsîn. Wisa xuya dike ku tesîra Soranî gelek çêbûye. Wek mînak;

*herf: pît; dengdar: nivok; dengdêr: zingok; mezin: mizin; daçek: pêrbest; yekşem: êkşemb.* (Botî, 2006: 21-28)



**Lez** (n.x.mê) Kar yan bizava ko zû bi hêt kirin. Gîro nebit. : Bi lez here mal, bêje birayê xwe da bi hêt vêrê. *Pend*: Min bûkek hîna bi lez û bez, sivika malê bûme ez. ang; dema dayk bûkekê jibo kurê xwe di hîne, jibo ku karê malê liser milên xesûyê sivik bike, berevajî karê girantir di bit bûk alîkarîyê nake. *Lezgîn*. Br× Hêdî.

**Lezandin** (k.jn.x.mê) Lezkirin. : Bi lezîne here cem bapîrê xo û bêjê da bi hêt vêrê. (K) bdn: ez di lezînim em di lezînin, tu di lezîni hûn di lezînin, ew di lezîne[...it] ewan di lezînin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di lezand, di lezandin. Db,dûr: lezandibû, ... bûn. (F): bi lezîne, bi lezînin.

**Lezgîn** (hk.hn,dar.çewa) 1. Bi lez. :Peyameka lezgîn û bersiveka lezgîn.2. Navê mêrane.

**Lezgînî** (n.dar.mê) Lez. Bi lez.

**Lezîn** (k.jn.x.mê) Lez. : Lezîna hajokina tirobêlê 120 km/dem.

**Lezkirin** (k.jn.l.mê) Bizavkirin jibo zû karekî bi cih bînin. Lezandin.(K) bn:Kirin.

**Lê** (pêrb) *rêzman* Alaveke hevberkirinê ye. jiber hindê. Belê. :Ez dê digel te hêm, lê bawer nakim merema me bi cih bi hêt. :Azad hat lê Helgord ne hat!.

**Lêbelê** (pêrbl) *rêzman* Lê. Jiberko.

**Lêbok** (hk.n.dar.çewa) Mirovê bi cil, reng û gotinan keyf û kenya xelîkî di hînit. Kenok.

**Lêçûn** (k.jn.l.mê) Pêveçûn. Wekhev. :Ew li babê xwe di çe.:Li heman rê çûn.:Agir li pelexî xweş çû.

**Lêdan** (k.jn.l.mê) Qutan. Êşandin.Azardan. Lêxistin. :Nabit mamosta li qutabîyan bi den, çunke lêdan qedexeye. (K) bn: Dan.

**Lêder** (kar.dar.dz) Kesê li amêrekê mûzîkê di de. Mûzîkvan. : Evîn lêdera tembûrê ye û Hêja lêderê kemançê ye.

**Lêgerîn** (k.jn.dar.mê) Dema mirov li karek yan kesekî bi gerit.: Eve çende ez li te di gerim, tu li kîrê bûy?. (K) bn: Geran [gerîn].

**Lêgeryan** (k.jn.x.mê) Lêgeran.Lêgerîn.

**Lêhatin** (k.jn.dar.mê) Dema tişt bê renckêşan yan zanîn bi dest mirovî di kevin.; *Pend*: Ma dê her bo lê hêt?. *Pend* :Lêhatin çêtire, ji jêhtinê. (K) bn: Hatin.

Di sala 2006an de ferhengeke Kurdî-Kurdî bi navê *Ferhenga Destî* ji aliyê Umîd Demîrhan ve hatiye amadekirin û ji aliyê Weşanên Nûbiharê ve hatiye weşandin. Umîd Demîrhan, kêmasiyên vê ferhengê dîtiye û ji bo ku vê ferhengê sererast û berfireh bike bi hin zêdekirinên nû di sala 2007an de çapa duyemîn amade kiriye. Çapa yekem ji 8 hezar peyvan pêk hatiye. Çapa duyem a berfireh jî ji 16 hezar peyvan pêk hatiye. Li Bazîdê û ji aliyê Weşanxaneya Sewadê ve hatiye weşandin û bi alfabeya Latînî hatiye nivîsandin. Ferheng ji 496 rûpelan pêk hatiye. Di dawiya ferhengê de bîbliyografyayeke nivîsarên li ser zimanê Kurdî heye û wisa dixuyê ku nivîskar piraniya çavkaniyên ferhengسازیê dane berçav. Di ferhengê de bi pîranî ji peyv û salixên rojane îstifade kiriye, ji bervê yekê peyvên heremî jî tê de hene (Demirhan, 2006:1-4).

Di Wêjeya Kurdî de amadekirina ferhengên Kurdî-Kurdî qadeke nûjen e û em dikarin bibêjin ku qet berhemên bi vî awayî neketine destê me. Lêbelê di hinek kovar, pirtûk û xebatên din de hin peyv Kurdî-Kurdî hatine ravekirin. Di amadekirina vê ferhengê de her çiqas ji van çavkaniyên berdest îstifade kiribe jî, piraniya raveyan ji aliyê nivîskar ve hatine kirin. Naveroka vê ferhengê nêzikî 8 hezar peyvî hatiye dagirtin û jê 1.500 peyv jî bi gotinên pêşiyên ve wateyên wan hatine xurtkirin. Di vê xebatê de weke rêbaz lêkerên hevedudanî hemû ji hev cihê hatine nivîsandin. Lê di rewşa navdêrî, tebatî û dançêker de bi hev re hatine nivîsandin (Demirhan, 2006:3).

*Mînak:*

*berze bûn, winda bûn*

*berze kirin, winda kirin*

*Her wiha me ji bo mefhûmên rêzimanî jî nîşaneya/(r)/yê bi kar aniye û ev nîşane daniye ber raveyê.*

*Mînak:*

*Kirde (r) fail, kirox, kirar, di hevokê de xwediyê çalakiyê*



le kirin **2.** (*mirov*) can-  
bêzarî kirin  
**avî** avdar, biav \*"baran, li  
cihê **avî** dibare"  
**avîje** paqij, pakîze  
**avîvan** **1.** kesê avê li ber  
mêvanan digerîne, av-  
der **2.** navekî keçan e  
**avjen** melevan  
**avjenî** melevanî  
**avjenî kirin** soberî kirin,  
melevanî kirin  
**avkozki** rîzîna rehekan ji  
ber avdana pir  
**avkozki bûn** (*rehek*) ji ber  
pir-avdanê rizîn  
**avpalêv** alava palavtina  
avê  
**avpîv** alava pîvandina as-  
ta avê  
**avrêj** destşok  
**avşile** dimis, doşav  
**avzêm** kaniya demdemî  
**avzêr** ava ku bi zêr ve tê  
rengdarkirin  
**avzêr kirin** ji ava zêr re  
derbas kirin  
**avzûng** xeleşa serê kem-  
berê ya ku pê tê gi-  
rêdan  
**awa** celeb, cure \*"ji dê û  
bavan, dikevin hezar  
**awa"**  
**awan** fitnebaz, dekbaz  
**awar** helew, şirînahî  
**awarte** **1.** mustesna **2.**  
neasayî  
**awartin/diawêre/bia-**

## axund

**wêre** **1.** bi dûr xistin **2.**  
tuneyî hesibandin  
**awat** **1.** umîd, hêvî **2.**  
xwestek  
**awaz** deng, sewt  
**awêne** **1.** neynik **2.** eşkere  
**3.** kifş  
**awilandin/diawilîne/bi-**  
**awilîne** xapandin  
**awilîn/diawile/biawile**  
xapîn  
**awir** nêrîn \*"ne nanê ma-  
zûvanan, **awirên** wan tê  
xwarin"  
**-awir tê vedan** di bin ça-  
van ve lê nihêrtin  
**ax [I]** baneşana keserê  
**ax [II]** **1.** xwelî **2.** xak  
\*"ax û avahî, nav û  
nandayî"  
**axa** **1.** serekê êlekê **2.** to-  
rin  
**axaftin/diaxive/biaxive**  
**1.** xeber dan **2.** peyivîn  
**3.** qise kirin **4.** qal kirin  
**axatî** **1.** serokatiya êlekê  
**2.** torinî  
**axirî** **1.** dawî **2.** encama  
karekî \*"**axirî**, heta derê  
gorê ye"  
**axivîn/diaxive/biaxive**  
**1.** (*birîn*) ji nû ve vejîn  
**2.** terqîn **3.** bijiqîn  
**axîn** **1.** keserkişandin **2.**  
nalîn  
**-axîn kişandin** **1.** nalîn **2.**  
zûrîn **3.** kesirîn  
**axund** mela

Çend mînak ji Ferhenga Destî(Umîd Demîrhan).

**Rewa:** 1. bi serbestî bikaranîna mafekî 2. tişt, gotin û kiryar ên qanûnî yên ku mafê mirovî heye pê

**Rabe:** meşrû, cayîz

**Rewa bûn:** 1. serbest bûn, 2. meşrû bûn, caîz bûn

**Peyrew:** 1. xelef, paşwer, 2. murîd

**Peyrewî:** 1. xeleftî, paşwerî, 2. murîdî

**Dîtir:** 1. a din 2. wêdetir

**Bihuşt:** cenet "bihuşt, li rûyê erdê ye"bihuştîn, cenetmekan.

**Arî:** xweliya piştê şewatê (gelemperî li serhedê pêşû tê gotin)

*Ferhenga Botan[Peyvên Wenda]*, bi Kurdî-Kurdî ji aliyê Bahadîn Robar ve hatiye amadekirin. Di sala 2013an de li Stenbolê ji aliyê Weşanên J&J û li çapxana Berdanê hatiye çapkirin. Ev ferheng ji 2330 gotin û peyv û nav û têgehên ferhengî pêk hatiye. Ferheng bi alfabeya Latînî hatiye nivîsîn û 183 rûpelan pêk hatiye. Armanca nivîskar ya yekem ji vê ferhengê ew e ku, hin peyv û tegehên di karûbarê pişeyê de ku cihê xwe ji makîne û amûrên hemdem re berdane bide nasîn. Herwiha, amûr û tegehên di koçerî, cotkarî, sewalkarî, tevnikarî, necarî û di mijarên cur be cur de ku bere dihatin bikaranîn û niha ku qet nayên bikaranîn an jî di şûna wan amûr têgehên de hin amûr û têgehên din tên bikaranîn, ji nû ve vejîne. Her wiha gelek lêker û navên xebatên ku hatine jibîr kirin an jî kêmtên zanîn armanca vê ferhengê bû. Ferheng bi taybetî li ser herêma Botan sekiniye. Peyv û têgehên di vê ferhengê de li herêmekê an li navçeyekê an li gundekî an jî di nava 'eşîrekî, an jî di nava çend kesên dût ji jiyana hemdem de tên bikaranîn pêk tê. Yanê armanca ew e ku em van peyv û têgehên ji windabûnê rizgar bikin. Armanca nivîskar ya duyem ji ferhengê ew e ku vê ferhengê ji dirûvê ferhengên klasîk derxe. Peyv, amûr, têgehên ku di ferhengê de nivîsiye ji hêla şêwe, teşe, kar, bikêrhatin, reng, dirûv, bikaranîn û ji hemû hêmanan ve zelal bûyîn (Robar, 2013:1-10).

Di ferhenga Botan de piranî peyvên folklorîk cih girtine. Ji ferhenga botan (Peyvên Wenda) çend mînak;

**Afir:** Alava cihê em dayîna sewalan a bi qasî 50 cm fireh û 20 cm kûr û ji mitroyekî heta 4-5 mitroyan dirêj a ji dar û dep an jî ji hesin, teneke û hwd. hatî çêkirin û piyên wî bi qasî 20-30 cm ji 'erdê bilind hatî çêkirin (Robar, 2013: 27).

**Alifdank:** wekê afir hatiye nivîsîn.

**Bêrî:** Cihê pez lê tê dotin ê sê kevirê mezin ê ku mirov bikaribe li ser rûne en awayê sêkuçî hatîn danîn û kevirê li aliyê jorê bêrîvaneke ku berê wî/wê li pez e li ser rûdine û herdû kevirên din jî her yekî berîvaneke awayê ku piştta wan li pez e rûdinin û pezî didişon e (Robar, 2013: 27).

**Cebilandin:** Karê strandina hinayê ya ku mirav avê berdide ser hinayê û tevlihev dike heta mîna hevîrî hevgirtî dibe. Mnk: Em ê hinaya bûkê bicebilînin (Robar, 2013: 33).

**Conî:** Kevirê mezin ê çalek 20- 25 santêm kûr û 20-25 santêm fireh tê de heyî û binax an jî hêla mirovan ve hatî binaxkirin û zad tê de tê kutan (Robar, 2013: 37).

**Qajik:** Benîştê jî şîrê kerengzeran hatî çêkirin ê mirov dicûn û di despêkê de tehma wî tehl û çîr û piştî demeke cûtîne nerm û tehmxweş dibe (Robar, 2013:123).

**Qewî:** Ji bo kar an jî tiştan di wateya hin, hinek, tibabek û hwd.

**Qewîfî:** Tenbîhkirin û daxwaza li gor dilê xwe dan pêkanîn ango tewsiyekirin (Robar, 2013:127).

Di zimanê Kurdî de dewlemendiya navên ajalan em ê bi çend mînakên nişan bidin:

**Beran:** Pezê nêr yê ku êdî di çar saliya xwe de ye û ji bo tov hatî hiştin (Robar, 2013: 22).

**Berindir:** Pezê nêr yê ku ketî du saliya xwe de, yanê pezê nêr û du salî (Robar, 2013: 24).

**Berx:** Peza ku hêj yek saliya xwe ne qedandî ango ji dema zayîne heta yeksaliyê ji pezê re berx an jî berxik tê gotin (Robar, 2013: 26).

**Berxik:** Peza ku hêj yek saliya xwe ne qedandî ango ji dema zayîne heta yeksaliyê ji pezê re berx an jî berxik tê gotin (Robar, 2013: 26).

**Kavir:** Peza di du salî ya xwe de, an jî berxika sala par (Robar, 2013: 79)

**Mîh:** Peza mezin a ji sê saliya xwe temam kirî û ketî çar saliye de û êdî dikare bizêt(berxika bîne dinê).(Robar, 2013:107).

Li gor mînakên jor hin kêmasiyên ferhengê tê xweya kirin. Em dê hin bînin ziman.

Di ferhengê de dewlemendiya cureyên (mê, nêr hwd.) ajalan neanîne berçav. Mînak;

mê: berx	nêr: berx	mê: kar	nêr: kar
berxik	berxik	karik	karik
kavir	berindir	diştîr	gîsk
mî	hogeç	bizin	nêrî
	beran		

Peyvên ku me nivîsiye bi gelemperî li zozanan di nava bêrîvanan de me bi dest xist. Wisa xweya dike ku di nava gelên Kurdan de ji bo navê ajalan li gor zayandê wan qasê şeş mehan çarek navên wan digûhere.

*Ferhenga Bêwar*, bi Kurdî-Kurdî ji aliyê Bêwar Diyadînî(Mehmet Kemal IŞIK) ve hatiye amade kirin. Ferheng di sala 2014an de ji aliyê çapxana *Berdan* ve hatiye çap kirin û ji aliyê *WeşanênJ&J* ve li Stenbolê hatiye weşandin. Bi alfabeya Latînî hatiye nivîsîn. Ferheng ji çar beşan pêk tê.

- Beşa yekemîn: Dar û Ber (188 peyv).
- Beşa duyemîn: Sewze û Mêwe (419).
- Beşa sêyemîn: Ajal û Sewal (215).
- Beşa çaremîn: Alav û Amûr (2712). Ferheng ji 126 rûpelan pêk hatiye.

(Diyadînî, 2014:1- 8).

***Axû (mancelina-manzenilha)***: Ji famîleya giyaşîrkan li doravoken antil dibêjin heşin dibin. Dareke pir jehriye. Xelkên wira bi jehrên wî tîrên xwe jehrdayî dikin (Diyadînî, 2014: 11).

***Hewran (kavak-populus)***: Ji famîleya biyananin. Derên avî hêşîn dibin. Di henek cûreyên wanda bejna heneka hetanî 30 sîhmetreyê bilind dibe. Keresteyê xwe pir te xebitandin (Diyadînî, 2014: 16 ).

***Bindeq(kestane-castanea sativa)***: Dareke ji famîleya berûyenin. Li nîvqada bakur li derên nermhewa yî û li welatemejî li derdoren behra reş hêşîn dibin. Mêveyêwî pir bi nîşeste û bi rûne. Qalikê[xwe] pir işke û giroverin (Diyadînî, 2014: 25).

***Kûncî (susam- sesamunindicum)***: Nebatekî ji famîleya kûnciyan e. Li derên germ hêşîn dibin. Toximên wî çendê garis e (Diyadînî, 2014: 32).

Wexta ku mirov bi ferhenga Nûbihara Biçûkan re muqayese dike, navê mêwe û sebzeyan bi gelemperî wekî hev hatine nivîsîn. Çend mînak;

*Bih: ayva, sêv: elma, kuncî: susam, kundir: kabak*

Di vê ferhengê de di derbarê peyvên alav û amûran de gelek kêmasî henin. Navê alav û amûran kêma hatine nivîsîn û hin peyv di nava gel de çawa tê bikranîn bi wî awayê nehatiye nivîsîn, wek mota mot, werger hatiye kirin. Wek mînak;

*perawî: defter, pênuştraş: qelemtraş* (Diyadînî, 2014:105).

*Ferhenga Kurdistanî* bi Kurdî-Kurdî ji aliyê 'Elî Ekber Kurdistanî ve hatiye nivîsîn. Navê ferhengê ê resen *Bedai'u- Luxet(Bedai'el- Luxet) e*. Bi zimanê Erebi ye. Jan Dost di wergerê de navê ferhengê dike *Kurdistanî*. Jan Dost dibêje: "*ku mirov dikare bibêje bi kurdî-kurdî ferhenga yekem e.*" Di ferhengê de nêzê 2010 peyv hene. Ferheng di

sala 2010an de li Stenbolê û ji aliyê weşanên Nûbiharê ve hatiye weşandin. Bi alfabeya 'Erebî hatiye nivîsîn û peyre Jan Dost wergerê Farisî dike û di dawî de bi alfabeya Latînî jî dinivîsîne (Kurdistanî, 2010:5).

*Ferhenga Kurdistanî*, di demeke aloz û tevlihev de ji bo Kurdên Rojhilat hatiye nivîsîn. Nivîskar dibîne ku herkes li ser 'erdnîgariya xwe behsa milletê xwe dike ew jî dibê ku hewce ye ez jî hewl bidim qelema xwe û dest bi nivîsê bikim. Ev ferheng 146 sal berî hatiye nivîsandin. Ji ber vê yekê peyvên resen yên Kurdî di ferhengê de cih girtine. Ferheng li ser zaravayê Başûrê Rojhilat û bi taybetî li ser bajarê Sinê û derdora wê gelek agahî dide.

Xwediyê ferhengê 'Elî Ekber Kurdistanî peyvên ku di ferhengê de bi alfabeya 'Erebî rêzkirine, lê Jan Dost di wergerê de li gor alfabeya latîne rêz kirine. (Kurdistanî, 2010:6-9)

Di dawiya ferhengê de, lêkolîner Muhemmed Reûf Tewekkulî nêzê 156 peyv rêz kirine. Li gor Jan Dost nayê zanîn wan peyvên gelo danerê ferhengê daniye an jî yê ku desxet nivîsiye wî lê zêde kiriye. Jan Dost wexta ferhengê werger dike wan peyvên dixê nava ferhengê û wekî bi sembolekan (pp) nîşe kiriye.

Ji nav wan peyvên mînak û muqayesekirina bi ferhenga *Nûbihara Biçûkan* re: Di ferhenga *Nûbihara Biçûkan* de "reşbelek" bi awayekî mecazî bi wateya mûsvedde hatiye gotin. Di nava gel de bi gelemperî ji *belekî* yanî ji "reş û spî" re tê gotin. Di ferhenga Kurdistanî de jî wiha hatiye nivîsîn;

***Reşbelek (pp):*** *Dema dîlanekê di dewetan de digêrinin û jin û mêr dikevên destên hev, ji wan jin û mêrên ku dikevên destên hev re tê gotin reşbelek. Lê reqs û dîlana jin û mêran bi hev re, yan ya jinan, yan jî ya mêran bi tenê re tê gotin çopî* (Kurdistanî, 2010: 204).

Çiya Mazî bi navê *Ferhenga Gotinên Pêşiyên*, ferhengek amade kiriye û di sala 2005an de li Stenbolê ji aliyê Weşanxaneyê Elmayê ve hatiye weşandin. Ferheng ji 495 rûpelan pêk hatiye û bi alfabeya Latînî hatiye nivîsandin. Çiya Mazî di sala 1998an de dest bi vê xebatê kiriye û qasê şeş sal li ser xebitiye. Li gor nivîskar di ferhengê de ked û emeka jinan gelek çêbûye yanî di berhevkirina gotinên pêşiyên de gelemperî ji gotinên jinan îstifade kiriye.

Heta niha zêdetir li ser rêzkirina gotinên pêşiyên hatine weşandin. Lê di vê xebatê de gotinên pêşiyên hatine şirove kirin û di hêla zargotinê de xebatek taybet e. Bi rastî em

dizanin ku peyvên orjînal di nava gel de derdikeve. Ji bo vê di gotinên pêşiyên de gelek peyvên orjînal cih girtine û nivîskar xwestiye di hêla rêzimanî de şaşiyên sererast bike lê her gotinek bi awayekî ye û li her herêmê cuda hatiye şîrove kirin ya rast ew e ku aheng û wate neyê guherandin. Mînak, *peyvên mirov, meriv, merî, merû, mêr* wateya wan wekî hev in lê nivîsandina peyvên cuda ne (Mazî, 2005: 5-6).

Di ferhengê de; gotinên pêşiyên çî ne û taybetiyên wan bi mînakên ve şîrove kiriye. Ji qalibbûna gotinên pêşiyên re mînak; "şêr şêr e, çî jin eçî mêr e" "çavê li deriya xwelî li seriya". Bi mecazîbûna wan mînak; "*Bi şevê dar û devî bi guh in*". Gelo bira bi şevê guhên dar û deviyên çêdibin? Na. Lê ev gotin mecazî ye. Bi şevê hin mirov ditirsin û ji xwe re guhan ji deviyên re çêdikin û him jî ji ber bêdengiya şevê guhdarîkirina şevê hê pir hêsan e (Mazî, 2005: 11-12)

Di vê ferhengê de ev serenav jî cih girtine;

Mînakên gotinên pêşiyên bi Tirkî li hemberê wan yên Kurdî, Di gotinên pêşiyên de hunera peyvê û wêjeyê, Cudahiya biwêj û gotinên pêşiyên, Di gotinên pêşiyên de peydakirina "ramana bingehîn", Mînakên Biwêjên Tirkî û Li Hember Wan Yên Kurdî, Pirtûka Çiya Mazî û ya A. Balî muqayese kiriye, Wergera Gotinên Pêşiyên Yên Îngîlîzî û Li Hember Wan Yên Kurdî, Mînakên Gotinên Pêşiyên Ji Neteweyên Din. Wekî din Çiya Mazî ji bo gotin û biwêjan baş bîn fêmkirin şiroveyên xwe û yên Qedrî Dêrsilavî û yên Mistefa Reşîd wekî niqaşe beşek cih girtiye (Mazî, 2005: 17-51).

Mînak;

*Kes ji ber malê xwe ne ketî ye şerê me" tu wate tede nîn e. Min ev bihîstî ye "Kesî ji ber malê xwe neda ye kerra, berra" Yanî kesî malê xwe neavêtiye, terka wî nekiriye. ( Q. Dêrsilavî). "An kes ji ber malê xwe neketiye şerê kesî ye. An forma ku em dibêjin dibe gotina pêşiyên jî ev e "Kes ji ber malê xwe nakeve şerê kesî" gotinên pêşiyên jî li gor herêman tene guherandin. ( Ç. Mazî). Ev jî we ya jor, divêt mirov bipirse, ka ji kû hatiye û mebest jê çî ye? Dibe ku bi vê awayî be jî: "Ew li dij me derdikevin, ne ku zirarek gihîştîye malê wan yan tiştêkî wisa, mesele tenê dexsî û hesûdî ye". Lê ev texmîn e, ez rastiya wê nizanim. (M. Reşîd) (Mazî, 2005: 56).*

Mustafa Borak bi navê *Ferhenga Biwêjan* ferhengeke amade kiriye û cara 'ewil di sala 2005an de hatiye çap kirin. Peyre di sala 2014an de bi awayê berfirehkirî û ji aliyê

Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hatiye weşandin. Ferheng bi zimanê Kurdî-Kurdî hatiye çap kirin. Lê, Mustafa Borak di sala 1993an de dest bi vê xebata ferhengê kiriye. Di van heft salên dawî de giraniya dema xwe tenê li ser vê xebatê derbas kiriye. Mixabin di derbare gotinen peşiyên û biwejan de bi taybetî li hêla Bakûr xebat tune bûye. Hin xebat henin lê gelekî qels û tevlihev in. Her çiqas tenê di bin nava "Îdyomên Kurdî" de mînak hatibin dayîn jî lê mixabin ew jî xebateke watedar û bihengam nebûye. Em dikarin bibêjin xebata *Ahmet Cengiz Çamlıbel* a bi navê "Îdyomên Kurdî" di vê hêlê de minakek herî baş e lê mixabin xebatek qels e. Ji ber vê yekê gelek caran di derbarê wateya biwejen de di pirtûk, kovar û rojnameyan de gelek astengî hatine kişandin. Ferheng ji 1005 rûpelan pêk hatiye û bi alfabeya Latînî hatiye nivîsandin. Qasê 12 hezar îdyom(biwêj) cih girtine (Borak, 2005:1-22).

Ev ferhenga biwêjan, di warê xwe de tekane ye. Ferhengên biwêjan ên ku heta niha li Bakûr û Tirkîyeyê hatine çapkirin, hem ji aliyê hecmê ve biçûk bûn û hem jî bi yek zimannebûne. Lê ev ne wisa e, hem ferhengeke biwêjan a berfireh e û hem jî yekzimanî ye. Bi gotineke din li hemberî biwêjên bi Kurmancî bergind an jî raveka wan a bi Kurmancî hatiye dayîn. Li hember her biwêjekê, çend wateyên wê hebin ferq nake, şîroveya wê bi kurmancî hatiye kirin û berginda wê ya bi Kurmancî hatiye dayîn.

Mustafa Borak di pevajo ya ve xebatê de hinek gotin û biwejen Azerî, Êrisî û bi taybetî jî yên Tirkî di çav re derbas kiriye. Di derbare vê yekê de mirov dikare bibêje ku di dinyayê de tu zimanek an jî çandeke ji sedî sed saf û xweser tune ye.

Di ferhengê de ji sedî zêdetir çîrokên biwêjan cih girtine. Ji wan hinek cefen (fabl) in, hinek wekî çîrçîrokan in, hinek jî serpehatiyên rast û kifşin ku hinek ji wan li ku derê û ji aliyê kî ve hatine gotin nav bi nav kifş kiriye û wekî dîpnot nişe kiriye. Mînak;

"Ava sarê, bi ser çî de xwarê?!": Bûka maleke dewlemend ji ber zêdebûn û çetinaya karê malê, xwe li nexweşiyê datîne. Dema ku kes ne li mal be, ji nav ciyên xwe radibe û bi lez ji xwe re hevrişkê çêdike û dixwe. Du re, dev û lêvên xwe paqij dike û dîsa dikeve nav ciyên xwe. Lê ji ber ku têr e û bi rûnî xwariye dilê wê zehf avê dikişîne. Ji ber wî jî zû bi zû evê vedixwe. Dema ku avê vedixwe ji bo ku kes şikê nebê, bi awayekî zelûlî dilorîne û tim wer dibêje: "Ava sarê, bi ser çî de xwarê." (Borak, 2005: 56).

Di ferhengê de hin peyvên cuda di nav biwêjan de hatine bikaranîn û wekî dîpnot hatiye nîşan dayîn. Mînak: "*Agir bi mitêlê ketin*" di vî biwêjê de "*mitêl*" bi wateya "*Lihêf*" hatiye bikaranîn (Borak, 2005: 33).

*Balgî Derxistin*: Li hêla Serhedê dema ku bûkan siwar dikin, pêşbaziyeke hespan li dar dixin. Di wê pêşbaziye de ji siwarên yekemîn re "*balgî derxist*" tê gotin. Siwarê ji xwe bawer balgiyê cihêz ji mala zavê re tîne, hin xelatan jî distîne (Borak, 2005: 68).

Mustafa Borak di amadekirina ferhengê de ji Zana Farqînî, Huseyîn Denîz, A. Balî, Amed Tigrîs, Amet Cengîz Çamlıbel, Celîlê Celîl û Ordixane Celîl, Kovara Hawar, Nûbihar û hwd. îstifade kiriye. Di ferhengê de li ser taybetiyên gotinên pêşiyên û biwêjan rawestiyaye. Cudatiya di navbera gotinên pêşiyên û biwêjan de bi gelek mînakên şîrove kiriye. Ferhenga Mustafa Borak di hêla Folklorê Kurdan de berhemek hêja û taybet e. Ji bo wê jî carinan li ser hinek efsane, dîtin, bawerî, edet, tore, kesayet û cira Kurdan jî agahiyên kurt cih digirin. Wekî mînak: Beran berdan; destê yekî şiv girtin, li ser Newrozê, li ser bext, li ser toreyên şerê 'eşîran, li ser efsane û feraseta zivistane û hwd (Borak, 2005: 12).

Ji herêma Erdîşê bi navê gotinên pêşiyên ên kurdan Meleûsivê Celalî xebatek çêkiriye. Ev xebat di sala 2014an de di nava weşanên Sîtav de û li Stenbolê hatiye weşandin. Ev xebat 223 rûpelan pêk hatiye. Di nav de 1142 gotinên pêşiyên bi Kurdî-Kurdî hatiye nivîsîn û hatiye şîrovekirin. Mînak; Tevn hate daran namîne li waran; Dema ku te dest bi karekî kir çê û xerab wê xelas bibe. (Celalî, 2014:198). Girar xweş e geh mala me geh li mala we; Lazîm e kû mirov bi dû alî bi hev re qencyê bike. Aliyek bike yek jî neke baş nabe (Celalî, 2014: 72).

Mehmet Öncü di sala 1983an de dest bi xebata xwe ya *Ferhenga Biwêjan* kiriye. Di sala 1990an de dest bi qeydkirinê kiriye û di sala 2015an de li Enqerê ji aliyê weşanxaneyê Sîtavê ve hatiye weşandin. Ferheng bi Kurdî-Kurdî û bi alfabeya Lafînî hatiye nivîsîn. Ev xebat ji hevdîtin û hevpeyvînan pêk hatiye. Mehmet Öncü bi salan ked û emek daye ser vê xebatê, wan biwêjên ku di vê berhemê de cih girtine ji gelek kesên zana û şareza guhdarî kiriye û bi rêya qeydkirin û notgirtinê tomar kiriye. Di ferhengê de nêzê 9 hezar biwêj cih girtine û gelek nîşeyên komkirî jî bi awayekî wînda bûne. Nivîskar biwêjan yek bi yek bi mînakên şîrove kiriye. Wek mînak;

*Devê te ne dev e, zirna zer e: Ev biwêj bi şewaza "dev ji zirna zerik berda bi pey qula ebcetê ket" de jî tê bikaranîn. Ev biwêj di wêjeya devkî de bi mehneya; "Tu nikarî tiştên baş bikar bîni, tu ne layiq î karên hêja yî, çi bê serê te heqê te ye" de tê bikaranîn. Weke gelek biwêjên di zargotina Kurdan de, çîrok û serhatiya vê îdyomê jî heye. Dibêjin; rojek ji rojan, kurê mitribekî ji mitribiya xwe hetikî got bavê xwe; "Ez ê dev ji vî karî berdim, biçim medresê li ba meleyekî fêrî xwendinê bibim." Bavê wî got;*



"Kuro, min nehêle bêdahol, gelek dawet û dilanên xweşik li pêşiya me ne..." Kurik di daxwaza xwe de ritmand û got; "Na, ez naxwazim êdî vî karî bikim, min divê ez hînê xwendinê û fêrî ilm bibim, da ku min haya dinyê hebe. " Bavê wî gelek li ber wî gerî, tişt û pere pêşniyara wî kirin lê kurik biryara xwe dabû her digot; "Na". "Bavê wî xelata herî mezin hilanîbû dawiyê, di dilê xwe de digot; "Çare nema, pêwîst e ez pêşniyara mezin ji wî re biki, got; "Lawo, heke tu neçî, ez ê zirna xwe ya zerik bidim te. "Zirna zerik jê re ji kalê wî mabû, ji ber ku kalê wî zirnevanekî binav û deng bû, mîr xilat li wî kiribû, darê wê bi zêr hatibû nexşandin û xemilandin, gelek birûmet û hêja bû. Lê lawik dîsa ji biryara xwe venegerî, got; "Heke tu serê min zêr biiki heta binê lingê min, dîsa jî ez vî karî nakim. "Bavê wî gelek qehirî, ji niva tu rê nemabûn, got; "De here, devê te ne yê zirna zerik e....." (Öncü, 2015:149).

Ev ferheng, xebateke qadî ye û li herêmên Semsûr, Riha, Şirneq, Meletî, Mereş û beşek jê ji li Amedê hatiye komkirin. Berhem ji biwêjên ku li navçe, bajarok, gund û ji navendên van bajaran hatiye berhevkirin. Biwêjên di ferhengê de, li gor agahî û zanînen jêderk û çavkaniyên vê ferhengê hatine ravekirin. Navên dever û tiştên ku li herêman ketine nav biwêjan bi jêrenotan nîşan daye.

*Ser destan bi rê çûyîn: Ketin û hetikîn, bi erdê re xirikîn.*

*Jêrenot:* Ev gotin, ji bo kesên ku pîlanên mezin dike û nikare kêrî bê û di bin de dimîne tê gotin. Dema ku kesek, mezin dileyize û nikare pêk bîne, dixisire, bi qesta; "Ket û gelek hetikî." de, ji bo wî tê gotin ku ; "Li ser destan bi rê çû." (Öncü, 2015:486).

*Çiksayî bûyîn: 'Esman vekirî û bi stêrk e, ewr tune ne, hewa xweş e.*


*Jêrenot:* Ev biwêj rewşa hewayê ya bi şev şanî dide. Dema ku li 'esman ewr tunebin, wê demê tê gotin ku; "Çiksayî ye"(Öncü, 2015:116). Li herêma Serhedê ji bo vê biwêjê "Sayî çik zelal" tê gotin.

*Derdê te nebînim: 1) Ez bimrim, mirina te nebînim 2) Tu bi min gelek 'ezîz î, ez li ber te bimirim ku ez mirina te nebînim.*


*Jêrenot:* Li gorî nîşandayina çavkaniyan ev biwêj di wêjeya devkî ya gel de bi çend sedeman tê gotin; Ji bo 'ezîzê dilê mirov (yarê mirov, kurê mirov, bira an jî mêrê mirov) tê gotin. Kesên kal an jî pîr ji bo xortên malbatê dibêjin. Ji bo xort û ciwanên ku gelek hez ji xwe dikin, tê gotin (Öncü, 2015:136).

Mehemet Oncu bi navê *101 Biwêj- Çîrok* wekê ferhengê tê hesabandin xebatek çêkiriye. Ev xebat di sala 2015an de di nava weşanên Avestayê de û li Stenbolê hatiye

weşandin. Ev xebat 187 rûpelan pêk hatiye. Di navê wê de jî xweya dike kutê de 101 Biwêj- Çîrok bi Kurdî- Kurdî hatiye nivîsîn û hatiye şîrovekirin



*Ji ferhenga Mehemet Oncu(101 Biwêj- Çîrok) rûpelek mînak.*



*Ji ferhenga Mehemet Oncu(101 Biwêj- Çîrok) rûpelek mînak.*

*Ferhenga Kurdî- Kurdî ya M.Emin Bozarslan heta niha du cîld hatiye çap kirin. Cilda pêşîn ji tîpa "A" yê heta tîpa "D" yê ye. Ev ferheng di sala 2011an de li Stenbolê û ji aliyê Weşanxaneyê Dengê ve hatiye weşandin. Ferheng ji 795 rûpelan pêk hatiye. Ev ferheng di demek gelek dirêj de hatiye çêkirin. Emin Bozarslan, di sala 2001an de dest bi amadekirina vê ferhengê kiriye. Ji bo armanca ferhengê wiha dibijê;*

*Me du amanc û daxwazên sereke dan ber xwe. Yek ji wan amanc û daxwazên me ew bû û nuha ji ew e, em ferhengeka fire û têrnaverok, bi awa û metodên zanyari binivîsin, amade bikin û bigihinin destê gelê Kurd. Amanc û daxwaza me ya di ji ew bû û nuha ji ew e ku, em peyvikên Kurdî yê heyi bîdî nasî û maneyên wan ên ferhengî û idyomî û termî gişt bîdî zanî. Yanî peyvikên Kurdî yê ku di Kurdiya Bakur da hene û ji aliyê gelê Kurd ve bi kar tên anî yan di edebiyata Kurdî ya klasîk û folklorî Kurdî da ci girtîne, amanc û daxwaza me ew bû û ew e ku em wan bîdî nasî û maneyên wan digel awayên karanîna wan bîdî zanî (Bozarslan, M.Emin, 2011: 41).*

Ferheng bi alfabeya Latînî hatiye çêkirin û M.Emin Bozarslan wekî alfabeya Latînî ya Tirkî nivîsiye. Nivîskar di amadekirina ferhengê de peyvan li gor sê jêderan berhev kirî û bicîh kirî.

- 1- Awayê bi karanîna piraniya gelê Kurd.
- 2- Edebiyata Kurdî ya klasîk.
- 3- Folklorî Kurdî.

M.Emin Bozarslan di ferhengê de dibê ku kokên gelek peyvên Kurdî û Farsişî digêjin zimanê Pehlewî. Gelek peyv ji zimanê Pehlewî mane û gihane zimanên Kurdî û Farsişî. Peyvên wisa henî ku di Kurdî û Farsişî de wekî hev in.

Wek "reng", "jêr", "par", "azad", "dest", "ser", "yek", "deh", "sed" û hwd. Hin peyv henî piçek guherîne, Wek Kurdî de "şev" Farsişî de "şeb", Kurdî de "didan" Farsişî de "dedan", Kurdî de "lêv" Farsişî de "leb", Kurdî de "nav" Farsişî de "nam", Kurdî de "ziman" Farsişî de "zeban", Kurdî de "nimêj" Farsişî de "nemaz", Kurdî de "roj" Farsişî de "rûz" û hwd. Hin peyv jî hene di pehlewî û Kurdî de wekî hev in li di Farsişî de piçek guherîne. Wek "xweş" di Kurdî û Pehlewî de minî hev in lê di Farsişî de bûye "xoş". Hin peyv jî hene di pehlewî û Farsişî de wekî hev in li di Kurdî de piçek guherîne. Wek "men" di Farsişî û Pehlewî de minî hev in lê di Kurdî de bûye "min" (Bozarslan, M.Emin, 2011:7).

Cîlda diduyan ya Ferehenga Kurdî- Kurdî a M.Emin Bozarslan di sala 2015an de hatiye çapkirin. Cîlda diduyan ji tîpa "E" yê heta tîpa "K" yê ye. Ev ferheng di sala 2015an de li Stenbolê û ji aliyê weşanxaneyê *Dengêve* hatiye weşandin. Ferheng ji 950 rûpelan pêk hatiye. Di cîlda pêşîn de şaşitiyê ku hatine kirin di dawîya cîlda diduyan de bi rastiya wî ve hatiye nivîsîn (Bozarslan, M.Emin, 2011:7).

### 2.1.2. Kurdî- Tirkî / Tirkî- Kurdî

*Evliya Çelebî* di sed sala 17an de, di sala 1655an de li herêmên (Bağdad, Basra, Bitlis, Diyarbakır, İsfahan, Malatya, Mardin, Musul Tebrîz, Van) derketiye gerê û tiştê ku dîtiye yan jî seh kiriye nivîsiye. Ger û maceraya yê Kurd dijîn, di berhema *Seyhatnameyê*, di cilda 4. û 5an de cih girtiye. Evliya Çelebî lîsteya peyvên Kurdî kom kiriye. Lîsteya peyvên ku ji aliye Evliya Çelebî ve hatiye amade kirin di warê zimannasiya dîrokî ya Kurdî de ya herî balkêş e. (Dağlı, Yücel; Kahraman, Seyit Ali.r:1-451: cilt:4 *Günümüz Türkçesi Evliya Çelebi Seyahatnâmesi*). Ev xebat bê guman di sed sala 17an de çavkaniyek herî girîng e û bala gelek zimannasan kişandiye. Li ser peyvên Kurdî xebata herî pêşî tê zanîn. Lîsteya peyvên li gor çend zaravayan hatine nivîsîn. ( Martîn Van Bruinessen di nivîsa xwe ya *Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt lehçeleri üzerine Evliya Çelebinin Notları* de çend mînak wiha nîşe kiriye.

#### Zaravayê Sorani

Av: su –Garz: ave (açıktır ki burada yalın halde değil isim takısı almıştır: avê);Ziya: (ÜI) (av); W&E: aw.

Bezi: koyun- Garz. : paz (pez); Ki. : pass (pez); Ber.: poz (poz); Jaba: pez (pez); W&E: pez.

Bizen: keçi-Garz: bzn (bizin); Ki. : bissinn (bizin); diğer bütün kirmancî lehçelerinde de aynıdır; W&E: biz "keçi", bizin "dişi keçi".

Bîn: getiri - Ber. : bina (bina); Jaba: bine (bine), birçok kuzey lehçesinde aynıdır; güney lehçelerinde, bibe (birdin).

Çar: dört - bütün lehçelerde aynıdır.

Çendek: bazı (Evliya tarafından tam karşılığı verilmemiştir) - Jaba: tchendeki (çendekî). Karş. Garz. : cian (çen), "ne kadar"; Ziya çend; W&E: chende (çendi)- "bazı".

Dazde: oniki – Garz: duanzdah (duwanzdeh); Ziya: (dwazde); Jaba: devazde (diwazde); Rhea: danzdah (danzdeh); W&E: dûwanze (Martin Van Bruinessen, 1985: 23).

Peyv û biwêjên din (ji zaravayên cuda)

Alişan: şanlı, muhteşem (Cizre ve Bitlis'in kürt beylerine (xan)Osmanlı sultanları tarafından verilen ünvanıdır).

Baran: baran dibarê "yağmur yağıyor" – Bütün lehçelerde

Bejnik: boyun" (muhtemelen. bejn "endam, boy"ın küçültme ekialmış şeklidir) Garı.  
: bezn (bejn); Ziya: (bejn); Jaba: bejin; W&E: bejn.


Berdan: berdanê, salıvermişler - Ziya: (berdan)Jaba:berdan; W&E:ber dan.

Çarik: şal (Evliya "kuşak" olarak çevirir) - Garı. : ciark (çarik)"bayan şalı veya pelerini"; Jaba: tcharik (çarik)- "turban, başörtüsü"; W&E:çaroke-"şal !\_ka\_?ınların ~muzlarına doladıkları ve alt bölümü bir şeyler taşımak için kullanılan ortu)". Bahdınan'da, çarok W&E'nin sözünü ettikleri şal anlamındakullanılır; diğer kuzey kelime listelerinde bu kelimeye rastlanmaz.

Dari: karanlık, koyu - Bütün Kirmanci kelime listelerinde sadece tari(W&E:tarik) bulunur; ancak bazı lehçelerde /t/ çok güçlüdür.

Dur: uzak - bütün lehçelerde aynıdır.

Eman: insaf, aman, rahmet, magfîret - Ziya: (eman)- "insaf, aman dilemek"; Jaba: eman; W&E: eman, aman - "imdat, insaf!" (Martin van Bruinessen, 1985: 27).



*Ji seyhatnâmeya Evliya Çelebî mînak r: 407 cilt: 4*

Dördüncü Kitap

tahuk kızak	hiyot çadırlar	Çuma Cızırı Cizre şehri'ne vardım.
Kelek berdani Gemileri koyvermişler.		Bu çıye gelendu ta hore Niçin böyle ettin bana.
İrâ du rûje mekân-ı dâre Bugün iki gündür ki evinden uzaktır.		I şev çe şeve şevege dâri Bu gece ne gecedir ki böyle karanlıktır.
Bârândi bâri Ve yağmur yağar.		Şev hi hâciyân Hacılar gecesinde.
Bejnik zirâve hâl halite İnce boynunda benleri.		Gevher dâ gûhan Kulağında iki küpe.

Bu gibi nice bin sözleri vardır ki bu kadarca yazılıp yetinildi. [219b]

**Van kavminin dilleri:** Bu kavmin aralarında kullanılan bir çeşit özel lehçeleri var ki bir diyar diline benzemez. Evvelâ,

pisih kedi	bihiri ocak	geven diken çalı	hepan sarplık
göyündermişem yakmışım		Bacıma bir baş varam. Kız karındaşıma bir kerre varayım.	
Heleşî gelişî edeyim. Gülelim, oynayalım.		Haradaydın? Nereye vardın?	
Germede çimdîm. Hamamda yaykandım.		Şâd bayem ya'nî, "Sen ve maldarım"	
Kûzeyî apargîlen. Bardağı getirsene.		Bes çaş çağı olupdur. Belî kuşluk tâ'âmî vakti olmuşdur.	

Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahatnâmesi

pirpütür par can acısından kendini yere vurmuş	diğ diğde hatik çömlekele kaynayan bulğur aş
rahiz veba	pöşk gölmek
sarik sırım bir şeye lazım olmayan deri parçası	mütte'î şitih çiban çıkarmış
calaz zayıf	palas poh parça parça olmuş esvap
lanaf hamur	kenâr-ı hoğa hırkut-vâr tandır kenarında ufak odun gibi
rubar yüz be yüze	hiilverik-hey'et kara koncoloz surath
bu şekkale bu şekil ile	aceblos acayıp şekil
Koma şortik-veş hangal ile iğ üzerine sarılan pembe ve elde dolanan iplikdir	
şaran tesbih gibi dizilmiş şey	cincil salıncak
cimür ovalanmış	tanba lozum küçücüğim, canım
sil gun kırmızı boya	cellur küçük çömlek
şinpuri sahipsiz şeydir	lanbak götürgü
kuksengi dügüne [gelen] saçdır	lepak bayram cemali
lolo cürcan (---) (---)	
hurnikotli burnu sümüklü	
kohik gelin duvağı	
tıgrik evlâd doğdukda olan düğündür	
hoçurkan dügün okuyucusu demektir	

Bitlis halkının bu yazılan özel lehçelerinden başka binlerce kelimeleri vardır ama bu kadarı yeter.

*Ji seyahatnâmeya Evliya Çelebi mînak r: 80 cilt:4*

Ferhenga Musa Anter bi Kurdî-Tirkî di sala 1967an de li Stenbolê hatiye çapkirin. Musa Anter di sala 1963an de li Enqerê di bendexana Mamakê ya leşkerî hucreya ‘I’yê de dest bi nivîsîna vê ferhengê kiriye. Di rêzkirina vê ferhengê de hevalekî wî ji Hewlêrê Cemal Alemdar alikariya wî kiriye. Gelek di zorî, nexweşî û şertên dijwariyê de nivîsiye. Ferheng ji 11 hezar peyvên pêk hatiye. Di pêşgotina ferhengê de behsa astengiya xwe kiriye:

*“Gelekî di zorî, ne xweşî û tuneye da min ev ferheng nivîsî. Li ber çawa ferhengek kevn nînbû û bi serda jî ez de bendexanê, qul û qulêra da bûm. Ji ber vê yeke, wê kêmaî û ne li rêyê min hebin. Ji xwe ferheng, bi jînêra dighin û distewin. Ev ferhengêd xelkê î pêşda, 10-15 caran hatine çapkirin û de her carê da kêmaî û ne li rêzî û ne li rêyên wan, rast kirine. Go ez mam sax, yan xwedîyêddin, hey bi caran ji nûda emê vê ferhengê çap bikin. Wekîdin ez bahwer dikim ku ev ferheng, ji welatîyên min î Tirkîyê ra sûde (fêdeye). Ji nêzik va zanim go bi milyona velatî ji ber go ji zimanêhev nizanin, bir kulin. Bi vê ferhengê û bi pey vê da a go ezê çap bikim (Ferhenga Tirkî- Khurdî) go piçkokî kulêd wan sivik bibin, ezê pir baxtiyar bibim. Zanînekî vekirîye go mirov bi zarê hev nizanibin hînê hev nabin.”*  
(Anter, 1967: 4).

Ferheng ji 176 rûpelan pêk hatiye û bi alfabeya Latînî hatiye nivîsîn. Ji bo ferheng were xwendin di derbarê alfabeyên Kurdî de dawiya ferhengê de agahî hatiye dayîn.

Em ê li jêr hin peyvên ku di ferhengê de cih girtine û li herêma Serhedê di nava gel de çawa tê gotin, herwiha çend peyvên xerîb bidin berhev.

**Bafik:** *Bahane, sebep* (Anter, 1967: 12). Li Serhedê *"hêncet"* jî tê gotin.

**Bac:** *Vergi, haraç, rüsum* (Anter, 1967: 11).

**Bavêxûnt:** *Gelinin bir hafta sonra babasının evini ziyareti* (Anter, 1967: 13). Di nava gel de bi gelemperî li gundên Serhedê ku em geriyar *"zeyî"* tê gotin.

**Berbû:** *Gelin alayı* (Anter, 1967: 16).

**Berkanî:** *Taş atan sapan* (Anter, 1967: 17). Di nava gel de bi gelemperî li gundên Serhedê ku em geriyar *"kevkanî"* tê gotin.



**Derşo:** *Lavabo* (Anter, 1967: 41). Di nava gel de gelemperî “*serşo*” an jî “*destşo*” tê gotin.

**Firk:** *Seyrek* (Anter, 1967: 52). Li Serhedê ev peyv wekî eş li tişteki bikeve tê gotin. Mînak; “*Firk*” li genim ketî.

**Gellê:** *Hıristiyan kürtlerinde erkek adı* (Anter, 1967: 54).

**Gezî, gezik:** *Süpürge* (Anter, 1967: 56). Li Serhedê ji bo vê peyvê bi gelemperî “*sivnik*” tê gotin.

**Heftok:** *Taşla oynanan bir oyun. Beştaş* (Anter, 1967: 61). Di nava gel de gelemperî *pêncok* tê gotin.

**Kade:** *Bir çeşit Kürt böreği* (Anter, 1967: 95). Li Serhedê “*kade*” an jî “*kilor*” tê gotin. *Kilor* ji nanê ku qul qulî re jî tê gotin.

**Kevnar:** *eskimiş* (Anter, 1967: 98).

**Lewitandin(lewt):** *kirletmek* (Anter, 1967: 78).

**Mêt:** *emme; mêtin: emmek* (Anter, 1967: 85).

**Mijandin:** êcar ji bo ajalan mijandin tê gotin. Başkasının sırtından kanunusuz kazanç elde etmek.

**Şilor:** *bir nevi erik* (Anter, 1967: 136).

**Tinoke:** *damla* (Anter, 1967: 144). Li Serhedê bigelemperî “*dilop*” tê gotin.

**Xwelîser:** *kül başlı.* (Anter, 1967: 156). Ev peyv bi rastî di nava gel de ji bo ku mirov bi karekî sernekeve *xwelî+li+serê+te* tê gotin.

**Mûşê:** *Muş ilimiz.* (Anter, 1967: 88).

**Navnotî:** *dile düşürme.* (Anter, 1967: 89).

**Mûshaf:** *Kur'an.* (Anter, 1967: 88).

Di ferhengê de herfekî bi "kh" hatiye nivîsîn. Wek mînak; Khoçertî: Göçebelik (Anter, 1967: 74)



## KH

- Kha** — Hani, nerede, ver.  
**Khabox** — Su tutan kuvvetli zira-  
at arazisi.  
**Khab** — Diz.  
**Khabreş** — Kürtlerde erkek adı.  
**Khafir** — Kâfir.  
**Khaxiz** — Kâğıt.  
**Khahrebî** — Lüks lâmbası.  
**Khahta** — Bugünkü Adıyaman ili.  
**Khaû** — Marul.  
**Khaijin** — Geviş.  
**Khaijinkirin** — Gevelemek.  
**Khajin** — Geviş getirmek.  
**Khak** — Yumak.  
**Khal** — Kelek, olmamış, ham.  
**Khalbûn** — Hamlaşmak.  
**Khalkirin** — Hamlaştırmak.  
**Khaltî** — Hamlık.  
**Khalik** — Karpuz.  
**Khalik** — Bir nevi çarık.  
**Khalike** — Bışeri'de bir köy.  
**Khalin** — İneleme, meleme.  
**Khalkal** — Koyun sesi.  
**Khamar** — Elek veya defin etra-  
fındaki çenber.  
**Khamaş** — Bir nevi fena tütün.  
**Khamaşî** — Sert ve fena olan bu  
tütünden.  
**Khamaşqelén** — İyiye kötüye bak-  
madan çok sigara içen kimse.  
**Khamax** — Mahv, bozuk.  
**Khamaxbûn** — Mahvolmak.  
**Khamaxkirin** — Mahvetmek.  
**Khamaxtı** — Mahfiyet.  
**Khambax** — Berbat.  
**Khamûran** — Mamur.  
**Khamûrani** — Düzen.  
**Khar** — İş.  
**Khar** — Maden, tuz, kömür vesai-  
re ocakları.  
**Khar** — Kazanç.  
**Kharbar** — Hazırlık.  
**Kharbarkirin** — Hazırlık yapmak.  
**Kharger** — Ticarethane.  
**Kharkar** — Gevaş'ta bir köy.  
**Kharker** — İşçi.  
**Kharkirin** — İş yapmak. Başkası-  
nı iş veya sefere hazırlamak.  
**Kharik** — Ot ve meşe yaprağı de-  
meti.  
**Kharok** — Demir madeni, cevneri.  
**Kharsaz** — İş adamı.  
**Kharsazî** — Tesis, kuruluş.  
**Khartik** — Eye.  
**Khartmük** — Sarı bir çiçek (aynül  
bakar).  
**Kharûbar** — Hazırlık.  
**Kharxane** — Fabrika.  
**Kharxani** — Fabrikasyon.  
**Kharxanker** — Fabrikatör.  
**Kharvan** — İşçi, fabrika işçisi.  
**Kharvan** — Oğlak çobanı.  
**Khasik** — Topraktan tas.  
**Khaş** — Yokuş.  
**Khaşkirin** — Dağa bırakmak.  
**Khaşo** — Jokey oyununun sopası.  
**Khat** — Dal.  
**Khatar** — Horoz ibiği.

*Ferhenga Torî (Mehmet Kemal Işık)* bi Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî di sala 1992an de li Stenbolê ji aliyê Weşanên Koral ve hatiye weşandin. Bi alfabeya Latînî hatiye nivîsandin, ji 496 rûpelan û 16500 peyvên pêk hatiye. Peyre di sala 1999an de li Stenbolê û ji aliyê Weşanên Berfînê ve tê çapkirin. Ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de bi Kurdî-Tirkî ji 12800 peyv, di beşa duyem de jî Tirkî-Kurdî ji 12400 peyv cih digirin. Di beşa sêyem de ji aliyê zayendî ve li ser kişandina lêkeran rawestiyaye. Ferheng ji 615 rûpelan pêk hatiye. Mehmet Kemal Işık di berhevkerina peyvên de ji kilam û stranên Miradê Kine gelek îstifade kiriye.

(Torî, 1992:4-7; Akin, 2013: 62; Chyet, 2003: XIV).

*Ferhenga Hiqûqî ya Tirkî- Kurdî*, ferhengeke peyvên dadnasî/hiqûqî ya bi qebareyeke biçûk û 175 rûpelî ye. Ev ferheng ji aliyê parêzer Hüseyin Özdemir ve hatiye amadekirin. Di amadekirina ferhengê de keda bi bernavê Keremo (Kerem Tekoğlu) û bi bernavê Miraz Ronî (Mulazim Özcan) jî çêbûye. Peyvên Tirkî di ferhengê de hatine rêzkirin û ew li Kurdî (Kurmançî) hatine wergerandin. Ferheng di sala 2014an de ji aliyê Weşanên Belge ve derketiye. Hüseyin Özdemir û Miraz Ronî kurtepêşgotinek bi Tirkî ji ferhengê re nivîsîne. Keremo jî bi Kurdî kurtepêşgotinek di ferhengê de nivîsiye. Hüseyin Özdemir di pêşgotina xwe de ferheng bi armanca ku alikariya parêzeran bike ku heq û hiqûq û wezîfeyên miwekilên xwe bi zimanê wan baştir bi wan bidin fêmkirin ku heqê wan neyê xwarin. Ferheng bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn..

Çend ferhengên huquqî li ser înternetê hatine weşandin. Ji wan yek jî ferhenga têgehên hiqûqî ya Tirkî- Kurdî ye. Xebata pola asta mamostetiyê ye û di sala 2011an de ji aliyê Sezgin Dinç ve hatiye amadekirin. Ferheng ji 17 rûpelan pêk hatiye ji ber vî yekî wekî ferhengok tê zanîn û ji 1350 peyvên pêk hatiye. Ferheng li Amedê bi alikariya Kurdî- Derê ve hatiye weşandin û bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn.

Di sala 2014an de ferhenga Kurdî- Tirkî/ Tirkî- Kurdî ji aliyê Fevzi Karademir, Nezir Gûmûş, Ziver İlhan û Ahmet Korkut ve hatiye çêkirin. Di beşa Kurdî- Tirkî de 13.603 peyv, di beşa Tirkî-Kurdî de jî 12.354 peyv hene û 636 rûpelan pêk hatiye. Li Enqerê û ji aliyê Weşanên Saziya Zimanê Tirkî (TDK) ve tê çapkirin. Di hîlbijartina peyvên Kurdî de, ji gelek çavkaniyên devkî û nivîskî sûd hatiye wergirtin û çavkaniyên ku sûd jê hatine wergirtin li dawiya ferhengê de hatine nîşankirin. Di mijara bijartinên rastnivîsînê de bi gelemperî ji berhema Malmîsanîj a bi navê *Ji Bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî- Tirkî* îstifade kirine. Armanca amadekirina ferhengê ew e ku; fêmkirina herdu

zimanan û dewlemendiya çandî ya Tirkîyeyê hêsan bike. Herwiha, hewcedariya çavkaniya ferhengî ya dersa Kurdî ya bijarte pêk bîne. Ji ber vê yekê peyvên ku di ferhengê de cih girtine, li gor vê armancê hatine hilbijartin. Bi rêbaza pêvekîrin û servekîrinê, hin peyv li gor bikaranîna Kurdî hatine çêkirin (Ferhenga Saziya Zimanê Tirkî (TDK), 2014: 1-10).

Ji bo ku ferheng bi rehetî were bikaranîn, ne hemû wateyên peyvan, lê belê wateyên ku zêde dertên pêşhatine nivîsîn. Bi heman mebestê, dema ku wateyên peyvan hatiye dayîn, ne ji bo hemû peyvan; lê belê peyvên ku bi zehmetî têne fêmkirin wateya wan hatiye dayîn.

Wekî mînak:

*Afir (is): Yemlik. Hayvanları yemlemek için içine yem konulan genellikle kanal biçiminde yer veya kab. (Ferhenga Saziya Zimanê Tirkî(TDK), 2014: 15).*

*Salıs (is): Kutup. Elektrik akımını oluşturan gerilim ayrılığının en yüksek dereceyi bulduğu iki noktadan her biri (Ferhenga Saziya Zimanê Tirkî(TDK), 2014: 259).*

Ferhenga *D.Îzolî*(Hüseyin Yıldız) pêşî di sala 1987an de hatiye çapkirin. Lê xebata *Îzolî* ya li ser ferhengê gelek kûr û dirêj e, digêhêje heta sala 1962an. Ferhenga *Îzolî* ya rastkirî û berfirehkirî jî di sala 1992an de ji aliyê Weşanên Dengê ve hatiye weşandin. Di pêşgotina ferhengê de heyfa xwe li çî aniyê wiha nîşe kiriye:

*“Ev ferheng, di roja îro de gavek e, gava duduyan e. Bi awakî din ava bûye. Armanca xwe ev e ko bêjeyan çêtir bisenîfîne û helbijêrîne û zanistî bike. Lê dîsa jî şermezarî li ser me ranake. Herweha ev jî Kurdî-Tirkî ye. Evîniya dile min ev bû ko bi tenê Kurdî ev rûpelên hanê tijî bibûwana. Hêvî û daxwaza min ev e ko di rojên pêşhatî de zimanzaneke hemwelatîyê min gava sisiyan bavêje û bi Kurdî-Kurdî ferhengeke pêk bîn.” (Îzolî, 1991: 8- 9).*

Hin peyv henin di lîteratura ziman de cih girtine lazim nîne ku were guhirandin an jî peyvek taze were çêkirin. Ji bo vê di ferhengê de hin peyv gelemperî henin ku t'ema ziman nade. Minak; Dersdar: Profesör, yüksekokul öğretmenî. 3. Hoca, din öğretmenî.

Ji ferhenga *Îzolî* çend mînak û muqayesekirina wan;

Bac: Vergi, haraç.1. gelin götürülürken kapıda alınan bahşiş 2.ayakbastı parası. Bac û xerac vergi ve haracın genel adı (Îzolî, 1991: 45). Wexta ku aliyê zava tên bûkê dibin yek xwe dide piştderî an jî ser sandoqê û piştderî dixwazin.

Eywan: Çardak, Salon, büyük geniş oda (Îzolî, 1991: 203).

Berê peyva *eywan* ji bo ku cihê aş û zexîrên xwe datanîn dihat gotin. Niha *kiler* tê gotin. Li hin cihan *eywan* ji bo *sî* yê jî tê gotin.

Firîk: Nokên xav.

Gezî, gezik: Süpürge (Îzolî, 1991:234). Li Serhedê gelemperî *sivnik* tê gotin.

Reşbelek: Bir tür Kürt dansı (Îzolî, 1991: 525). Li hinek ciyan Cergebez jî tê gotin.

Divêk: Ev ödevi (talebe için) (Îzolî, 1991: 180)

Köse: hurim, kose (Îzolî, 1991: 923). Di ferhenga Nûbihara Biçûkan de wek "ruwal" derbas dibe.

Di naveroka ferhengê de nêzê 30 hezar bêjeyên Kurdî û nêzê 25 hezar bêjeyên Tirkî hene; girîngiya vê xebatê ew e ku lêkolîn li ser dîgelên dinyayê û rêzimanî hatiye kirin.

D.Îzolî dibêje; di amadekirina vê ferhengê de ez fêrî tiştêkî bûm: “ferheng çêkirin asan e, lê ne bi merivekî.” “Mirov ew e ko ‘mezinahî’ re çavnebarî neke, lê ‘mezinahî’yê ji xwe re armanc bigire (Îzolî, 1991: 8).

Wekî Îzolî ferheng çêkirin ne bi kesekî çêdibe, lazim e ku bi komîsyonan were çêkirin. Di pêşgotinê de Kemal Burkay, behsa wan xebatên ferhengan dike ku li kîjan heremê û ji aliyê kî ve hatiye kirin dike:

*“Bi ferhenga Îzolî, cara pêşîn e ku, bi Kurdî-Tirkî û Tirkî-Kurdî ferhengeke baş der tê. Di beşa Kurdî-Tirkî da qasî 30.000 bêje û 4.000 biwejên Kurdî (idiom û wekî wan), di beşa Tirkî-Kurdî da jî 25.000 bêje cî digre. Bi aliye sistematîk jî Îzolî xwe gelek westandîye, cinsî nêr û mê ji bo navan û beşên gotinan (wekî lêker, nav, cînav, rengdêr û hwd...) nişan daye. Ev ferheng ji bo Kurdên Tirkiyê hewcedarîyek gelek mezin bû û Îzolî bi vê xebatê, şik tune karekî hêja kiri ye. Cara pêşîn di sala 1987 da bi deste nivîskar û gor îmkanên xwe 500 hev çap bûn û zû xilas bû. Nuha bi nivîsandin û şikleke çêtir ji nuh va çap dibe. Îzolî ji bo çapa nu li ser ferhengê xebitiye û ew firehtir kiriye (Burkay, 1991: 6).*

Ferheng bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn. Ferhenga Îzolî gelek berfireh e û di zimanê Kurdî bi zaravayê Kurmancî de ger nivîs be ger axaftin be jê gelek tê îstifade kirin.

Ferhenga Mehmet Tanrîkulu di sala 2002an de li Stockholmê, ji aliyê Weşanên Podîum ve bi hevkarîya pirtûkxaneyê Kurdî ya Stockholmê derketiye. Tanrîkulu nêzê bîst sal li ser ferhengê xebitiye. Ferheng bi Tirkî-Kurdî hatiye nivîsandin, ji 520 rûpelan û 23 hezar peyvên pêk hatiye. Tanrîkulu gelek çavkaniyên baş bi kar anîye. Lê hin çavkaniyan yê têkiliya wan bi zimanê Kurdî re kêr jî bikar anîye. Wek: Ferhenga Etîmolojîyê ya Hindo-Cermenî (Indogermanisches Etymologisches Wörterbuch). Bêguman ferheng bi awayekê wa sivik jî dibe. Lê, li aliyê din, daner ta etîmolojî û serekaniya peyvên jî lê zêde kiriye û bikaranîna wê jî bo xwendavanan dijwar bûye (Akin, 2013: 64).

Ferhenga Tirkî-Kurdî a Zana Farqînî di sala 2000an de li Stenbolê hatiye weşandin. Ev ferheng jî aliyê Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hatiye weşandin. Di pêşekê de:

*Berîya her tiştî li gor bawerîya me ev ferheng bersîveke biçûk e, ji wan kesan re ku ji ber hîrs û ihtîrasên xwe neheqiyê li vî zimanê nazîk dîkin. Gelê me yê ku ji vî ferhengê sûdê wergire heye ku bipirse, “Çîma gelo pêşî beşa Tirkî-Kurdî?” ji ber gelek sedeman me ev bîryara wîha da. Lê du sedemên bîngêhîn hene. A pêşî jî bo ku wext li me teng nebe, em bikaribin gelek peyvên din di wê navê re peyda bikin û ferhenga Kurdî zengîntir bikin. Sedema din jî, rewşa civaka me ye. Bi salan e ku gelê me hatiye bişavtin. Ji ber sedemên ku têne zanîn, beşeke girîng ji gele me zimanê xwe jî bîr kiriye. Ên ku zimanê xwe jî bîr nekiribin jî, gelek peyv jî bîr kirine, an jî gelek peyvên Tirkî dizanin lê wetaya wan a Kurdî nizanin. Wekî ku me got hejmara wan kesên wîha pîr zêde ye û pêwîstiyê bi ferhenga Tirkî-Kurdî dibînin. Daxwaza hînkirina zimanê Kurdî jî bo vî beşe daxwazeke serekeye. Em di nav têkilîyan de baş pê hisîyan ku, jî bo kesên ku dixwazin zimanê xwe hîn bibin girîngî bi ferhengeke wîha dibin. Peyvên ku di ferhengê de cih girtine, ji sedî nod û neh bi zaravayê Kurmancî ne. Ji zaravayê Kirmankî (Zazakî) û soranî pîr hindik peyv tê de hene (Farqînî, 2000: 7-8).*

Piştî herdu ferhengên mezin ên Tirkî-Kurdî û Kurdî-Tirkî, îcar ferhengeke navincî bi Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî amade kiriye. Çapa yekem di sala 2007an de ji aliyê Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve li çapxana Berdanê hatiye weşandin. Di beşa Kurdî-Tirkî ya ferhengê de 29.600 bêje û 10.500 jî berdewamiya bêjeyan cih girtine. Ferheng gelek

caran hatiye çapkirin. Çapa dawî di sala 2013an de hatiye weşandin û 2132 rûpelan pêk hatiye. Ferheng bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn.

*Ferhenga Çapameniya Kurdî* bi Kurdî- Tirkî di sala 2009an de ji aliye Osman Aslanoğlu ve hatiye amade kirin. Nêzê 830 peyv tê de cih girtine û 328 rûpelan pêk hatiye. Aslanoğlu van peyvên ji bo çêtir bê fehmkirin di nava hevokan de bi kar aniye (Aslanoğlu, 2009: 2). Di ferhengê de her peyv di nava hevokan de hatiye bi kar anîn. Hevok bi Kurdî û Tirkî hatine nivîsîn. Li gor minakan jî xuya dike, mixabin hin peyvên ku di nava gel de tê bi kar anîn bi wek Tirkî hatiye fikirîn û bi wî awayî hatine nivîsîn. Kêmasiyek din jî navê ferhengê Ferhenga Çapamenî ye lê zêdetir peyvên din cih girtine. Çend Mînak;

**Avahî: Bina**

*K- Çêkirina avahiya şaredariya me, berdewam dike.*

*T- Belediye binamızın yapımı devam ediyor.*

**Bajarok: Belde**

*K- Ji bajarên piçûk re bajarok têgotin.*

*T- Küçük şehirlere belde denilir.*

**Balyozxane: Elçilik, Büyükelçilik**

*K- Li Hewlêrê Balyozxaneya Îranê hate vekirin.*

*T- Hewlêr'de İran Elçiliği açıldı.*

**Binesazî: Altyapı**

*K- Li van taxan, binesazî bi giştî wêran bû.*

*T- Bu mahallelerde altyapı, tamamen harap oldu.*

**Xwendina bilind: Yüksek Öğrenim**

*K- Paşê ji bo xwendina bilind, diçe Agiriyê.*

*T- Sonra Yüksek Lisans Öğrenim için Ağrı'ya gider (Aslanoğlu, 2009: 13, 15, 17, 47, 272).*

Ferhenga bi navê *Ji bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî(Kurmancî)-Tirkî*, di sala 2012an de li Stenbolê hatiye weşandin. Xebata vê ferhengê bi rêveberî û kordînyasyona Malmîsanij ve dest pê kiriye. Ligel amedekarê weşanê M.Malmîsanij, beşdarên xebata hîlbijartina bêjeyên kurmancî yên serekeev in: Mistefa Aydoğan, Zana Farqînî, Newzat Hîrorî, Huseyîn Kartal, Remzî Kerîm, Mahmud Lewendî, M.Emîn Narozî, Reşo Zîlan. Li

Weşanxaneyaya Rûpelêhatiye weşandin. (Malmîsanij, 2012: 4-8). Armanca ferhengê bi taybetî xizmeta zimanê standart yê nivîskî ye. Ferheng ji bo pirsgirêkên nivîsê û bitaybetî jî wergerên *Le Monde Diplomatique Kurdîyê* ye, ku hewcedarên van tiştan in û van herdu pêşniyazan minasib dîtine.

*Armanca bingehîn ya vê ferhengê, pêşkêşkirina hemû varyantên tesbîtkirî yên bêjeyên pirvaryant yên kurmançiyê ye û ji bo zimanê nivîskî dîyarkirina varyanta sereke ye. Loma bêjeyên yekvaryant di vê ferhengê de nehatine nivîsîn. Bo nimûne, di kurmançiyê de varyanteka din ya bêjeya "dest"î tune ye, ango bi tenê "dest" tê gotin; loma ev bêje nehat nivîsîn. Ev ferheng, hem ji ber vê yekê hem jî ji ber ku varyantên bêjeyan di cihekî de, bi hev re pêşkêş dîke, ji ferhengên kurmançî yên din cihê ye û wisa hatiye amadekirin ku xwendevan dikare wekî rêbera rastnivîsînê jî jê sûdê werbigire (Malmîsanij, 2012: 22).*

Ferheng bi alfabeya Latîni hatiye nivîsîn û bi qasê 20 hezar peyv tê de cih girtine. Ferheng ji 307 rûpelan pêk hatiye.

Ji bo hîlbijartina bêjeyên sereke bala xwe dane ser van pîvanan:

- a) *Ji van varyantan kîjan di kurmançiyê de zêdetir tê bikaranîn?*
- b) *Kîjan ji wan deforme nebûye, yan jî kêmtir deforme bûye?*
- c) *Kîjan ji wan di zaravayên din yên kurdîyê de tê bikaranîn yan jî nêzikî bêjeya wan e?*
- ç) *Kîjan ji wan, zêdetir nêzikî bêjeya zimanên din yên îranî?*
- d) *Kîjan ji wan, zêdetir nêzikî bêjeya zimanên din yên hindoewropayî?*
- e) *Heke bêje ji zimanên biyanî ketibe nav kurmançiyê, kîjan ji wan varyantan zêdetir nêzikî taybetmendiyên kurmançiyê, yan jî bi giştî zimanê kurdî ye? Kîjan ji wan wekî "esil"ê bêjeya zimanê biyanî ye yan jî zêdetir nêzikî wê ye? (Malmîsanij, 2012: 21).*

Di ferhengê de bêjeyên pirvaryant yên Kurmançiyê hatine pêşkêşkirin, di nav hemû varyantên ku hatine tespît kirin de, hinek ji wan ku ji bo zimanê nivîskî hatine hîlbijartin

hatiye pêşniyazkirin. Di ferhengê de peyv li gor zayendan jî hatiye nivîsandin. ( mê: dişil; nêr: eril )

Ji ferhenga Ji bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî(Kurmancî)-Tirkî çend mînak:

*birazî (m, n), biraza (m, n), birarzî (m, n)/ brarzî (m, n), brarz (m, n), braza (m, n), brazî (m, n): yeğen. (Malmîsanij, 2012: 61)*

*kar (m, n), karik (m, n)/ kahr(m, n), kahrik(m, n), ker(m, n), kehrik(m, n): oğlak. (Malmîsanij, 2012: 146)*

*şilope(m)/ çelepe(m), çilapek(m), çilopek(m), silove(m), şilape(m), şilopek(m), şilove(m), şilowe(m): sulusepken(yağmurla karışık yağın kar), çıvgın, kargın.(Malmîsanij, 2012:269)*

*verisandin/ vareşandin, varışandin, veresandin, vereşandin, veristin, verişandin, verîsandin, verîsikandin, verişandin, wereşandin: çözmek, sökmek (Malmîsanij, 2012:287).*

Ferhenga Mustafa Gazî ferhengeke Kurdî-Tirkî ya biçûk e. Enstîtûya Kurdî ya Amedê di sala 2006an de vê ferhengê çap kiriye. Lê kedeke duvdîrêj yanî bi salan li ser xebat hatiye kirin. Ferhengeke herêmî ye, li ser herêma Qerejdaxê rawestiye û peyvên ku di ferhengê de cih giritine jî li wê herêmê hatine tomarkirin. Di derberê ferhengên Kurdî de xebatên herêmî kêmtir in, ji bo vê xabeteke teng û taybet e. Mustafa Gazî di nav hin mensûbên 'eşîra keja de ferhengê çêkirî. Ji bo enstîtuyên Kurdî, zimanzanan, etîmologan û hwd. nimûneyeke balkêş e. Ferheng 170 rûpelan pêk hatiye û tê de ji heft hezarî zêdetir bêje û bi sedan biwêj hene. Ferheng bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn (Gazî, 2006: 2- 5).

Ji ferhenga Mustafa Gazî çend mînak;

*alûc(d): erik; anka: şimdi; alvêr(d) : alış - veriş; bet: (d). toy kuşu;*

*bêrî(d): Cep "Bêriye kefen tûne". "Para, ölürken götürülmez" anlamında cimriler için söylenir.*

(Em dizanin ku peyva "bêrî" bi me'neya ji bo ku cihê pez tê dotin jî tê gotin. *Bêrî li êla girê mezin e.*)

*caw(e): bez. Gelemperî caw ji bo perçên ku spî û qelîtelî tê gotin.*



Di ferhengê de ji bo zimanê zarokan gelek peyv cih girtine. Di zimanê Kurdî de bi gelemperî peyva "ap: amca; apo: amcaya hitap şekli", lê di zimanê zarokan de bi wateya "baba" hatiye gotin. Ev gotin ji şermiyê tê. Bab û kur di malek de bijîn torin ji bavê xwe şerm dike ku bibêje baba, ji ber vê "apo" dibêje, ev gotin di nava Kurdan de belav e. Mustafa Gazî peyvan li gor eril (e) û dîşîl(d) ji hev qetandiye. Mînak: benîşt(e). sakız; berf.-(d): kar; berwar(e): yamaç [li herêma Serhedê "war" bi me'neya zozanan tê bikar anîn. Gelemperî cihê waran wekî deştan dîz nîne çe'l û kort, gir û çiya zêde ne. Ji bo vê gotina "ber+war" hatiye gotin.

**Zîwan(d):** Ekinler arasında yetişip hububata karışan siyahımsı taneli yabancı bir bitki.

[Zîwan dixin nava genim û di aş de dixin arvan ji bo ku çêkirina nan him wekî qayış ney him jî zêdetir tendûristîte zanîn.].

## NOTLARIM

### Not: 1

#### Ö sesi ve Ö'lü sözcükler:

**Körgi, Köri, Söreg, Şöli** sözcüklerini ve bunlardan türemiş olan diğer sözcükleri orijinal telaffuzlarına uygun olarak sözlüğe aldım. Tümüyle bilimsel sınırlar içerisinde hareket ettim. Kürtçe'de olmayan bu ses, dikkat edilirse öz Kürtçe sözcüklerde kullanılıyor. Bunun nedenini araştırmak benim işim değil, ama kesinlikle bunun araştırılması gerektiğine inanıyorum.

### Not: 2

#### Û sesi ve Û'lü sözcükler:

**Cûni, Mûri, Mûristan, Rûn, Rûvi, Şûn, Şûnda, Tûj**  
**Not:** I'de kullanmış olduğum ifade bunun için de aynen geçerlidir.

### Not: 3

#### Gw, Kw ve Qw sesleri:

**Gwîn, Gwîni, Gwîriz, Gwîşi, Gwîz, Gwîzan, Gwîzik, Kwîner, Kwîr, Kwîrik, Kwîsi, Kwîvi, Qwand, Qwas**  
 Bunların diftong ile bir ilgisi yok

ama (**Gw, Kw, Qw**) bir tek ses vermektedirler.

### Not: 4

ê ve î, û ve o uzun seslileri ve bunları yerlerini i ve u kısa seslilerine bırakması:

a) ê ve î uzun seslileri ile biten isimler bir edatla kullanıldıklarında (cins edatı aldıklarında) bunlar i'leşirler. Yani ê ve î uzun seslileri yerlerini i kısa seslisine bırakırlar. **Örnek:**

**Dê: diya min** (annem)

**Xwê: xwiya me** (tuzumuz)

**Tî: tiyê min** (eltim)

**Rî, rê: riya min** (sakalım, yolum)

b) Sonu û seslisi ile biten isimler bir edatla kullanıldıklarında, û uzun seslisi yerini u kısa seslisine bırakır. **Örnek:**

**Dû: duyê cixarê** (sigaranın dumanı)

**Tû: dara tuyê** (dut ağacı)

**Rû: ruyê te** (senin yüzün)

**Gû: guyê mişka** (fare dışkı)

c) O uzun seslisi ile biten isimler bir edat ile kullanıldıklarında, o uzun seslisi yerini u kısa seslisine bırakır. **Örnek:**

**Ço: çuyê min** (sopam)

**Devşo = devşuya te** (ayran)

Di dawîya ferhengê de Mustafa Gazî hin gotarên xwe nişe kiriye wek mînak. Rûpel:162

*Ferhenga bi Kurdî(Soranî- Kurmancî)-Tirkî* ji aliyê Abdullah Ekici ve hatiye amade kirin. Ev ferheng di sala 2015an de ji aliyê Weşanên Sîtav ve û li Çapxana Oztepeyê li Enqerê hatiye çapkirin. Bi alfabeya Latînî- 'Erebî hatiye nivîsandin. Ferheng ji 344 rûpelan pêk hatiye. Ev xebat; ji peyvên Soranî yên ku herî zêde di pirtûkên rêzimanî, kovar, rojname û metnên nûçeyan de tên bikaranîn pêk hatiye. Yekî ku di warê Soranî de bixwaze xwe pêş bixe divê gelek metnên nûçeyan û gotarên curbecur bixwîne. Ji ber vê yekê ji 300ê zêdetir gotar û hevpeyvîn hatine xwendin û ew peyvên ku di wan de gelekî tên bikaranîn bi awayekî bi baldar hatine neqandin (Ekici, 2015:1-4).

Di warê nebatan de berhema herî pêşî tê zanîn *Kitab El-Nebate* e û ji şeş cildan pêk hatiye. Ji aliyê zanyarê Kurd Ebû Hanîfî Ehmed Dawud el Dînewerî P.Z ve li der dorê salên 820-895an de li Kûfe, Besra û Esfehane xebatên zanistî hatine kirin û li dû wan xebatan hatiye nivîsîn. Di vê berhemê de; navên nebatan(riwekan) bi Kurdî, taybetiyên wan ên tibbî, gihiştina wan, qencî û neqenciya wan, taybetiyên wan ên morfolojîk hene. Lêkolîner Mehmet Fırat bi Latînî-Kurdî-Tirkî bi navê *Ferhenga Navên Riwekan* ferhengeke amade kiriye. Di navbera 1998-2012an de li heremên ku Kurd lê dijîn geriyaye û di sala 2012an de vê xebata xwe çapkiriye. Ji aliyê Waşanên Sîtav ve hatiye weşandin. Nêzê 67300 navên riwekan bi Latînî, Kurdî û Tirkî hatine nivîsîn. Ji van 7300 bi Latînî, 42000 bi Kurdî û 18000 jî Tirkî ne. Di dawiya ferhengê de wêneyê riwekan jî hene. Ferheng 650 rûpelan pêk hatiye û bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn (Fırat, 2012: 11-19).

Ahmet Kasımoğlu/Ehmedê Dirihî bi navê *Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî* bi Kurdî-Kurdî-Latînî-Tirkî, Tirkî-Latînî-Kurdî, Latînî-Kurdî-Tirkî ferhengeke amade kiriye û di sala 2013an de li Stenbolê çapkiriye. Li der dorê bîst hezaran bi Kurdî (Zaravayê Kurmancî, Zazakî, Soranî û Goranî), penc hezar bi Tirkî û sê hezar jî bi Latînî navên nebatan tê de cih girtine. Di ferhengê de di gotinên pêşiyar, biwêjan û çîrvanokên Kurdî de navên nebatan cih dane. Wek mînak:

“Ava goşt û balcana, ne xwar ne da cîrana”, “Gul bû, baran lê ket şil bû”, “Nîsk kirin gîsk” Çîvanokên Kurdî: “Zebeş e Dendik reş e Xwarinay xweş e”, “Tamî, tamî Gula şamî Goştê gur heram î”, “Genimê dewsa kizinê, Berxê li ber bizinê, Mêrê bindestê jinê, Her sê hesabê mirinê” (Dirihî, 2013: 42-43).

Di vê xebatê de navên cins û cureyên nebatan ji nav gel û ji ferhengên Kurdî hatiye berhevkirin. Bi giştî navên nebatan li gor herêman hatine tespîtkirin, cudayetî jî hatine nîşankirin û berhem pêşkeşî zanistê botanîkê yê dinyayê bûye (Dirihî, 2013: 40-43).

Dîlawer Zeraq bi Tirkî- Kurdî bi navê *Deyimler Sözlüğü-Ferhenga Biwêjan* ferhengeke amade kiriye. Çapa yekem ya Ferhenga Biwêjan di sala 2005an de ji aliyê Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hatiye weşandin.

*Di amadekirina vê ferhengê de, bi qasî wateyên wan, tiştê girîng ew bû ku divê bihata zanîn biwêjek bi çi rengî û di kîjan rewşan de tê bikaranîn. Ev yek ji bo min pirs(girêk)a sereke bû ku divê min çareser bikira. Her ku ez pê de diçûm ev rewş derdiket pêşberî min;*

1) *Di hin biwêjan de mantiqa her du zimanan hema bêje bi temamî wekî hev bûn. Wekî nimûne: Di zimanê Tirkî de biwêja, "Benden uzak olsun da Mısıra sultan olsun." Bergîdana wê di zimanê Kurdî de bi biwêjên, "Bila dûr be bila bi nûr be. Dûro bi nûro." dihat gotin.*

2) *Di hin biwêjan de wate û mantiqa her du zimanan nêzî hev bûn û gelek biwêj bi heman gotinan dihatin gotin. Wekî nimûne: Di zimanê Tirkî de biwêja "İki ayağımı bir papuca sokmak" Bergîdana wê di zimanê Kurdî de bi biwêja, "Her du piyên(yekî) kirin fereke solê" Dîsan di zimanê Tirkî de "Bıyık altından gülmek", di Kurdî de wekî, "Di bin simbêlan de kenîn." dihat gotin.*

3) *Di hin biwêjan de bi tenê peyvek ji gotinê diguherî. Wekî nimûne: Di zimanê Tirkî de biwêja, "Adam oluncaya kadar dokuz fırın ekmekek yemek" Bergîdana wê di zimanê Kurdî de bi biwêjên, "Heft teşt nan xwarin. Heft teşt nan û heft bar xwê xwarin" dihat gotin. (Zeraq, 2005:8).*

Bi rastî mantiq û qalibên zimanekî, di gotinên pêşiyar, biwêj û çîrokên wî de xweştir tîr xuyakirin û fêmkirin. Gelek taybetiyên biwêjan hene lê em ê zêde li ser nerawestî. Biwêj, gotinên xweser û taybet in, têşeyeke hevpar zêde nadin xuyandin. Hinek tenê ji du gotinan kurt pêk tîr. Mînak: "Lafa tutmak." Bergîdana wê di ferhengê de "Yek dan xeberdanê" hatiye gotin (Zeraq, 2005:484). Amadekirina *Ferhenga Biwêjan* bi qasê 9-10 sal berdewam kiriye. Ferhengji 720 rûpalaan pêk hatiye û bi alfabe ya latînî hatiye nivîsîn. Di ferhengê de nêzî 10 hezar biwêj cih girtine. Gelek biwêjên Kurdî henin nehatine berhevkirin an jî nivîskar peyda nekiriye û di vê ferhengê de cih negirtiye. (Mînak: "Cina+ketî"). Kêmasiyek ferhengê ya din jî ew e ku, ji bo ku armanca xwe bide

fêmkirin, biwêj hinek caran wekî helbestan bi awayekî hevdeng, lihevhatî û bi aheng tên gotin. Biwêj bi şêwazeke wisa xweş tê xemilandin ku tesîr dide dilên şexsan. Mînak: "*Hat nav malan tirî, Zeyno da bêjingê li dor benderê zivirî*". "*Feleka fînd û fînaz, firindê piçûk û baz, geh da me şahê gerdan, ew jî bi minet û naz*"

Di ferhengê de bi wî awayî gelek kê mînak dane (Zeraq, 2005:1-6).

Ferhengeke bi navê *Gotinên Pêşyan û Biwêjen Botan* di sala 2005an de ji aliye Abdulkadir Bingöl ve hatiye amadekirin û ji aliye Weşanên Nûbiharê ve hatiye weşandin (Yıldırım, 2008: 70).

Abdulkadir Bingöl bi navê *Gotinên Pêşyan û Biwêj/ Deyimler ve Atasözü* bi Kurdî- Tirkî di sala 2014an de ferhengeke amade kiriye û ji aliye Weşanên na ve hatiye weşandin. Ferheng bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn. Ferheng bi 510 rûpelan pêk hatiye. Ev ferheng bi alikariya Hecî Emîn Bîngol ve hatiye çapkirin. Di ferhengê de derbarê *Gotinên Pêşyan û Biwêjan* de agahî danin û brfireh hatiye terîf kirin. Mînak;

*Ji wî bitirse yê ji Xwedê netirse.*

*Allah'tan korkmayandan kork!*

Yanê wan zalim û zordestên ku Xwedê nenasîn bitirse. Lewra dilê wan kesên ku xwedê li bîra xwe naênin tarî ye; dibe ku her cûr xirabî ji wan derbikeve.

Yani Allah'ı tanımayan ve O'ndan korkmayın kimseden kork. Çünkü Allah'tan korkmayan kimse her türlü kötülüğü yapabilir (Bingöl, 2014: 169).

*Ferhenga Standart* di sala 2015an de bi alikariya Weşanên Fono ve hatiye amade kirin û li Stenbolê hatiye weşandin. Ferheng bi Kurdî-Tirkî û bi Tirkî-Kurdî ji du beşan pêk hatiye. Ferhenga Standart; Ramazan Pertev, Mikail Bülbül, Çetin Taş, Ruken Çalıştiran û Bünyamin Demir amade kirine, Mehmet Salih Karaaslan û Yakup Başboğa jî sererast kirine. Di ferhengê de peyvên ku sixlet di Kurdî de tê bikaranîn cih girtine. Ji bo îhtiyaca xwendekaran jî ferhengeke hêjatir e. Ferhenga Standart, bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn. Di ferhengê de peyvên rojane, biwêj û têgehên zanistî (bitkibilim: riweknasî; coğrafya: erdnigarî; denizcilik: deryavanî; dilbilim: zimannasî; matematik: bîrkarî) jî cih girtine. Di ferhengê de ji 30 hezaran zêdetir peyv hene. Peyvan li gor zayend (dîşîl, erîl) nîşan dane. Ferheng ji 466 rûpelan pêk hatiye û di dawiya ferhengê de formên lêkeran li gor deman nivîsîne (Pertev vd, 2015:1-15).

Mirkan Baran bi navê *Ferhenga Kurdî- Tirkî/ Türkçe -Kürtçe* ferhengek amade kiriye. Çapa ferhengê ya yekem di sala 2012an de çapa duyem jî di sala 2013an de ji aliye

Weşanxaneyaya Ozanê ve li Stenbolê hatiye weşandin. Di beşa yekem ya Tirkî-Kurdî de ji şeş hezar peyv zêdetir peyv cih girtine, di beşa duyem de jî ji penc hezaran zêdetir peyv cih girtine. Ferheng ji 232 rûpelan pêk hatiye. Di ferhengê de derbarê fonetik û alfabeya Kurdan de jî agahî dane. Ferheng bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn (Baran, 2013: 10- 27). Di ferhengê de listeya peyvên ku bi gelemperî di jiyana rojane de tê bikar anîn: navên rojan, navên mehan (Ocak: Rêbendan; Kanûna Pêşîn, Ağustos: Gelawêj; Tebax, Ekim: Kewçêr; Çiriya Pêşîn hwd.), navên demsalan, navên rehgan, navên jimarên, navên hin ajalên, navên sewze û mêweyan, navên welatan (Arnavut: Alban, Danimarka: Denmark, Îspanya: Hîspanya, Suriye: Sûrya hwd.) hene. (Baran, 2013: 17- 29). Di dawiyê ferhengê de 215 lêkerên ku bi gelemperî di nava gel de tê bikaranîn, berawirdiya wan a Kurdî hatiye nivîsîn (Baran, 2013: 227- 231). Di ferhenga Baran de di derbarê alfabeya Kurdî ya Latînî de mînakên balkêş cih girtine. Wek mînak; tîpa "â" zêdetir di nav alfabeya Kurdî ya Latînî de nayê bikaranîn. Di ferhengê de cih danê. Wek; *Kânî: su çeşmesi* (Baran, 2013: 23). Mirkan Baran Ferhenga Kurmancî-Ruskî û Ferhenga Kurmancî-Îngîlîzî jî çêkiriye. Li van ferhengan wekî ferhenga Kurdî-Tirkî/Türkçe-Kürtçe berawirdiya wan a Rusî û Îngîlîzî lê zêde kirine. Li gor ferhengên ku çê kiriye em dikarin bibêjin xebeteke berfireh û zêdetir peyvên nû cih negirtine.

Sinan Alptekin bi navê *Ferhenga ZimanêKurdî-Tirkî/ Türkçe-Kürtçe* ferhengeke amade kiriye. Ferheng di sala 2003an de li Almanyayê hatiye çapkirin. Ferheng ji 121 rûpelan pêk hatiye û bi gelemperî li ser înternetê tê 'emilandin û bi hin kêmasiyan jî be wekî pdf jî hatiye weşandin. Di ferhengê de nêzê 6 hezar peyv cih girtine. Ferheng bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn (Alptekin, 2003: 1-115).

zewî tarla	zirav ince
zewac evlilik	zirbav üvey baba
zewade erzak,erzak stoğu	zîrç kuş ve tavuk pisliği
zewd angarya	zirehpûş çelik yelek
zewicandin evlendirmek	zîrek zeki,yetenekli,acar
zewicî evli	zirîç kurşun
zewicîn evlenmek	zirîn anırmak
zexel tembel,vurdumduymaz	zirndin anırtmak
zexm dayanıklı,sağlam	zirnezîq tahterevalli
zexmbûn sağlamlaşmak	zirqetik hamam böceği
zexmkirin sağlamlaştırmak	zirt palavra
zexnepûrt zıkkım	zirtek palavracı
zibare imece	ziryan poyraz
zibil hayvan gübresi	zîtik hayvan tekmesi
ziha büyük yılan,ejderha	zîv gümüş
zik karın	zîvan çil
zik bal mumu sürülmüş iplik	zîver rahatsız
ziko obur	zîvêrbûn rahatsız olmak
zikreşî çekememezlik	zîvêrkirin rahatsız etmek
ziktilêr göbekli şişman	zivir pürüzlü şey
zîl filiz	zivirandin(dizivirîne bizivirîne) çevirmek,geri çevirmek,döndürmek
zîl dan filizlenmek	zivirîn dönmek
zilam adam,erkek	zivistan kış
zilmat kapkaranlık	ziwa kuru
zilo sülük	ziwabûn kurumak
zilûk hasır	ziwahî kuruluk
ziman dil	ziwakirin kurutmak
zimandirêj çok konuşan,geveze	zîwan tahılların içindeki yabancı otlar
zimanê zikmakî anadil	ziyan zarar
zimanxweş tath dilli	ziyan gihandin zarar vermek
zimanzan dilbilinci,tercuman	ziyandar zararlı
zimanzanî dilbilimi	zîz duygulu,duyarlı,hassas
zimanzêrîn mec.sır saklamayan	zîzok topaç
zîn eyer	zo çift
zinar kaya	zom bölge,oba
zindî canlı	zonp balyoz
zingilîn köpeğin ölmesi	zor çok,fazla,epey
zînî tümsek	zordar diktatör,zalim
zinîn sarmak	zordarî baskı,zulüm
zintod iri yazı	zordest zalim,baskıcı
zîper ense;pazu	zordestî baskı,zulüm
zîpik dolu yağışı...	zov kırkayak
zîq dik	zozan yayla
zir sahte,taklit;üvey,gerçek olmayan	zozanî yaylacı
zîranewa meraklı	zû çabuk,acele
zîranî merak	

### 2.1.3. Kurdî- Erebi/ Erebi- Kurdî/ Kurdî-Erebi-Kurdî


Ferhenga Ehmedê Xanî di sala 1683an de bi navê *Nûbihara Biçûkan* bi Kurdî-Erebi, Kurdî ji bo zarokên Kurdan hatiye çêkirin. Cara duyem di sala 1908an de ji aliyê Lecog ve di nav xebata “*Tekstên Kurdî*” de li Berlînê hatiye weşandin. Di xebata Xalîdî de kurtnivîsara gramatîka Kurdî, çend helbestên Ehmedê Xanî û ferhengoka Ehmedê Xanî hatine çap kirin. Ev ferhengok xeberên zarê Kurmancî tîne ber çavan. Qîmeta wan ya di derheqê fêrbûna zimanê Edebiyata Kurdî ya klasîk de gelek e. Di derheqê navê vê berhême de jî fikrekî zelal tune. Yanê nayê zanîn gelo ev nav bi wateya demsalê “Nûbehar” e an jî bi wateya fêkiya nû “Nûbar” e. Fikrên ji hev cuda hene û ev nav wekî “Nûbihar”, “Nûbehar” û “Nobar” jî tê nivîsandin û bilêvkirin (Kurdo, 1960: 15; Yıldırım, 2008: 9-73).

Ferhenga *Nûbihara Biçûkan*, wek ferhenga menzûm ya yekemîn tê zanîn. Beytên destpêkê û yê beşa yekemîn bi gelemperî Kurdî ne. Di ferhengê de nêzê 220 malik û nêzê 1000 bêjeyên 'Erebi û hemwateyên wan ên Kurdî hene. Beşa ferhengê ku tê de bêje û termên 'Erebi û Kurdî hatine rêz kirin û pêşberkirin ji beşa duyemîn ve dest pê dike. Bêje û termên ferhengê çawa ku wekî 'Erebi-Kurdî hatine rêz kirin, wekî Kurdî- 'Erebi jî hatine rêz kirin. Ji ber vê berhem her çiqas 'Erebi- Kurdî tê hesibandin, ewqas jî Kurdî- 'Erebi ye. Lê di îfadekirin û bihevexistina bêje û terman de zimanê vegotinê Kurdî ye. Bi vî awayî, ji bilî bêjeyên Kurdî yê ku bi yê 'Erebi re hatine pêşberkirin gelek bêje û îlaweyên Kurdî yê bi serê xwe jî derketine holê. Hinek ji pêkerên ku vê berhema ku Xanî dibêje min ew “ji bo zarokê Kurmancan” çêkiriye ên girîng ev in:


Ev ferheng wek ferhenga Kurdî ya yekemîn tê zanîn ku bi vî awayî ferhengnivîsiya Kurdî bi ferhengek menzûm a dîdaktîk dest pê kiriye. Ev ferheng ji dema Xanî û pê ve di medreseyan Kurdan de wekî kitêba dersê hatiye xwendin û jiberkirin. Niha wekê berê zêdetir nebe jî di hin mizgeft û medreseyan de de kitêba “*Nûbehara Biçûkan*” tê fêr kirin û tê xwendin. Di medrese û mizgeftan de bi gelemperî bi rêza *Elifba*, *'Emma*, *Qûr'an*, *Mewlûd Nûbehara Biçûkan*, *Îbnî Qasim* hwd. tê fêr kirin. Bi vî awayî, mengî û armanca şa'irê me ku zimanê Kurdî bibe zimanê perwerdehî, bi saya vê ferhengê qismî be jî hatiye cîh. Bêjeyên ku di beytên vê behremê de wekî 'Erebi-Kurdî yan jî Kurdî- 'Erebi hatine pêşberkirin ne bi awayekî rasthatî û bêrêbaz, belkî li gorî têfikirbûna hinek mijarên diyarkirî hatine hilbijartin. Xanî di çarçoveya vê têfikirbûnê û hilbijartinê de di tespîtkirina mijaran û girtina wan a di dest de wek rêbazên ji nêz ber bi dûr ve ji tiştên

hêsan ber bi tiştên zor ve, ji tiştên ku têt zanîn ber bi tiştên ku nayên zanîn ve û ji tevahî ber bi perçeyan ve bi awayekî serkeftî sepanîye û bergehêk pedagojîk pêşan daye (Kurdo, 1960: 15; Yıldırım, 2008: 9-73). Ferhenga “Nûbehara Biçûkan” bi alafabeya 'Erebî hatiye nivîsîn lê pey re di van demên dawî de gelek caran hatiye latînzê kirin.

Ferhenga *Nûbehara Biçûkan* di sala 2004an de wek çapa sêyem, ji aliyê Weşanên Îhsan ve hatiye çap kirin. Nûbehara Biçûkan bi tîpên Latînî di sala 1986an de ji aliyê Zeynelabîdîn Zinar ve li Stockholmê hatiye çap kirin, pey re jî di sala 1992an de bi navê *Nûbar* li Stenbolê ji aliyê Weşanên Fîrat ve dîsa hatiye çap kirin. Ferheng ji 52 rûpelan pêk hatiye (Zinar, 1992: 3-6).



*Ji Ferhenga Nûbehara Biçûkan mînak.*



*Ji Ferhenga Nûbehara Biçûkan mînak.*



Di sala 2008an de Kadri Yıldırım bi navê *Kuliyata Ehmedê Xanî* li ser *Nûbehara Biçûkan* û *Aqîda Îmanê* du xebat çêkiriye. Di xebata xwe ya *Nûbehara Biçûkan* de bi awayekî berfireh analîz û wergera wê ya bi Tirkî kiriye. Ev xebat, ji gelek aliyan ve girîngî û qîmeta Nûbehare derdixe holê û xalên ku heta wê gavê bala gelek lêkolîner û akademîsyenan nekişandibûn tîne ber çav. Ferheng bi tevahî bi agahiyan ve ji 382 rûpelan pêk hatiye û ji aliyê Weşanên Avestayê ve hatiye weşandin. Ferheng bi alfabeya 'Erebî û wergera wî jî bi Latînî hatiye nivîsîn (Yıldırım, Kadri: 2008: 9-382).

Hindî selewatan hemî

Li resûlê me yê ummî

*hindî: ne kadar varsa*

Ku bûne peyrewê di wî

'Ereb û 'Ecem û Kurmanc û Romî

*peyrew: takipçi, bağlı*

Vêk êxistin Ehmedê Xanî

Navê "Nûbihara Biçûkan" danî

*Vêk êxistin: birbirine bağladı, birbiriyle birleştirdi, topladı, derledi*

Ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkê Kurmancan

*rewaç: revaçta olan, geçerli olan, değer taşıyan*

Wekî ji Qur'anê xelas bin

Lazim e li sewadê çavnas bin

*çavnas: bilgili, gözleri bilgiye açık*

Da bi van çend reşbelean

Li wan tebî'et melean

*reşbelek: müsvedde*

Di weqtê dewr û dersan

Bikin îna'am û îhsan

*ders: ders, eğitim*

Bi dua vibîr bînin

Fatîhan ji me ra bixwînin

*vibîr bînin: hatırlasınlar*

Xuda Ellah e; qasid Resûl e ey Xudêzan

Xelîfe çr in; hem çar îmam in ey Musluman

*qasid: Kürçe de peygambere denir*

Divêtin tu bizanî bi dil navê îmaman

'Elî çar in, Hesen du, Muhammed sê ne ey can

*divêtin: gerekir*

Ji bo me çarê dîtir hayin sahib mezahib

Muhemmed, Malik, Ehmed, ewê dîtir ki Nu'man

*dîtir: diğeri, başka*

Mubeşşer bûne dehkes ji eshaban bi te'yîn

Ku dê biçne bihiştê Xwedê mizgîn-i da wan

*bihişt: cennet*

Li me ferz e bizanin Resûlê xwu bi tehqîq

Bi mewlid hem bi medfen inasin da û baban

*da: anne; bab: baba*

Cemî'ê ummeta wî bi lutf a xwe îlahî

Ji dunyayê verêkî bi Qur'an û bi îman

*verêkî: gönder*

Heta ew şehsuwar bê û goya ummeta xwe

Ji meydana hîsabê hilînit şibhê çokan

*şehsuwar: kahraman*

*Perde ku rabbitin ji ber aridê dilistan e xweş*

*Dil ji xeman ku bête der bulbulê gulistan e xweş*

*arid: yüz; dilistan: gönül bahçesi*

Îbn-i kur e; bint-i keç e; sihr-i xezûr e; mam-i 'em

'Emet met e; îmamet şaş; ceddî çî ye ? Xwe pîreda.

*hezûr: kayınpeder; pîreda: nine; mam: amca*

*Xirs-i derew, mexîd-i dew, bet çî ye? Qaz e; qebce kew*

*Şett-i kenar-i, nehr-i co, lexw û sukak û cew hewa*

*derew: yalan; dew: ayran; bet-qaz: kaz; co: kanal; kew: keklik*

'Esced û 'eyn û nedr-i zêr; fide luceyn û nuqre zîv

Sufr-i çî? Mifriq e; nuhas paxir e, hem risas qela

*zêr: altın; zîv: gümüş; mifriq: pirinç (alaşım); paxir: bakır; qela: kurşun, kalay*

'Arifê ku bi qencyê me'rufi bit

Dê helîm û sabir û mewqûfi bit

*qenci: iyilik*

Misr û beled bajar in ew, dîrhem dirav, ermûş herîr

Manih sexî, sail ricokar û şefa'et mehder e

*bajar: şehir; dirav: para; ermûş: ipek; sexî: cömert; ricokar: dilenci; mehder: şefa'at*

Îmlaq xîzanî, xina maldarî û hem istiran

Îtlaq-i berdan, telq-i zan, zewc û wîtr cot û fer e

*xîzanî: fakirlik; [du parên xîzanî nezani ye].*

*maldarî- istiran: zenginlik; şarkî; berdan: serbest bırakmak; zan: doğum, doğmak; cot û fer: çift ve tek*

Emred ruwal û efre' bimû, eqre' keçel, emles hulû

Esxer biçûk, ekber mezin; seyyid hulahlil mîr ser e

*ruwal: sakalı çıkmamış genc; bimû: kılı; keçel:kel; hulû: pürüzsüz; mezin: büyük; ser: baş, lider*

Tuffah sêv e, simsim kuncî ye, bih sefercel

Duba' û qer' û yeqtîn kundir, cubn penîr e

*bih: ayva ; sêv: elma; kuncî: susam; kundir: kabak; penîr: peynir*

'Ebd û reqîq kole, hirfe seni'e pîş e

Cahil nezan e, zana 'ellam û hem xebîr e

*pîş: sanat, meslek*

Ru'b û rehî hewl wehl û feşl û becl û rew' tirs

Reb'-i îwergeh, recc hejandin, fecc-i rê, pirsîn sûal

*tirs: korku; îwergeh: ikametgâh; hejandin: sallamak*

Mire quwwet, wimq-i mehbî, uns û ulfet hogirî

Xemr û ebled kell-i kewden, be'l-i mêt û gan bî'al

*quwwet: güç, kuvvet; mehbe: muhabbet; hogirî: arkadaşlık; kewden: cahil, ahmak; gan: çiftleşmek*

*Hamile bardar û hubla avis û qorix hîma*

*Himya pawan, hely-i xişr e, hilye zînet, hewl-i sal*

*qorix: koru; bardar: yüklü; pawan: korunan şey, perhîz; xişr: süs eşyası*

Şeml-i belavbûn e hem vêkkin e, şeml e ber

Zerbiyye mafûr e hem tensefe ey baxeber

*belavbûn:dağılmak ; vêkkin: birbirine düşmek ber: sarılıp örtünülen şey mafûr: halı, kilim*

Zuhzihe dûrbûyî ye, uzlife diddê wî ye

Eflehe gerya xelas, seld-i qewî, sexre ber

*qewî,: güçlü, sert, katı ber: kaya*

Zewb-i behatin, zeneb dûv e, biraştî şuwa'

Şat-i pez e, de'n-i mih, me'z-i bizin, hecme ker

*behatin: erimek ; dûv: kuyruk ; pez: koyun ; mih: koyun ; bizin: keçi ;kerî: sürü*

'Irq-i reh û fer'-i çiq, pelg e wereq, bizr-i tov

Dar-i şecer, qitf-i ber, fêkî ye tel' û semer

*reh: kök; çiq: dal; pelg: dal; tov: tohum; fêkî: meyve*

Fulk-i gemî, silk-i lirêçûn e, diya' ruhnî bizan

Şehr-i meh û leyl-i şev û sifle geda, ebleh nezan

*lirêçûn: yol yürümek; ruhnî: ışık, aydınlık; meh: ay ;şev: gece ;geda: ayak takımı ; nezan: cahil, ahmak*

Tefşo qedûm; dulbe çinar; mîhfer û sîkke çi? Mukar

Mîlzem û hizk herdu fişar; qet'-i berrîn, sinn-i didan

*Tefşo: keser; Mukar: saban; fişar: mengene; berrîn: kesmek; didan: diş*

'Edud bazik, 'enîşk mirfeq, zira' zend e, lisan ezman

Tenişt cenb û ibit binçeng, unuq ustû, sedy-i pustan

*bazik: pazu; 'enîşk:dirsek; zend:kol,arşın; tenişt:yan, taraf; ustû: boyun; pustan: meme(sedy)*

Cewarih dest û pê, hulqûm û helq û hencer in gewrî

Eşa şîv û xeda taştê, xiza' zad û îna' aman

*gewrî: boğaz, gırtlak; şîv:akşam yemeği; taştê: öğlen yemeği; zad: azık; aman: kap*

Cerîde defter û qirtas-i kaxed tirs wereq ewreng

Suradiq xîfetin, fustat-i kon, zerf û wi'a aman

*defter: defter; xîfet: oba; kon: çadır; aman: kap-kaçak*

Îşaret wehy û telwîh û îrade vîn û qudret şîn

Ceban qels û betl merd û lîwa ala, 'elem nîşan

*vîn: irade, istek; şîn: güç ve kuvvet; merd: cesur; ala: bayrak; nîşan: belirti, nişan*

Teraxî teref, sistî û nermî

Heteb suxtenî, me'mean germî

*sistî û nermî : gevşeklik ve yumuşaklık; suxtenî,: yakıt, yakacak ; germî: sıcaklık*

Firîvî henîz û firûzî muka'

Siyah û seda deng û gazî nîda

*Firîvî: kebablık et; firûzî: ıslık; deng: ses; gazî: seslenme*

Derîzan e 'etbe, wereng e wesîd

Bi me'nay-i ax in rufat û se'îd

*Derîzan: kapı eşiği; ax: toprak*

*lengî: sakatlık(topallık)*

*arî: yardım*

*hêl-alî: taraf*

*vêkra: birlikte, beraber*

*quling: turna*

*xiz: hısım, akraba*

*pawan: korumadergehvan: kapıcı*

*êş: acı, ağrı*

*geşt: piknik, gezi*

*tîr û kevan: ok ve yay*

*hevrê: yoldaş, arkadaş*

*rêwî: yolcu (Yıldırım, Kadri: 2008: 153-326).*

Şêx Marûf Nodeyî (1753-1837), ferhengeke bi Kurdî (Sorani)- 'Erebî bi navê *Luxetnameyî Ehmedî* di sala 1790an de amade kiriye. Ferhenga *Luxetnameyî Ehmedî* ku hatiye bi dest xistin ji 51 rûpelan pêk hatiye. Di ferhengê de ya ku ji aliye 'Ebdurrehman Mahmûdî ve hatiye dîtin, 1500 peyvên 'Erebî û hemwateyên wan ên Kurdî cih girtine. Ferheng ji destpêk û du beşan pêk hatiye. Destpêk bi besmeleyê dest pê dike û ji 13 beytan pêk tê û 4 beyt bi tamamî 'Erebî, 9 beyt jî bi Farisî hatiye nivîsîn ( Yıldırım, 2008: 96).

Di destpêkê de ji bo kurê wî hisan fêrê 'Erebî be wiha dibêje;

Der in rîsale be Kurdî zeban

Kunem ziban-i Ereb ra beyan

Ben Kürtçe bu risalede

Arap dilini ediyorum ifade ( Yıldırım, 2008: 97).

Beşa yekem gelemperî ji navan pêk hatiye;

Re's ser e, 'eyn çaw e

Beden qalib, îsm naw e

"Re's" (baş) ser dir, "eyn" (göz) çaw dır

"Beden" (vücut) "qalib"; "îsm" (ad) "naw" dır ( Yıldırım, 2008: 97).

Beşa duyem gelemperî ji lêkeran pêk hatiye;

Qe'ede danîşt, celese eyden

'Ebere rabûrd, weqefe westa


"Qe'ede" (oturdu) "danîşt"; "celese" de aynı anlamdadır eyden

"'Ebere" (geçti) "rabûrd"; "weqefe" (durdu) "westa" dır ( Yıldırım, 2008: 97).

*Luxetnameyî Ehmedî*, bi navê *Ehmedî-Kitêbî Luxetî Kurdî û Tatî (Erebî)* ji aliye Seyîd Huseyn Huznî el-Huseynî Mukriyanî ve di sala 1926an de li Rewandizê hatiye çap kirin. Çapeke wê li Mehabadê bi navê *Kitêbî Luxetnameyî Ehmedî Kurdî û Arewî* li pirtûkxaneyê Seyidyan heye, lê tarîxa çapê li ser nîn e. Çapeke din ya bê tarîx jî ev e: *el-'Elmalî'l-Kamîle li Şeyx Me'rûf Nodehî el-Berzencî el-Kurdî el-Ehmedîye fi Tercemetî'l-Kelîmati'l-'Erebîyye bi'l Kurdiyye*. Çapeke wê, di sala 1936an de li Bexdayê ji aliye Hîdayetullah Huseynî ve hatiye çap kirin. Li gorî Bîmarî ku li ser vê berhemê xebateke baş kiriye, ji ber ku Huseynî bi pêşkeşiyê berfireh di derbarê destxetê û rastkirina wê de agahî daye, wek çapa herî baş û tekûz ev tê zanîn. Her wiha wî gelek kêmasiyên

berhemê jî, ji aliyê rastnivîsa 'Erebî ve rast kirine. Çapa wê ya Kerkûkê ji aliyê Mihemed Emîn Esrî ve, çapeke wê ya din jî ji aliyê Gîwî Mukriyanî ve hatiye kirin. Dûre Hembûrî jî di sala 1936an de li Bexdayê bi navê *Kitêbî Ehmedî* di çapxaneyê Furatê de çap kiriye. Her wiha Jemal Nebez, behsa çapeke wê ya Silêmanî ya li Çapxaneyê Jiyân dike ku di sala 1935an de wek çapa duyem derbas dibe. Di van demên dawî de lêkolîner Mehmûd Ehmed Muhemmed, metna ferhengê bi navê *Şêx Marîfî Nodî, Kitêbî Ehmedî*, li Silêmanî çap kiriye. Wî di vê xebatê de berhemê ji nû ve sax kiriye, pêşgotinek nivîsandiye û wêne li ser zêde kiriye. Muhemmed behsa gelek destnivîsên vê berhemê dike. (Pertev, 2012: 26-27).

Ferhenga Yusif Ziyaeddîn Paşa, di sala 1892-94an de bi navê *El-Hediyyetu'l Hemîdiyye fi'l luxeti'l-Kurdiyye* li Stenbolê hatiye çap kirin. Di dema 'Ebdulhemît de wexta li Mutkiyê qeymeqamtî kiriye vê ferhengê amade kiriye û bi destûra Osmanlı Maarîf Nezaretî li matbaaya Şirket-i Mürettibiye hatiye çap kirin. Ew, dema ku qeymeqamê Mûtî ya Bedlîsê bû ferhenga xwe bi alîkariya hinek zana û melayên Kurdan nivîsiye. Ferheng bi devoka Mutkî ye û bi 'eslê xwe Kurdî-'Erebî ye. Ev ferheng ji aliyê Mehmed Emîn Bozarlan ve bi ser Tirkî ve hat wergerandin û di sala 1978an de li Stenbolê ji aliyê Weşanên Çirayê ve bi Kurdî- Tirkî hate weşandin. Di ferhengê de nêzê 5300 peyv cih girtine û ji 407 rûpelan pêk tê (Bozarlan, Mehmed Emîn). Çapa duyem ji aliye Muhammed Mukrî ve di sala 1987an de li Beyrûtê hatiye kirin (Yıldırım, 2008: 75-76; Burkay, 1991: 6; Chyet, 2003: X).



Qapaxa Ferhenga Yusif Ziyaeddîn Paşa *El-Hediyetu'l Hemîdiyye fi'l luxeti'l-Kurdiyye*.



Nivîskar di ferhengê de peyvan li gor dema niha jî kişandiye. Mînak; peyva "derbazkirin" bi forma "derbaz+dike" jî nivîsiye, peyva "ajotin" bi forma "tajo"[dajo] jî nivîsiye û hwd.

Derabe	Derence
<b>Derabe</b> : Evleri bölmele- re ayırmak için araya konulan yassı tahta- lar (ayrıca dükkân ve mağaza kepenkleri).	mek anlamına bileşik fiil. Şimdiki zaman fiili « <b>derbaz dıke</b> ».
<b>Derav</b> : 1 — Aile fertle- rinin çamaşırlarını yı- kama işi (bazı yöre- lerde « <b>berav</b> » denir). 2 — Duvar da meydana gelen çatlak.	<b>Derben</b> : Kapların kul- pu.
<b>Deranin</b> : Çıkarmak an- lamına bileşik fiil. Şimdiki zaman fiili « <b>der tine</b> ».	<b>Derbık</b> : İçi boşaltılarak barut doldurulan, par- mak biçiminde, küçük tahta parçası.
<b>Derb</b> : 1 — Darp, vurma. A. 2 — Kere, kez.	<b>Derbûn</b> : Su kaynağının açılarak suyunun ak- ması, ya da sivilce ve çıbanın açılarak için- deki cerahatın akması anlamına bileşik fiil. Şimdiki zaman fiili « <b>der dıbe</b> ».
<b>Derbat</b> : Başkasına kar- şı direnebilen, diren- meye yeterli olan kim- se (direndiği kişiye güç ve yetenek bakı- mından denk olan kimse).	<b>Dercaw</b> : Yemekten son- ra ellerin silinmesinde kullanılan bez (bazı yörelerde « <b>sercaw</b> » de- nir).
<b>Derbazbûn</b> : Geçmek, herhangi bir şeyi geç- mek anlamına bileşik fiil. Şimdiki zaman fi- ili « <b>derbaz dıbe</b> ».	<b>Derçık</b> : Kapı eşiği. <b>Derd</b> : Belâ, dert.
<b>Derbazkırın</b> : Geçirmek, herhangi bir şeyi bir başka şeyden geçir-	<b>Derdanık</b> : Yeni yapılan peynirin suyunu süz- mesi için konulan bez (bazı yörelerde buna « <b>parzûm</b> » denir).
	<b>Derek</b> : Belirsiz, belli ol- mayan yer.
	<b>Derence</b> : Merdiven.

Li Iraqê Gîwî Mukriyanî di sala 1950an de bi navê *el- Murşîd/Rehber* ferhengeke Erebi-Kurdî jî derxistiye. Ferheng ji 404 rûpelan pêk hatiye û nîşeyên rêzimanî dide nasîn. Di ferhengê de bi qasê 15 hezar peyv cih girtine. Ferheng bi alfabeya 'Erebî hatiye nivîsîn. Di ferhengê de peyvên ku cih girtine li herêma Îran û Iraqê bi gelek zaravayan hatine nivîsîn (Chylet, 2003: XII).

Cegerxwîn, *Ferhenga 'Erebî-Kurdî* di sala 1962an de çêkiriye. Ferheng ji du cildan pêk hatiye, cilda yekem ji 316 rûpelan, cilda duyem jî ji 251 rûpelan pêk hatiye û li Bexdayê hatiye çapkirin (Akin, 2013: 61).

*Sadiq Bahaeddîn* di sala 1973an de bi navê *Îdyomêt Kurdî* ferhengeke Kurdî- 'Erebî çêkiriye. Ev ferheng ji bo zaravayê Behdînan berhemek çêtir e. Bi alfabeya 'Erebî û bi zaravayê Kurmancî hatiye nivîsîn. Ferheng ji 160 rûpelan pêk hatiye (Yıldırım, 2013: 69; Chylet, 2003: XII).

Muhemed Cemil Seyda bi navê *Qamûsu'l-Heyat*, Kurdî (Kurmancî)- 'Erebî *Ferhenga Jîn* amade kiriye. Muhemed Cemil Seyda di sala 1964an de dest bi amadekirina *Ferhenga Jîn* kiriye. Qasê 25 sal li ser ferhengê xebitiye. Ferheng di sala 1987an de li Bêrûdê û ji aliyê Çapxana Emîralê ve hatiye çapkirin. Di ferhengê de nêzê 22150 peyv cih girtine û ji 424 rûpelan pêk hatiye. Peyre ev ferheng ji aliye Weşanxaneyê Tîrêjê ve ku navenda wê li Suriyê ye, di sala 1994an de li Bêrûdê hatiye çapkirin. Di pêşgotina ferhengê de Seydayê Tîrêjê behsa zimanê Kurdî û dîroka Kurdan kiriye. Muhemed Cemil Seyda di dawiya ferhengê de gotineke pêşiyên dibêje; "*Ga dimire çerm dimîne, mêr dimire nav dimîne*" (Muhemed, 1987: A-B-C-D; Chylet, 2003: XIV; Akin, 2013: 62).

*Ferhenga Jîn* li gor alfabeya Latînî ji aliyê çepê ve dest pê dibe, li hember jî li gor alfabeya 'Erebî ji aliyê rastê ve dest pê dibe. Ferheng bi vî awayê hatiye nivîsîn. Di ferhengê de pesnê Hafîz Esad dide ku ji bo çapkirina ferhengê alîkarî kiriye. Ji bo vê yekê ferhengê diyariyê Hafîz Esad kiriye. Di berhevkirina peyvên de bi gelemperî ji çavkaniyên Edebiyata Kurdî a Klasîk îstifade kiriye. Wisa xwuya dibe ku peyvên ku daner peyda kirine hemû di ferhengê de cih negirtine. Di *Ferhenga* ku me bi dest xist de 15 rûpel xuya nake. Di ferhengê de di derbarê dubarekirinê de gelek şaşîti çêbûye. Muhemed Cemil Seyda di ferhengê de peyvên ku koka wan 'Erebî be bi îşareta "'eyn", Farsiya nûjen be (FN), Kurdî- Soranî be (Sor), Tirkî be (T) û bi Yunanî, Almanî, Îngîlîzî û Îtalî be bi (L) nîşe kiriye. Çend mînak; esmîn (FN), êzgeh (Sor), fabrîke (L) û hwd.

ciwazi	اختلاف	cîhiştî	مغادر
ciwazkirin	تفريق، ايجاد	cîdihêle	بغادر
ciwer = cuher	مخلابة الدابة	cîl (ع) nifş	جيل، اجيال
ciwêlek	بروليتاريا، الطبقة العاملة	cîma	بقي، تخلف
cixare	سيكارة	cîmay	باق
cixarekês	مدخن السيكارة	cînav = pironav	الضمير، لقب (ق. ل)
cixiz	خط	cîngane = qereçî	عجري
cixecix	صوت بعض الطيور	cînişin	مقيم
cixizkêş	خطاط	cîq	عصفور اسود اللون
cixizkirin	تخطيط	cîqcîq	زقزقة الطائر
cixizkirî	مخطط	cîran = cînan = hevsî	الجار
cixizdike	مخطط	cîraz	المكان المناسب
ciyan = mitêl	فراش النوم	cîro (L)	جيرو
ciyek	محل ما	cîwar	مقر
ciyêz = rehel	جهاز العروس	cîwelek	صعلوك
cizdan	محفظة النقود	cîyî = cîkî	محل ما
		cîwe = sîmav	زئبق
<b>CÎ</b>		<b>CO</b>	
cî = cih = war	مكان	co = cok = cobar = şaco	الساقية
cîcî = livirûderaha = cîcîna	هنا وهناك		

## D

الحرف الخامس من الابجدية الكردية

da = dakû	لكي من اجل
da = dê = dayê = dadê = dada = mama	الوالدة، الام، اعطى
da = lêda	ضرب
dab = dav	شرك الصياد
dabaş	البحث
dabaşkirin	تلميح، بحث
dabaşdike	يلمح، يبحث
dabelandin = daqurtandin	البلع
dabelandî	مبتلع
dadibelîne	يبتلع
daber	تقدم
daberizîn	التحرش
daberizînhev	هجوم الخصمين على بعضها البعض
dabeş	مقسم عليه
dabeşkirin = belavkirin	تقسيم
dabeşkirî	مقسم
dabeşdike	يقسم
dabeşker	موزع
dabihîstin	سماع
dabirîn	اقتطاع
daborîn	عبور، اجتياز
dabû	اعطى

## DAÇ

daçandin	الزرع، الغرس
daçandî	مزرع مغروس
daçargavan	الركض بالفرس خبياً
daçek	حرف جر (ق. ل)
daçemandin	اخفاء
daçêkirin	اوصى بضاعته
daçêrî-	رعي
daçikandî:	غرس، نصب
daçikandî	مغروس، منصوب
dadiçkîne	يغرس
daçikiya	راسخ
daçinandin = daçinîn	جني الاثمار
daçûn = daketin	النزول، الهبوط

## DAD

dad = giî = gileh = gazend = sitem	الشكوى،
= xeşim = hawar = gazi = dav	الظلم، الصرخة، شرك الصياد، العدالة
dadan = vêxistin	اشعال
dadayî	مشتعل
dadide	يشتعل
dadan = radan = girtin	انصاف، اغلاق

*Ferhenga Qazî ferhengek Kurdî- Erebî/ Erebî- Kurdî* ye û ji aliye *Hafîz Qadî* ve hatiye amadekirin. Di qapaxa dawî de bi 'Erebî bi navê *Qamûsu Hafîz* derbas dibe. Ev ferheng di sala 2005an ji aliyê Weşanên Spîrêzê ve li Duhokê hatiye weşandin. Ferheng bi temamî bi alfabeya latînî û 'Erebî ye û ji 479 rûpelan pêk hatiye (Yıldırım, 2008: 92).

*Ferhengî Mehabad* ji aliyê Gîwî Mukriyanî ve bi Erebî-Kurdî hatiye amadekirin. Ferheng bi alfabeya 'erebî hatiye nivîsîn. Di ferhengê de bi qasê 30 hezar peyv cih girtine (Yıldırım, 2008:100).

D.Cano û M.Şêrgo bi navê *Ferhenga 'Erebî-Kurdî bi zaravayê Kurdmancî* ferhengeke amade kirine. Di sala 1991an de li Beyrutê li paytexta Lubnanê hatiye weşandin. Ferheng bi alfabeya 'Erebî û Latînî hatiye nivîsîn û peyv li gor alfabeya 'Erebî hatine rêz kirin. Ferheng ji 112 rûpelan pêk hatiye. Di ferhengê de bi serenavek *el-lugat-ul Kurdî* behsa zimanê Kurdî, kovara Hawarê kiriye û di derbarê alfabeyê û rêzimanê de agahî daye (D.Cano; M.Şêrgo, 1991: 5-6).

mixabin: heyf	أسف	yane: dîwane	أريكة
sipne: sipêne	أسفين		
qîr: zift	اسفلت	bingeh	أساس: قاعدة
xistin	اسقاط	bêzarî: xem	أسي
cir: rê: şêw	اسلوب	hevtîk: înyek	أسيوع
nav	اسم	mamosta	أستاذ
çemento	اسمنت	meywe çinîn	استثمار
piştgirtin: spartin	إسناد	hilawartin: jibêv	استثناء
beşdari	إسهام	bersivdan	استجابة
bazin	إسواره	vehesîn	استجمام
reş	أسود	jêpîrsîn	استجواب
dîl: benî	أسير	neçarkirin	استحالة
		Femandarî	استحكام
pesin	إشادة: مدح	saloxgêrî	استخبارات
nîşan	إشارة	bikaranîn	استخدام
têrkirin	إشباع	vehêsîn: bihindanî	استراحة
pevketin: lihevixistin	اشتباك	Fîxan: hewar	استغاثة
gûman	اشتياء	havilî: gendî	استفادة
hevparî: hevbeşî	اشترافية	tebat	استقرار
jêderxistin	اشتقاق	serxwebûn	استقلال
bîrkirin	اشتياق	paldan	إستلقاء
vedîtin	اشراق	perjîname	استمارة
vêxistin: pêxistin	اشعال	qêmîş: sivik kirin	استهانة: تهاون
cîgirtin	اشغال	qeşmerî: laxan	استهزاء
kej: sîs	اشقر	zeftkirin: bin destxistin	استيلاء
kevz	اشنة: طحلب	şêr	أسد
		mal: malbat	أسرة: عائلة
derb	أصابة	axur: pageh	استطبل
tiîf	أصابع	efsan	أسطورة
bûn	أصبح	keştîgel: paporgel	أسطول
ravajtin	أصرار: الحاح	dermankirin	استعاف

*Ferhenga Ronak* bi Kurdî-'Erebî ji aliyê Sêfidîn Ehmed Ebdo ve hatiye çêkirin. Ferheng, bi zarava Kurmancî û bi alfabeya Latînî û 'Erebî hatiye nivîsîn. Ferheng ji 943 rûpelan pêk hatiye û tê de nêzê 51 hezar peyv cih girtine. Nivîskar ji bo amadekirina ferhengê ji ferhenga 'Erebî-Kurdî ya D. Cano û Şêrgo, Êzdî û Ezdiyatî Xidirê Silêmên û Xelîlê Cindî, Şîrova Qur'anê bi Kurdî Abdilâh Warlî, Rêbera sê ziman Kurdî- 'Erebî-Îngîlîzî 'Ezîz Reşîd Eqrâyî, Ferhenga Kurdî-'Erebî ya 'Elî Seydo Goranî, Destana (Mem û Zîn) Ehmedê Xani paçvekirin û şîrovekirina Jan Dost, gelek gundî, xwendevan û rewşenbîrên Kurd û yên 'Ereb îstîfade kirine. Ji bo ku peyva zelal û sade ji devê gundiyan tê girtin; zimanê dûrî guhertin û tevlêhevkerinê zimanê wan ê sade ye.

Dîroka amadekirina ferhenga Ronak digihêje sala 1962an. Li ser qapaxa ferhengê bi tîpên 'Erebî al-qamûs al-munîr (*qamûs al-munîr*) hatiye nivîsîn. Ferheng di sala 2006an de li Suriyê Damascusê hatiye [Dar al- Zama lil- Nashr wa-al-Tawzî] weşandin. Li ser qapaxa ferhengê wiha hatiye nivîsîn;

*Qāmūs al-munīr*

قاموس المنير

*Qāmūs Kurdî- 'Arabī*

عربي قاموس كردي

Di ferhengê de di nava peyvan de cureyên peyvan hatine nişê kirin. Mînak; navê kara (n.k), nav (n), sernav (s.n), ji hev (jev), navdêr (n.d), bireser (b.s), jêder (j), hokerê cih (h.c), hokerê demkî (h.d) û hwd.

A J E	RONAK	المعنى	ALĪ.
Ajeqor	شديد الضعف.	Al:ala:beydax.(n)	العلم ، الراية.
Ajeqorkî	شدة الضعف.	Al:algirtin	المسئلة.
Ajkirin	الإتماء ، الإظهار.	Al:algûn	اللون العنابي.
Ajkirî	النمى ، المظهر.	Al:ehl:ahl	اللون الأحمر الفاتح.
Ajo:lêxur	السائق - وتأتي أحياناً على شكل لاحقة.	Alaf:riviya agir:pûhit.(n)	الذهب (للنار).
Ajok	السائق - الحافز.	Alaf û agir	السموم (النار والذهب).
Ajokar:hajoker:şifêr.(n)	السائق.	Alal.(n)	نبات طيب الرائحة.
Ajokarî	مهنة السواقة (القيادة).	Alaldar	حامل الراية.
Ajokarîkirin	ممارسة مهنة السواقة.	Alaldarî	حمل الراية (مهنة).
Ajokarîkirî	ممارس مهنة السواقة.	Alande:sipêde:berbang	الفجر ، الصباح الباكر.
Ajoker	السائق.	Alandin:badan	اللف ، التعقيد.
Ajokerî	مهنة القيادة (السواقة).	Alandî	ملفوف ، معقد.
Ajokerîkirin	ممارسة مهنة السواقة.	Alang	أمام ونظافة (النساء).
Ajot	ساق ، حَثْ ، دَفَع - حَرَثَ.	Alas:çêj:xameşorî.(n)	الطعم ، مذاق.
Ajot:hajot	أثار ، حَرَضَ ، أهاج.	Alaskirin	التذوق.
Ajotin	السواقة - الحرث (الفلاحة) - إهاجة.	Alaskirî	المتذوق.
Ajotin:hajotin	إثارة ، تحريض ، إهاجة.	Alast:alêst.(k)	لَحَسَسَ.
Ajotî	مفلوح (محروث) ، مُسَاق.	Alastin.(j)	اللحس.
Ajotkar:ajotker	السائق ، الزاجر.	Alastî.(n.k)	اللاحس (ملحس).
Ajotkarî	السواقة ، الزجر (مهنة).	Alav:alaf.(n)	الذهب (للنار).
Ajotkarîkirin	ممارسة السواقة.	Alav:ewze:qertraf.(n)	أداة ، جهاز.
Ajotink	الحافز ، الدافع.	Alawî:pêt û agir	اللقى (نار ولهب).
Ajotinek	الحافز ، الدافع.	Alayî	لواء من الجيش تعداد (٤٠٠٠ نسمة).
Ak	لاحقة تشكل من الأسماء صفات.	Alê.(h.c)	حول ، من جهة ، بخصوص.
Akincî:nişîn:xuce:şênî	الساكن ، المقيم ، المواطن.	Alênc.(h.d)	قبيلولة الأضنام.
Akincîtî	المواطنة ، التأهل.	Alinde.(h.c)	الشفق ، الفجر.
Akincîye	مأهول ، مسكون.	Aliq.(n)	البردع (توضع تحت حمالة الصيد).
Aku	التي.	Alî.(k)	لُفٌّ ، تَعْقُد.



#### 2.1.4. Kurdî-Erebî- Farsî

Di sedsala XVIII. de xwendevanê Ehmedê Xanî *Îsmailê Bayezîdî* (1655-1710) ferhengeke Kurdî-Erebî-Farisî bi navê *Gulzar*, ferhengek çêkiriye. Wek ferhenga menzûm a duyem tê zanîn. Ferheng, piranî bi devokên Colemêrgê û Bayezîdî hatiye nivîsandin. Tê de bêje û termên nûser cih girtine û wekî *Nûbehara Biçûkan* ne be jî di medreseyan de wek kitêba dersê hatiye xwendin (Yıldırım, 2008: 73). Di *Îslâm Ansîklopedisiyê* de di bin serenava *Kürtler* de hatiye nivîsîn ku, Îsmailê Bayezîdî, şagirdê Ehmedê Xanî ye û ji bilî çend helbest û xezelan, wî ferhengokeke bi sê zimanî ya Kurmancî-Erebî-Farisî nivîsandiyê. Di derbarê Ferhenga *Gulzarê* de mixabin agahiyên tekûz û berfireh me bi dest nexist.

Qanatê Kurdo di kitêba xwe ya *Tarîxa Edebiyata Kurdî* de, Marûf Xeznedar di kitêba xwe ya *Mêjûy Edebî Kurdî*, Reşid Findî di *Govarî Korî Zanyarî Kurdistan Iraq* de di nivîsa *Pêvaçûnek li ser Zaravesaziyê di Zimanê Kurdî de*, Kemal Burkay di kitêba xwe ya *Kürtler ve Kurdistan*, Kadri Yıldırım di *Nûbehara Biçûkan* de û çend lêkolînerên din, herçend behsa Ferhenga *Gulzar* dikin jî di derbarê naveroka wê de zêdetir agahî nayê zanîn.

Hin mînak ji bêjeyên Ferhenga *Gulzar* ev in: Axaftin, axiftin, êwêrgeh, êwêrîn, pizdan, guhan, bijwîn, bêdadî, bêwecî, pişk, cirrenix, çekme, xanîmal, daberistin, dirav, mezaxtin, suba, solbend, qlopantik, qîvar, lêb, lêbandin, lêbok hwd. (Pertev, 2015: 25-26). (Pertev, Ramazan. (2012). *Mîrsadu'l-Etfal/Şehranê Kodekan*.)

Li Îranê Şêx Mardux di sala 1955-1957an de bi sê zimanan, Kurdî- 'Erebî-Farisî ferhengeke çêkiriye û li Tehranê hatiye çapkirin. Ev ferheng ji du cildan pêk hatiye û tê de nêzê 25 hezar peyv cih girtine. Ferheng bi alfabeya 'erebî hatiye nivîsîn (Yıldırım, 2008: 99).

#### 2.1.5. Kurdî- Farsî/ Farsî- Kurdî

Şêx Muhemmed Kerbelayî bi navê *Mîrsadu'l-Etfal/Şehranê Kodekan* di sala 1912an de ferhengeke Farsî-Kurdî nivîsiye. Di ferhengê de qasê 1350 peyv cih girtine. Nivîskarê vê ferhengê di bin tesîra berhema *Nûbehara Biçûkan* de maye û di beyta donzdemîn de nîşe kiriye (Yıldırım. 2008: 77).

Ji ferhenga *Mîrsadu 'l-Etfal/Şehranê Kodekan* çend beyt mînak;

*Ji piştî "besmele" û " hemd" û "selat"an*

*Du sê lefzê di şêrîn ez luxatan*

*Besmele, hamd ve salavattan sonra ben*

*Îki- üç tatlı sözcük oluşturdum dillerden*

*Me pevxist û di nav hev kirne telfîf*

*Ji bo eclê ku da bit sehl-i texfîf*

*Bu sözcükleri birleştirip iç içe sıraladık*

*Kolay ve pratik olsun diye öyle yaptık*

*Li ser etfal û evladê di Kurdan*

*Lîsan Farisî û meqsedê wan*

*Ki Kürtlerin evlat ve çocukları için Farsça*

*Kolay öğrenilsin ve ulaşılsın her türlü amaca. (Yıldırım. 2008: 77- 78).*

Di ferhengê de risteyên malikan hin caran bi Kurdî hin caran jî bi Farisî dest pê kiriye.

*Zeban ezman, diran dindan, û sermîl dûş, heval yaver.*

*Biçûk e kih, mezin mih, hem sehî, mewzûn e, da mader.*

*Refîq e hemreh, û dana û danîşmend e 'aqilmend*

*Peder bav, û birader çi? bira, û xuşk e hem xaher (Pertev, 2012).*

Mes'ûd Xalid Gulî bi navê *Ferhenga Gulî* ferhengeke Farisî-Kurdî çêkiriye. Çapa yekem di 2002an de ji aliyê Weşanên Spîrêzê ve hatiye weşandin. Di ferhengê de peyvên Farisî hatine rêzkirin û bilêvkirina wan jî bi alfabeya 'Erebî û din ava kavanê de latînî hatiye nivîsîn lê wateya wan bi Kurdî bi alfabeya 'Erebî hatiye nivîsîn. Ferheng 400 rûpelî ye û ji bilî rêzkirina peyvan, di destpêkê de bingehê rêzimana Farisî jî bi Kurdî hatiye ravekirin (Yıldırım, 2008: 90).

Şukrullah Baban di sala 1982an de bi navê *Ferhengî Farisî- Kurdî* ferhengek amade kiriye. Ferheng ji 7500 peyvan pêk hatiye. Ferheng bi alfabeya 'Erebî hatiye nivîsîn (Yıldırım, 2008: 102).

Awrang Murat di sala 1968an de ferhengeke bi Kurdî-Farisî amade kiriye. Ferheng li Tehranê û ji aliyê Weşanxaneya Chehr Pressê ve hatiye weşandin. Ferheng ji nêzê 12500 peyvan pêk hatiye. Çapa yekem ji 348 rûpelan û çapa duyem jî ji 413 rûpelan pêk hatiye. Ferheng bi alfabeya 'Erebî hatiye nivîsîn ( Burkay, 1991: 5).

Sadiq Safizade Borrekayî di sala 1982an de bi navê *Ferhenga Med* bi Kurdî-Farisî ferhengeke çêkiriye. Ferheng li Tehranê û ji aliyê Weşanxaneya Ata yê ve hatiye weşandin. Ferheng bi alfabeya 'Erebî hatiye nivîsîn û ji 210 rûpelan pêk hatiye (Yıldırım, 2008: 103- 104; Burkay, 1991: 5).

'Ebdulrehman Şerefkendî (Hejar) bi nave *Ferhengî Kurdî- Farisî* ferhengeke çêkiriye. Çapa yekem di sala 1990an de ya duyem jî di sala 2002an de li Tehranê hatiye çapkirin. Ji bo ferhengê nêzê 60 hezar peyvên Kurdî berhev dike. Ev ferheng ji du zaravayên Kurdî, Kurmancî û Soranî pêk hatiye. Ferhengên Kurdî ku li Îran û Iraqê hatine çapkirin tevahî bi tîpên Erebî û zaravayê Soranî hatine çêkirin. Ji bo vê yekê Kurdên Tirkîyê bi zêdeyî jê îstîfade nakin (Yıldırım, 2008: 103- 104; Burkay, 1991: 5).

Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Farisî ji aliyê Koma Kurdîya Kurmancî (Azad Makûyî, Haşîm Mehmûdî, Şehnaz Omerzade, Nasir Ecemî, Mohsin, Qulîzade, Kejal Padaş, Efsûn Yûsifi) ve hatiye çêkirin û berhev kirin. Ferheng di sala 2012an de li Tehranê hatiye weşandin. Di ferhengê de bi qasê 7700 peyv cih girtine û ji 239 rûpelan pêk hatiye. Kurmanciya peyvên di ferhengê de bi alfabeya Latînî, Farisiya wan jî bi alfabeya 'Erebî hatiye nivîsîn (Koma Kurdîya Kurmancî, 2012: 1-2). Li ser qapaxa ferhengê wiha hatiye nivîsîn:

*Pêşkêş bo ruhê Celadet Bedirxan, zimannasê  
mezin û danerê rîya nû ya Kurdîya Kurmancî .*

تقديم به روح جلادت بدرخان زبانشناس بزرگ و بنیانگذار راه  
نوین کردی کرمانجی

T/t نو تلفظ دارد	Tê ط / ت	ط / ت	Tirs/Teşî	تیرس / توك
U/u	ئو	ئو	Ustî	گوردن
Û/û	او	او	Şûştin	شستن
V/v	ف	فا	Vala	خالی
W/w	و	و	We	شما
X/x	خ	خ	Xanî	ساختمان
Y/y	ی	ی	Yek	يك
Z/z	ظ / ض / ذ / ز	ظ / ض / ذ / ز	Ziman	زبان

Tîp حرف	Navê tîpê اسم حرف	Dengê tîpê صدای حرف	Mînak	مثال
A/a	ا	ا	Av	آب
B/b	ب	با	Ba	باد
C/c	ج	چ	Car	بار / دفعه
Ç/ç	چ	چ	Çar	چهار
D/d	د	ذ	Dar	درخت
E/e	ع / ا	ع / ا	Ez	من
Ê/ê	ع / ا	ع / ا	Êvar	عصر / شب
F/f	ف	فا	Firotin	فروختن
G/g	گ	گا	Garis	ذرت
H/h	ه / ح	ح / ه	Hesin	آهن
I/i	ء	ء	Istêr	ستاره
Î/î	ای	ای	Îro	امروز
J/j	ژ	ژ	Jar	لاغر
K/k دو تلفظ دارد	ک	ک	Kal/Ketin	پیرمرد / افتادن
L/l	ل	ل	Loma	به همین خاطر
M/m	م	م	Mêtin	مکیدن
N/n	ن	ن	Nasîn	شناختن
O/o	ا	ا	Ol	دین
P/p دو تلفظ دارد	پ	پا	Par/Pez	سهم / گوسفند
Q/q	ق	ق	Quran	قرآن
R/r	ر	ر	Reş	سیاه
S/s	س / ص / ث	ث / ص / س	Sivik	سبک
/Şş	ش	ش	Şev	شب

*Ji Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Farisî ji aliyên Koma Kurdîya Kurmancî (Azad Makûyî, Haşîm Mehmûdî, Şehnaz Omerzade, Nasir Ecemî, Mohsin, Qulîzade, Kejal Padaş, Efsûn Yûsîfî) rûpelek mînak.*

Rêketinname: توافقنامه  
 Rêketin: به راه فتادن / شروع شدن  
 Rêkirin : فرستادن  
 Reklam: آگهی تبلیغاتی / آگهی های تجارتي / تبلیغ  
 Reklam kirin: تبلیغ کردن / آگهی دادن / اعلان کردن / انتشار دادن  
 Reklamger: آگاهی دهنده / اعلان کننده  
 Reklamgerî: تبلیغ / اعلان / آگهی  
 Rêkûpêk : صحیح و دقیق / مفصل / منظم  
 Rêxistinbar: تنظیم کننده  
 Rêxistin: سازمان / تشکیلات  
 Rêman: اندیشه / نظریه / خیال / ادراک / مفهوم  
 Remtele: ولگرد / اوباش / گردن کلفت / دیوانه  
 Rênan: مراقبت کردن / رسیدگی کردن / توجه کردن  
 Rênas: راهنما / راه بلد  
 Renc: محنت / کار پر زحمت رنج  
 Rêncber : چوپان / غلام / نوکر / زحمتکش  
 Rêncberî: چوپانی / نوکری  
 Rencîde: آزرده شده / مجروح / جریحه دار / مصدوم  
 Rencîde kirin : آزرده خاطر کردن / اذیت کردن  
 Rende: رنده  
 Rende kirin: رنده کردن / ساییدن / خراشیدن  
 Reng: رنگ  
 Rewş: حالت / وضعیت  
 Reng dan: رنگ دادن / رنگ باختن / سفید شدن  
 Reng kirin: رنگ کردن  
 Reng lê xistin: رنگ کردن  
 Rengareng: رنگارنگ  
 Rengbirûskî: به رنگ صاعقه  
 Rengdar: با رنگ / رنگی  
 Rengdêr : صفت  
 Rengdêra çawahîn : صفت کیفی  
 Rengdêra pêveber : صفت توصیفی  
 Rengdêrên nebinavkirî : صفات نامعین

*Ferhenga Kurdiya (Kurmancî)-Farisî* ji aliyê Koma Kurdiya Kurmancî (Elî Paksêrêşt, Şehnaz Omerzade, Haşîm Mehmûdî, Sarya Aran, Karwan Koçer, Mesur Şemsî, Nasir Ecemî, Mohsin, Qulîzade, Şîrîn Doletpûr, Kejal Padaş, Efsûn Yûsifi) ve hatiye çêkirin û berhev kirin. Ev ferheng pêşî bi qasê 122 rûpelan peyre hatiye berfireh kirin û 245 rûpelan pêk hatiye. Ya dawî ku me bi dest xist gelek hatiye berfireh kirin û ji 457 rûpelan pêk hatiye. Mînak di çapa yekem de bi tîpa "R" yê qasê 450 peyv cih girtine lê di çapa dawî de jî bi qasê 870 peyv cih girtine. Di sala 2012an de li Tehranê hatiye weşandin. Di ferhengê de bi qasê 27 hezar peyv cih girtine. Peyvên ku di ferhengê de Kurmanciya wan bi alfabeya latînî, Farisiya wan jî bi alfabeya 'erebî hatiye nivîsîn (Koma Kurdiya Kurmancî, 2012: 1-3).

#### **2.1.6. Kurdî- Îngîlîzî/ Îngîlîzî-Kurdî/ 'Erebî-Îngîlîzî-Kurdî**

Kurdnasekî Amerîqayî Ernest Nasseph McCarus li ser devoka Kurdiya Silêmaniyê *Ferhenga Kurdî-Îngîlîzî* çêkiriye. Ferheng di sala 1967an de ji aliyê Weşanên Zanîngeha Michiganê ve hatiye weşandin. Bi alfabeya 'Erebî hatiye nivîsîn (Burkay, 1991:5).

Margaret Khan bi navê *Kurmanji-English, English-Kurmanji Lexicon* ferhengeke Kurdî- Îngîlîzî/ Îngîlîzî- Kurdî amade kiriye. Ev ferheng di sala 1974an de li Ann Arbor University of Michiganê hatiye çapkirin. Ev listeya peyvên li derdorê Amedê, Farqînê (Sîlvan) ji aliyê Margaret Khan ve hatiye kom kirin (Chyet, 2003: XIII).

Li Iraqê zimannasê Kurd Teyfîq Wehbî û Kurdzanê Îngîlîz Cecil John Edmons, bi navê *A Kurdish-English Dictionary* bi hev re Ferhenga Kurdî-Îngîlîzî amade kirine û di sala 1966an de li Londonê çapkirine. Di ferhengê de 10 hezar peyv cih girtine. Ferheng di sala 1996an de dîsa hatiye çapkirin. Ev ferheng di sala 1970an de ji nava Weşanên Zanîngeha Oxfordê jî derketiye. Bi alfabeya latînî hatiye nivîsandin (Akin, 2013: 61; Yıldırım, 2008: 100).

'Eziz Amindarov, di sala 1994an de ferhengeke Kurdî-Îngîlîzî/Îngîlîzî-Kurdî çêkiriye. Di ferhengê de qasê 8 hezar peyv cih girtine. Ev ferheng 313 rûpelan pêk hatiye. Ferheng li New Yorkê ji aliyê Hippocrene Booksê ve hatiye çapkirin (Chyet, 2003: XIV).

Ferhenga Micheal L. Chyet bi navê *Kurdish-English Dictionary (Ferhenga Kurdî-Îngîlîzî)* di sala 2003an de ji nav Weşanên Yale University derketiye û li Londonê hatiye çap kirin. Ferheng ji 848 rûpelan pêk hatiye. Ev ferheng di nava ferhengên Kurdî de ji

hêla etîmolojiyê ve gelek girîng e. Lewra Micheal L. Chyet bi awayek berfireh li ser literaturê xebitiye û li gelek herêman geriya ye peyvên Kurdî berhev kirine. Ji aliyê Weşanxaneyê Yale University Press ve li Emerîqayê hatiye weşandin. Gotinên Kurdî bi tîpên latînî û ‘erebî hatine nivîsandin û bi şêweyekî berfireh wateya wan a bi zimanê Îngîlîzî hatiye nivîsandin (Chyet, 2003: XIV).

Çelebî, Ferdîdon û Danko Sipka; Ferhenga Kurdî-Îngîlîzî di sala 2002an de li çapxana Dunwoodyê hatiye çapkirin (Chyet, 2003: XIV).

Ferhenga Rizgar Baran ya Kurdî-Îngîlîzî/Îngîlîzî-Kurdî di sala 1993an de li Londonê hatiye çapkirin. Ferheng ji du beşan pêk hatiye, di beşa Kurdî-Îngîlîzî de 25 hezar peyv, di beşa duyem ya Îngîlîzî-Kurdî de jî 18 hezar peyv cih girtine. Ferheng ji 400 rûpelan pêk hatiye (Yıldırım, 2008: 89).

Salah Saadallah bi navê *Saladin's English-Kurdish Dictionary* ferhengeke Îngîlîzî-Kurdî çêkiriye. Ferheng pêşî di sala 1998an de bi alfabeya ‘Erebî û lî Bexdadê hatiye çapkirin. Ferheng ji 1183 rûpelan pêk hatiye. Çapa duyem ji bi amadekariya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û Weşanên Avesta yê ve di sala 2000an de li Stenbolê hatiye çap kirin. Di ferhengê de 72 hezar peyv hene û ji 1477 rûpelan pêk hatiye. Reşo Zîlan û Kendal Nezan alîkarî kirine. Piraniya peyvên bi Kurmancî, lê peyvên Soranî jî cih girtine (Chyet, 2003: XV; Akîn, 2013: 64).

Şhafîq Qazzaz bi navê *The Sharezoor Kurdish-English Dictionary* ferhenga Kurdî-Îngîlîzî amade kiriye. Ferheng ji 601 rûpelan pêk hatiye û tê de 12 hezar peyv cih girtine. Di sala 2000an de li Hewlêrê û ji aliyê Weşanên Arasê ve hatiye çapkirin. (Akin, 2013: 64).

*Ferhenga Peyvên Dadwerî ya Kurdî (Kurmancî)-Îngîlîzî/Kurdish-English Dictionary of Legal Terms* bi navê *Mafname* ji aliyê Husein Muhammed ve hatiye çêkirin. Ferheng di sala 2000an de hatiye amadekirin. Hemû peyvên wî yên heyî ji Kurdî hatine wergirtin. Ew ne peyvên çêkirî ne lê peyvên wisan in ku yan di nav gel de hatine bihîstin yan jî di nivîsan de hatine dîtin û hatine berhev kirin. Ferheng ji 38 rûpelan pêk hatiye û bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn (Muhammed, 2000: 1-6).

Husein Muhammed di sala 2001an de ferhengokeke Kurdî (Kurmancî) Îngîlîzî/Kurdish-English ya bi navê *Ferhengoka Peyvên Wêjeyî/Vocabulary of Literary Terms* amade kiriye. Ferheng ji 11 rûpelan pêk hatiye û bi qasê 450 peyv tê de cih girtine.

Kemal Celal Xerîp, di sala 1974an de bi navê *Ferhenga Zanyarî* bi ‘Erebî-Îngîlîzî-Kurdî ferhengeke amade kiriye. Xerîp vê ferhengê bi alfabeya ‘Erebî nivîsiye, di sala 1975an de jî li ser ferhenga zanyarî ya wêendar xebitiye. Ev ferheng ji sê cildan pêk hatiye. Cilda yekem ji 438 rûpelan, cilda duyem jî di sala 1979an de ji 403 rûpelan pêk hatiye. Cilda sêyem ji 420 rûpelan pêk hatiye û hemû cildên ferhengan bi alfabeya ‘erebî hatiye nivîsîn (Burkay, 1991: 5; Yıldırım, 2008: 102-103).

Ferhenga *Kurdish Guide With Dictionary* ji aliyê Weşanên Dozê ve hatiye çapkirin. Ferheng, di sala 1998an de hatiye weşandin. Ferheng ji 208 rûpelan pêk hatiye û bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn. Ferheng li gor hin babetan hatiye çêkirin û ji du beşan pêk hatiye. Di beşa yekem de bê pergal yanî tevlihev hatiye nivîsîn, di beşa duyem de jî bi serenava *Dictionary- Ferheng* û bi sîstema alfabeyê hatine rêzkirin (Yıldırım, 2008: 89).

Ferhenga, bi navê *English-Kurmanji, Kurmancî-Îngîlîzî Word List* di sala 1996an de ji aliyê Şîrîn ve hatiye amadekirin. Pey re di salên 2002 û 2005an hatiye berfireh kirin. Ev ferheng herî dawî di sala 2006an de li Dohukê, ji aliyê Weşanxaneyê Spîrêzê ve hatiye weşandin. Ferheng ji du beşan pêk hatiye, di beşa yekem English-Kurmancî de bi qasê 3700 peyv cih girtine, di beşa duyem a Kurmancî-Îngîlîzî de jî bi qasê 3200 peyv cih girtine. Ferheng ji 361 rûpelan pêk hatiye. Nivîskar li gor Behdînî Dialectê çêkiriye û bi alfabeya latînî hatiye çap kirin. Bi taybetî ji bo yê ku Îngîlîzî dizanin fêrê zaravayê Behdînî bibin hatiye amade kirin (Şîrîn, 2006:I- IV). Di ferhengê de behsa bilêvkirina tîpên zimanê Kurdî û Îngîlîzî jî hatiye kirin. Di ferhengê de hinek peyv wekî di nava gel de çawa hatine bikaranîn bi wê awayê nehatiye bikaranîn. Wek mînak; di nava gel de bi Tirkî "yıl" di Kurdî de jî bi gelemperî "meh" tê gotin. Lê di ferhenga Şîrîn de bi vê awayê derbas dibe:

*"heyv(f): month (heyva bêt, next month) (heyva têt, next month) (heyva çû, last month; a month ago) (Şîrîn, 2006: 250). Di ferhengê de wekî hevok jî mînakan daye; ji xew rabin, ji xew rabe: to get up [after sleeping]; ji nişke kê ve: suddenly (Şîrîn, 2006: 262).*

Ferhenga Fossum bi navê *A Practical Kurdish Grammar* de di sala 1919an de bi Kurdî- Îngîlîzî ferhengokek di gramatîka xwe de çêkiriye. Ferheng bi alfabeya 'Erebî-Latînî hatiye nivîsîn. Ferheng 280 rûpelan pêk hatiye. Di ferhengê de nêzê 4 hezar peyv cih girtine. (Fossum, 1919: 1- 280). Fosûm vê xebatê ji bo hînbûna zarên Kurdî çêkiriye.



Di sala 1922an de Cerdîn, gramatîka zimanê Kurmancî ya kurt de jî çap kiriye. (Kurdo, 1960: 17-19).

276	A PRACTICAL KURDISH GRAMMAR
<p>ل (l') prep. from, in, on; a contraction of.</p>	<p>her or it; (2) there.</p>
<p>لازم (lāzim) necessary, important.</p>	<p>لی خورن (le khōrin) to drive; impera. لی خوری</p>
<p>لاي (lāī) direction, side of, beside.</p>	<p>لی دان (le dān) to beat, to strike; impera. لی بده</p>
<p>لايق (lāīq) worthy, deserving, suitable, fit.</p>	<p>لیره (lerā) here.</p>
<p>لبر (labar) on account of, because of, for.</p>	<p>لیفه (lefa) blanket, quilt, cover.</p>
<p>لسر (la-sar) on, at, over, against.</p>	<p>لیوی (lewī) Levi, a levite</p>
<p>لکن (lakin) with, at, beside; contraction of له کن</p>	<p>مان (man) to remain; impera. بمینه</p>
<p>لکوی (l'kūe) where.</p>	<p>محبوب (mahabūb) beloved.</p>
<p>لنیو (l'neū) in, among, between.</p>	<p>مال (māl) (1) house, home; (2) goods, riches.</p>
<p>لنیوو (l'neū-ū) among you.</p>	<p>مانگا (māngā) cow.</p>
<p>له (lā) from.</p>	<p>ماقول (māqōl) respectable, famous</p>
<p>له سر (lā sar) about, concerning, against.</p>	<p>محبت (mahabat) love, affection.</p>
<p>لو (laū) from this, from that; contraction of له او</p>	<p>مر (mar) sheep.</p>
<p>لوی (lawāī) there, from there; contraction of له اوی</p>	<p>مردن (mirdin) to die; impera. بمری</p>
<p>لی (le) (1) on him,</p>	<p>مروار (mirwār) pearl.</p>
	<p>مریشک (mirīshik) hen.</p>

Ji ferhenga A Practical Kurdish Grammar/Ferhenga Kurdî- Îngîlîzî- (Fosum) rûpelek mînak

### 2.1.7. Rusî- Kurdî /Kurdî- Rusî

Peter Lerch di sala 1858an de ferhengoka Kurdî-Rûsî li ser hîmê zarên Kurmancî û Zazakî çêkiriye. Ferhengok li St. Petersburg ê hatiye çapkirin. Peter Lerch di ferhengokê de xeberên Kurdî û yên zimanê Îranî yên cuda beranberî hev kiriye. Ferhengoka P. Lêrx de gelek meselên Kurdî nerast û xelet tercumekirî hene. Lê ferhengok li Rûsistanê di wextê xwe de gelek bi qîmet û giranbiha bûn ji bo hînbûna zimanê Kurdî. Ferheng ji 234 rûpelan pêk hatiye û bi alfabeya latînî- ‘erebî- kirîlî hatiye nivîsîn.

161	
<p><b>māl</b>, (arab. مال), <b>Eigenthum</b>, Haus.  <b>G:</b> mal, mala <i>abitazione</i>; Vc. № 168: малъ.  <b>malxôe</b> gund, Dorfältester.  <b>G:</b> malkoe <i>ministro</i>.  <b>mält</b>, fegte.  <b>G:</b> bemälum, malèst <i>scopare</i>.  <b>demálim</b>, (ich) fege.  <b>me</b>, <i>obliquèr Casus von em</i>.  <b>meh</b> = mah.  <b>méheki</b> duduân, den zweiten Monat.  <b>méhke</b>, einen Monat.  <b>mehín</b>, Stute, 29.12.  <b>G:</b> majina <i>cavalla</i>; Ber. III, 81: ماگینی maguini.  <b>Vgl. npers:</b> ماديانه, ماديان.  <b>mēlîk</b>, Tante (Vaterschwester).  <b>G:</b> metā <i>zia paterna</i>.  <b>mēš</b>, Schaaf, s. mī.  <b>Vgl. npers:</b> ميش.  <b>mēše</b>, Wald, 18.8.  <b>Vgl. np:</b> بیشه, tâl: وشه više (R.)  <b>mezél</b>, Grabmal.  <b>mezín</b>, gross.  <b>G:</b> mazén <i>ampio</i>; Vc. № 206: мазиль; GLD: masil; Ber. III, 75 مزین mazin, مزین mazan; cf. PZ. III, 60; JC: mathista (Bnf. Gl. s. v., Opp. XVII, 537, 544, 556); altb: maz (s. Brekh. Gl. s. v.).  Forsch. üb. d. Kurden. Abth. II.</p>	<p><b>Mēzín</b>, ein Sternbild; s. Abth. I. S. XVI.  <b>merû</b>, Mann, Mensch.  <b>G:</b> meróvi <i>persona, uomo</i>; Vc. № 14: муррѣ; GLD: muruf; KF: maruw (<i>Ehemann</i>); Ber. III, 77: مرو morov, mrov; s. PZ. III, 31, 52.  <b>merû'i</b> min, mein Verwandter.  <b>me</b>, <i>obliquèr Casus der 1. Pers. sing.</i>  <b>mei</b>, Wein.  <b>G:</b> mèi <i>vino</i>; GLD: mei; s. PZ. III, 61.  <b>Vgl. altb:</b> ميه (Bopp, Vgl. Gr. 173); <b>npers:</b> می.  <b>meihāné</b>, Weinhaus.  <b>G:</b> meikāna <i>osteria</i>.  <b>Vgl. npers:</b> می خانه.  <b>meikiāvi</b>, Biber.  <b>meíya</b>, Weibchen (der Thiere).  <b>meit</b>, (arab. میت), Todter, Leiche.  <b>meimún</b>, Affe.  <b>G:</b> méimùn <i>simia</i>; s. PZ. IV, 17.  <b>Vgl. npers:</b> ميسون.  <b>meivé</b>, Frucht.  Vc. № 134: мивегāн.  <b>Vgl. npers:</b> ميوه.  <b>meqjlik</b>, kleine Casserolle aus Kupfer, in der Eier gekocht werden.  <b>mend</b> = mā.  <b>mēš</b>, Fliege.</p>

Ji ferhenga Peter Lerch rûpelek mînak r:161.

Îvan Ömer Farizov di sala 1957an de ferhengeke bi navê *Russko-Kurdskiyi/Ferhenga Ûrisî-Kurmancî* li Moskovayê çêkirîye. Tê de nêzê 30 hezar peyv cih girtine û ji 781 rûpelan pêk hatiye. Di sala 1994an de Mehmet Demir ferhenga Farizov wergerê Tirkî-Kurdî dike û li Enqerê di Weşanxaneya Ozgeyê de diweşîne. Ferhenga bi Tirkî-Kurdî ji 344 rûpelî pêk hatiye. Redaksiyona wî jî Timurê Xelîl Muradov kiriye. Ferheng bi her du zimanan jî peyvan dide nasîn û kandîdatê ilmê û tarîxî ye. Çapa yekem a ferhengê bi alfabeya Kirilî çapa duyem jî bi alfabeya Latînî hatiye çêkirin. Timurê Xelîl Muradov wexta ferhengê redexte dike bi destûra Îvan Ömer Farizov hinek gotin li zêde dike.

Hin xeberên ku ji çapa yekem ya sala 1957an hatiye rexne kîrin ev in:

*Ferhenga Îvan Ömer Farizov li ser hîmê xeberên kurdên Ermenîstana Sovêti hatiye çapkirinê, lê bi herfên kurdên Sovêti ne hatiye çapkirinê, bi herfên latînî yên kurdên Sûriyê çap bûye. Di pêşgotina ferhengêda Î.O.Farizov dinivîse, ku bona çêkirina ferhenga xwe ewî edebyeta kurdî ya sovêti û dereve(bîyanî) daye xebitandinê. Lê matêriyalê ferhengê nişan dike, ku ewî ev kanî nedane xebitandinê. Di ferhenga wîda gelek xeberên rûsî hatine tercimekirinê ne ku bi wan xeberên kurdî, yên ku edebyeta kurdîda hene, lê hatine tercime kirine yanê bi xeberên teze çêkirî, yan bi şirokirinê, yanê jî bi arîkarîya xeberên biyanî(dereva), yê ku bi herfên kurdî hatine nivîsandinê. Ji wê der di ferhengêda gelek tercimên nerast û xelet hene (Kurdo, 1960: 22).*

Îvan Ömer Farizov li Yekîtiya Sovyetan, li herêmên ku Kurmancî lê dijîn de digere û di vê gerê de gelek peyvan berhev dike. Ferheng bi zaravayê Kurmancî hatiye çêkirin. Di derbarê rastnivîs û fonetikê de ji ber ku standardek tunebûye wê demê hin peyv şaş hatine nivîsandin.

*Koparmak. (f) getandin; ipliği-şirît getandin. G (q)etandin* (Ruşçadan çeviri, Demir,1994: 178).

Di ferhengê de peyvên gelek orjînal jî cih girtine.

*eşik. a. sivder(d), nedewana pêşiya derî, şêmik (d).* (Ruşçadan çeviri, Demir,1994: 105).

Ferhenga Ç. X. Bakoev ya Kandîdatê Îlmê Fîlolojîyê di sala 1957an de bi zimanê Kurdî-Rusî li Moskovê hatiye çapkirin. Ferhenga Ç. X. Bakoev bi redaktoriya Îosîf

Abgaroviç Orbêlî hatiye çapkirin. Ev ferheng ferhengeke ji ferhengên zarê Kurdên Ermenîstanê çêtir û baştir e. Di ferhengê de bi qasî 14 hezar peyv hene. Li gor hin ferhengên ku li Rusyayê hatiye çap kirin tê zanîn ku tercumeyên wê rastin û bi piraniya xwe ve bêşik in. Di vê ferhengê de xeysetnivîsa xeberan ya gramatîkê hatiye nîşan kirin; ev şixulekî baş e, çimkî di ferhengên pêşîn de xeysetnivîsa xeberan ya gramatîkî nehatiye nivîsandin. Ferhenga Ç. X. Bakoev de bi nîşanên minasib kategoriya navan ya 'eslî jin û mêr, lêkerên derbasbûyî û yên derbasnebûyî û binyatên wan hatine nîşan kirin. Bi alfabe ya kirilî hatiye nivîsandin û ji 618 rûpelan pêk hatiye (Kurdo, 1960: 22).

Emîne 'Evdal bi navê *Xebername Kurdiye Rastnivîsandinê* ferhengeke ji bo rastnivîsê çekiriye û di sala 1958an de li Rewanê çap kiriye. Di ferhengê de nêzê 7 hezar peyv cih girtine û bi alfabe ya kirilî hatiye nivîsandin (Burkay, 1991: 6; Yıldırım, 2008: 79).

Li Sovyetê di warê ferhengê de gelek xebat hatine çêkirin. Qanatê Kurdo, du ferhengên bi zimanên Kurdî-Rusî amade kiriye. Yek alîkariya Zera Usiv bi zaravê Soranî ya din jî bi zaravê Kurmancî nivîsiye. Ferhenga ku me bi dest xist tê de nêzê 34 hezar peyv cih girtine. Her du jî di sala 1960an de li Moskovayê hatine çapkirin. Gramatîka zimanê Kurdî li rex ferhengê kurt hatiye rêzkirinê. Qanatê Kurdo, Kandîdatê Zanîstî yê Fîlolojiyê, çekiriye û li hev aniye:

*Di ferhenga xweda min lêksîka jîyînê, ya rênçberîyê (gundîtîyê), ya edebiyetîya zimanê nika (êsta) û ya rojname û kovarên bi zarê kurmancî nivîsîne û çapkirine. Ez xerêq bûm, ku xeberên kurdan yên tomerî bikim nav ferhengê. Min xeberên nizamîya cime'tî yên jîyîna kurdan li qurna XIX kirine nav ferhenge xwe. Min têrmînên dîn û pûtperestîyê, yên kevn ku folklorêda hene, kirine nav ferhengê. Xên ji wê yeke min xeberên ji ber zimanê cirana (cînanan), yên înglîsî, fransîzî û rusî, yên ku zûda ketine nav zimanê me, kirine nav ferhengê. Min wisa jî têrmînên ulmî (zanîstî), yên cime'tî ku zûda di edebiyeta meda heneî kirine nav ferhengê. Min wisa jî xeberên tercimekirî yê nêologîzmê, ku vê axirîyê ketine nav edebiyeta me, kirine nav ferhengê. (Kurdo, 1960: 23).*

Di ferhengê de navên qebîleyên Kurdan, navên milletên Rojhilata Nêzik, navên merivan, yên ku fikra wan xweserî hene, navên şehran, navên çiya û çeman û yên welatan cih girtine. Ji bo amedekirina vê ferhengê materyala edebiyatê, yê folklorî, yên ferhengên

Kurdî referans hildaye. Qanatê Kurdo ji bo amedekirina vê ferhengê ji nivîsên A. Jaba, A. Sosîn, P.Lêrx, H. Cindî, R. Lêsko, Cerdîn û Soûn îstîfade kiriye (Kurdo, 1960: 23).

Ferhenga Qanatê Kurdo ji 900 rûpelan pêk hatiye. Di qada peyvên ku bi zaravayên Behdînanî û Soranî hatiye nivîsîn de piranî ji ferhenga Jaba û Justî îstîfade kiriye. Di nava ferhengên Kurdî-Rusî de ya herî berfireh tê zanîn.

<b>СПИСОК УСЛОВНЫХ СОКРАЩЕНИЙ</b>	
<b>Nav û nişanêd şertî yêd kurt nivisandî</b>	
<i>ав.</i> — авиация — firindevanî, firgokevanî	<i>грам.</i> — грамматика — gramatika
<i>анат.</i> — анатомия — anatomî (ulmê hînbûn û zanbûna beşêd (parêd) hindurê canê meriv û heywanan)	<i>дип.</i> — дипломатический термин — têrmîna dîplomasîyê
<i>астр.</i> — астрономия — astronomî (ulmê hînbûn û zanbûna bedena ezman)	<i>ед.</i> — единственное число — jî-mara yekanî (yekûm)
<i>бот.</i> — ботаника — botanîka (ulmê hînbûn û zanbûna hêşnayuîyê)	<i>жс.</i> — женский род — navê ser eslî jî
<i>бран.</i> — бранное слово — хебегга бее'деб	<i>знач.</i> — значение — fikir, me'nî
<i>букв.</i> — буквально — (me'na) herf bi herf gotî	<i>зоол.</i> — зоология — zolojî (ulmê hînbûn û zanbûna heywanêd dinyaê)
<i>вводн. сл.</i> — вводное слово — хебегга берга (ber...ra) gotî	<i>и. д. жс.</i> — имя действия женского рода — navê kirinê yê ser navê eslî jî (mê)
<i>вежл.</i> — вежливое выражение — gotina maqûlî	<i>и. с. жс.</i> — имя состояния женского рода — navê bûyinê yê ser navê eslî jî (mê)
<i>взаимн.</i> — взаимное местоимение — cînavê hevduîyê (yekudu)	<i>ист.</i> — история — tarîx
<i>воен.</i> — военное дело, военный термин — îşê herbî, termîna şer (herbî)	<i>и т. п.</i> — и тому подобное — û yêd mîna wan, û yêd weke wan
<i>возвр.</i> — возвратное местоимение — cînavê serxwe	<i>книжн.</i> — книжный стиль — terzê (teherê) nivîsandinê di kitêbanda
<i>вр.</i> — время глагола — wextê fêlê	<i>косв.</i> — косвенный падеж — halê tewandî (tewang)
<i>в разн. знач.</i> — в разных значениях — bi fikira (me'nîya) cuda-cuda	<i>л.</i> — лицо — dêman, sifet
<i>вульг.</i> — вульгарное слово, выражение — хебегга бее'деб, gotina бее'деб	<i>л.</i> — либо — ya, yan
<i>г.</i> — 1) год — sal; 2) город — bajar	<i>лингв.</i> — лингвистика — zimanzanîn, zimannasî
<i>геогр.</i> — география — cîografi, gêografi	<i>личн.</i> — личное местоимение — cînavê dêman (sifetan)
<i>гл.</i> — глагол — fêl	<i>мат.</i> — математика — matematîka
	<i>мед.</i> — медицина — ulmê tebîbî (bijişkî)
	<i>межд.</i> — междометие — heyholan
	<i>мест.</i> — местоимение — cînav, zemîr

*Ji ferhenga Qanatê Kurdo rûpelek mînak r:34*

Ferhenga M.U. Khamoian Kurdî-Rusî bi navê *Kurdsko-Russkii Frazeeologicheskii Slovar* di sala 1979an de hatiye amade kirin û li Êrîvanê hatiye çap kirin. Di nava vê ferhengê de têgehên biyanî û îdyomên pisporî cih girtine. Ji bo têgehên folklorî jî

berhemeke girîng e. Ferheng ji 273 rûpelan pêk hatiye û tê de nêzê 8 hezar peyv cih girtine. Ferheng bi alfabeya kirîlî hatiye nivîsîn (Chyet, 2003: XII).

Ferhenga Basil Nikitin bi navê *Kratkii Russko-Kurdskaa Voennyi Perevodchik* di dema şoreşa yekemîn de di sala 1919an de ferhengê amade kiriye û tê de piranî peyvên leşkerî cih girtine (Yıldırım, 2008: 78).

Maximo Xemo, bi Kurdî-Rûsî ferhenga biwêjan amade kiriye. Di ferhengê de nêzê 8 hezar biwêj cih girtine. (Yıldırım, 2008: 80). Maxsimê Xemo vê ferhengê ji bo îdîomên Kurdî çêkiriye û di sala 1983an de li Moskovê hatiye çap kirin (Burkay, 1991:6).

Rêh di sala 1870an de gramatîka kurt ya zimanê Kurdî çap kiriye. Di Gramatîka xwe da ferhengoka Kurdî-Îngîlîzî nivîsiye û di ferhengokê de bi qasî 1.600 peyv cih girtine. Albert Socin di sala 1890an de ferhengoka Kurdî-Almanî çap kiriye. Xeberên Kurdî bi tîpên 'Erebî nivîsiye û paşê transkrîpsiya wan bi tîpên Latînî daye. A. Êgîazarov di nivîsara xwe de metnên Kurdî aniyê ber çavan û tercuma wan ya bi zimanê Rûsî rasterast nivîsiye. Pey re ji wan metnan ferhengokên Kurdî- Rûsî û Rûsî-Kurdî çap kirine. Di ferhengoka pêşî de bi qasî 3.000 xeber hene, di ya paşî de jî bi qasî 4.000 xeber hene. Ev ferhengok xeberê zarê Kurdên 'Erîvanê tînin ber çav. Soûn, di sala 1913an de ferhengoka Îngîlîzî-Kurdî di gramatîka xwe de çap kiriye. Di ferhengokê de nêzê 4.000 xeber cih girtiye. Xeberên ku di ferhengê de cih girtine nêzikbûn û dûrketina lêksîka zarên Kurdî yê Bakûr nîşan dide. Di ferhengoka Soûn de pêşî xeberên Îngîlîzî pey re jî yê Kurdî hatine nivîsandin.

#### **2.1.8. Ermenî- Kurdî**

Sîyabendov A. Çaçanî di sala 1957an de ferhengeke Ermenî-Kurdî li Rewanê çap kiriye. Di ferhengê de nêzê 23.000 peyv cih girtine. Bi alfabeya Kirilî hatiye nivîsandin (Burkay, 1991: 6; Yıldırım, 2008: 79).

#### **2.1.9. Kurdî- Îtalî**

Garzonî, ji wan Kurdnasê pêşîn e ku li ser rêzimana Kurdî xebitiye û di sala 1787an de li bajarê Romayê ferhengê bi navê Rêziman û Ferhenga Zimanê Kurdî çap kiriye û xwe daye nasîn. Piştî ku 60 sal ji ser berhema Rêziman û Ferhenga Zimanê Kurdî derbas dibe li ser zimanê kurdî ji vekolînên zanîstî yê ewil yek jî ji aliyê zimannasên Almanî E. Rödîper û A. F. Pott ve tê kirin. Ev her du zimannasên Almanî yê navdar berhema bi navê "Vekolînên Li Ser Kurdan" (Kurdische Studien) nivîsandine. Yanê cara ewil têgeha

“Vekolînên Li Ser Kurdan” di vê berhemê de hatiye bikaranîn paşê jî bi taybetî di sala 1934an de li Yêrîwanê bi Kongreya Kurdolojiyê ya I. ve êdî peyva Kurdolojiyê jî di çavkaniyan de cih digire û tê bikaranîn. Di vê pirtûkê de beşa ferhengê 220 rûpelî ye û 4600 peyv tê de cih girtine. (Rohat, 1991:5-10).

#### **2.1.10. Kurdî- Fransî**

Zimannasê bi esle xwe Polonî M. Auguste Jaba ferhengeke bi Kurdî-Fransî amade kiriye. Di sala 1879an de li bajarê Petersburgê Alman Ferdînannd Justî li ser vê ferhengê xebitiye û çap kiriye. Lê F. Justî ji bo hinek peyvên ji xebatên Rîç, Klaprot, Xozdko, Lêrx û yên din îstîfade kiriye û li ser ferhenga Auguste Jaba zêde kiriye. Ferheng bi tevê pêşgotin ji 483 rûpelan pêk hatiye. Ferheng bi alfabeya ‘Erebî û wergera Latînî û bi awayeke bêpergal hatiye nivîsîn (Chylet, 2003: X).

M. Auguste Jaba ferhengên Kurdî-Fransizî, Fransizî-Rûsî-Kurdî û Kurdî-Fransizî-Rûsî çêkiriye. Wî vê ferhengê li ser hîmê têkstên Kurdî yên edebiyatî, folklorî û tarîxî çêkiriye. Em dikarin bibêjin, di vê xebatê de zanayê Kurd Mela Beyazîdî û Ahmed-Xan alîkariya A. Jaba kiriye tê gotin (Kurdo, 1960: 17).

Ferhenga M. August Jaba a *Kurdî-Fransizî/Dictionnaire Kurde-Français* ku di sala 1879an de li St-Petersburg derketibû di sala 2014an de jî ji nav Weşanên Avestayê derket. Ferhenga ku wek di rêza Re-Edisyon de çap bûye bi pêşgotina Salih Akin dest pê dike. Akin balê dikişîne ser van xalan:

Ferhenga Kurdî-Fransî ya Auguste Jaba di pêşveçûna ferhengnasiya zimanê Kurdî de jî xwedî cihekî taybet e. Mirov dikare ferhengê bi hêsanî wek pêngaveke girîng di ferhengnasiya Kurmancî de bipejirîne. Ji bo ku Jaba tenê bi du ferheng û ferhengokeke ve tê nasîn. Yekemîn ferheng ji aliyê Ehmedê Xanî ve di 1684ê de hate çapkirin. Ferhenga duyemîn jî ji aliyê Maurizio Garzoni ve ku di sedsala 18an de ji Romayê, ku wê şandiyê Mîrnişîna Behdînanê û hatiye çapkirin. Ev her sê ferhengên ku taswîrên zimanê Kurdî li xwe digirin ji aliyê lêkolînên kurdnasiyê ve wekî referans tene qebûlkin. Ew ji bo zimanê Kurdî belgeyên herî pêş û yên herî berbiçav in. Beşdarbûna zanayên Ewropî di destpêkê de gelekî karîger e û rola wan a mezin di danasîna zimanê Kurdî de derdixe holê (Jaba, 1879: III-IV).

tūyera, mûrier; bactr. dāuru, p. دار; comp. هفتدار, سپیندار.

دار dar, tenant; comp. دیر; p. دار; comp. انباش, ارکیدار, اجره دار, آبدار, تریه دار, پیلدار, بیراقدار, بردار, باحدار, دکاندار, دفتردار, خزینه دار, جودار, جرودار, ضماندار, زریدار, زخمدار, دیندار, قرضدار, عملدار, علدار, طلبدار, طرفدار, مرضدار, مالدار, گوهدار, کزودار, نامدار, نازدار, میلدار, مملکداری, نوبه دار, ناندار.

دار العلم dar il ylm, université, col-lège; ar. دار العلم.

داربیر dar-byr, bûcheron, scieur de bois; castor; p. داربیر.

داربست dar-best, échasses, brancard; le pers. داربست signifie un échafaud, une baraque.

دارچین dartchin, cannelle; darcini G.; du pers. دارچینی ( propr. bois de Chine).

دارگوشت dar-goucht, décharné; mot à mot: perche vêtue de chair.

دارن voy. دیران.

\* دارو darou, drogue, savon épilatoire, Ch. 348; du pers. دارو; comp. هزار دارو.

داره daré, escompte de poids; voy. طارا.

دباری voy. داری.

\* داری daree, maïs, R. 2, 284; طارکان; comp. داری, دارو.

\* داریتین da-retin, verser; prés. da-résim, 2. 3. da-résit G.

دارین darin, de bois.

داس das, faucille; داس کرین das kirin, moissonner, faucher les blés; p. داس.

داستان dastan, récit, conte; du pers. داستان.

دأشاندین voy. هزاندين.

دوست voy. داشتن.

داشک voy. جاشک.

داغ کرین dag, cautère, ustion; dag kirin, cautériser; fondre du beurre; dák G.; p. داغ.

داغبه daghbé, oiseau, Ch. 303; comp. دانه?

دانی daw, filet, tissu à mailles; دانی ده دان daw we-dan, tendre des filets; daf kem ou daf de-ve-kem, je tends des filets, G.; p. دام.

دا وه کرین da-we-kirin, développer; ده وه kem, je développe, G.; comp. کرین.

دا کتین da-ketin, 1) se jeter; 2) tomber en déconfiture, devenir insolvable; 3) couvrir une jument; کس دا کتیه fylan kes da-ketiié, un tel est tombé en déconfiture; parf. 1. ez da-ketimé, je me suis jeté; comp. کنین.

داگیر daghir, rentrée des troupeaux du pâturage; comp. داگیرتین; ghir repond au pers. دگیر, دگیر.

داگیرتین da-ghirtin, saisir de tous les côtés, charger un fusil; da-ghrúm, j'entasse, négat. da-ná-ghrum; parf. part. daghert, da-ghertia G.; klil dá-ghrum, je serre, j'enferme, G.; comp. گرتین.

\* داگیرتی daghertia, enclos; comp.

دگرتی.

\* دالغاندین dālaqāndin, suspendre;
















### 2.1.11. Kurdî- Fransî- Îngîlîzî

Kurdnasê Fransî Joyce Blau di sala 1965an de bi navê *Ferhenga Kurdî-Fransî-Îngîlîzî* bi sê zimanan ferhengeke çêkiriye. Ferhenga Joyce Blau di sala 1975an de ji aliyê Dr. Şivan ve bi ser Tirkî ve hate wergerandin. Ev ferheng ji aliyê Weşanên Şivan ve hatiye weşandin. Xwendekarê Joyce Blau, Kamûran Bedirxan di berhevkirina ferhengeke Edebî- Kurmancî de hinek zû xebat kiribû. Peyvên di nava ferhengê de ne bi giştî li ser mijarên modern in û ji kovarên Kurdî yên salên 1930-1940an hatine qeyd kirin. Ev berhema heman kesî, ji analîzên li ser zimanî, wergerên Fransîzî û ji metnên folklorê pêk hatiye. Digel van di salên 1967-1968an de Jobal Sirjarin hin materyalên di derbarê Kurmanciya jêrîn de, ku li Îraqê li herêma Yêzidiyan civandiye jî di nav vê ferhengê de cih girtine. Di vê berheme de behsa hin ferhengnivîsan jî tê kirin. Ev ferheng ji aliyê Fetullah Kakioğlu ve di sala 1991an de bi ser Tirkî ve tê wergerandin û ji aliyê Weşanxaneyê Sosyalê ve hatiye weşandin. Ev ferheng ji 344 rûpelan pêk hatiye. Di ferhengê de nêzê 6 hezar peyv hene (J.Blau, 1991: 6-9).

## Î

île (d.) Küçük ada. /F. îlot. /İ. small island.  
îlon (d.) Eylül. /F. septembre. /İ. September.  
în (d.) Cuma. /F. vendredi. /İ. Friday.  
înce (be.) O zaman, o sırada, öyleyse. /F. alors. /İ. then.  
încaz (d.) Armut. /F. poire. /İ. pear.  
îran (d.) İran. /F. Iran. /İ. Iran.  
îranî (s.) İranlı. /F. iranien. /İ. Iranian.  
îro Bugün. /F. aujourd'hui. /İ. to-day.  
ji îro û pê de Bugünden itibaren. /F. à partir d'aujourd'hui.  
/İ. starting from to-day.  
îronî (s.) Güncel, şimdiki. /F. actuel. /İ. present.  
îsal Bu yıl. /F. cette année-ci. /İ. this-year.  
îsk (d.) Hıçkırık, iç çekme. /F. sanglot. /İ. sob.  
îsot (d.) Biber, toz biber. /F. poivron, piment. /İ. pepper, pimento.  
îstgeh (d.) Gar, istasyon, durak. /F. gare, station, arrêt. /İ. station, stop.  
îş (e.) İş. /F. affaire. /İ. deal.  
îşker (e.) Emekçi, işçi. /F. travailleur. /İ. workman.  
îtalya (d.) İtalya. /F. Italie. /İ. Italy.

*Wêneferhenga (Photodictionary) English-French-Kurdish (Kurmanji)* ji aliyê Ali Balkhkanlou (Azad Makûyî) ve di sala 2011an de li Tehranê hatiye çêkirin û weşandin. Di ferhengê de qasê 800 peyv hene û ji 69 rûpelan pêk hatiye. Ferhengeke ji bo zarokan çêtir e û piranî tê de peyvên rojane hene, lê wekî din ferhengeke wisa ku mirov jê zêde îstîfade bike, nîne. Ferheng bi alfabeya latînî û 'erebî hatiye nivîsîn (Balkhkanlou, 2011: 1).

 <b>ENVELOPE</b> l'enveloppe ..... <b>Paket</b>	 <b>EQUAL</b> égal ..... <b>Baraber</b>	 <b>EQUAL SIGN</b> un signe égal ..... <b>Nîşana beraber</b>	 <b>EQUATOR</b> l'équateur ..... <b>Xetî nivqatbirr</b>	 <b>ERASER</b> la gomme ..... <b>Pakker</b>
<b>EUROPE</b> Europe ..... <b>Avrûpa</b>	<b>2,4,6,8...</b> <b>EVEN</b> pair/paire ..... <b>Cot</b>	 <b>EVENING</b> le soir ..... <b>Êvar</b>	 <b>EVERY</b> chaque, toutes ..... <b>Her, Gişt</b>	 <b>EXAM</b> l'examen ..... <b>Ezmûn</b>
 <b>EXCLAMATION POINT</b> un point d'exclamation ..... <b>Nîşana seyrê</b>	 Excuse me. Excusez-moi. Pardon. ..... <b>Bibore, Eîbaxşîne</b>	 <b>EXERCISE</b> l'exercice ..... <b>Rahînan</b>	 <b>EXIT</b> la sortie ..... <b>Derîn</b>	 <b>EYE</b> l'oeil ..... <b>Çav</b>

*Ji Wêneferhenga (Photodictionary) Îngîlîzî-Frensî-Kurdî (Kurmancî)/English-French-Kurdish (Kurmanji) rûpelek mînak.*

### 2.1.12. Kurdî-Holendî/ Koerdisch-Nederlands

Ferhenga bi navê *Kurdî-Holendî/Koerdisch-Nederlands* di sala 2002an de ji aliyê birayên Mahabad B.Qilorî û Nêçîrvan Qilorî ve hatiye amadekirin. Di ferhengê de peyvên Kurdî (Kurmancî, Dimilî, Soranî) bi zimanê Holendî hatine şîrovekirin. Ferheng ji 365 rûpelan pêk hatiye û ji aliyê Weşanên Bulaaq ve li Amsterdamê hatiye weşandin. Demeke dirêj Kurdên Holendeyê li benda vê ferhengê bûne. Şeş sal li ser vê ferhengê xebat hatiye kirin. Di ferhengê de Martin Van Bruïnessen bi serenavê “*Kurdî bi zimanekî derd e*” pêşgotineke nivîsiye û di pêşgotinê de li ser dîroka wêje û astengiya li ser ziman rawestiye. Behsa hinek ferhengên Kurdî jî kiriye. Di ferhengê de gelek kê m peyv cih girtine û behsa alfabeya Kurdî jî hatiye kirin (Mahabad B.Qilorî, Nêçîrvan Qilorî, 2002:1-20).

Wêrekiya Kurdî-Holendî/ Koerdisch-Nederlands – Ujgurevî Bûlmaq – prof. h. o. l. o. k. e. r. 2002

**nivîn** 1. ww. (binive) (raketin) slapen, naar bed gaan  
2. zn. (cil) het bed

Bij meerdere vertalingen staan de synoniemen na de Arabische cijfers.

**rakêşandin** ww. (radikêşe, rakêşe) 1. (kişandin) trekken  
2. (tamijandin) aantrekken

Als er als vertaling een omschrijving is gegeven, wordt dit aangegeven door □.

**bewreşînk** zn. med., S. □ een (de) huidziekte  
**hoqe** zn. □ het gewicht van 1283 gram

Vertalingen die uit meerdere woorden bestaan – waardoor geen woordsoort kan worden aangegeven – zijn tussen rechte haakjes geplaatst.

**berkel** [bijna kokend], [tegen de kook aan]  
**ewledar** bn. veilig, [te vertrouwen]

Met een ► wordt naar een meer frequent lemma verwezen.

**hêtûn** zn. ► étûn

De opgenomen voorbeeldzinnen zijn tevens bedoeld om betekenisverschillen aan te duiden. De Koerdische voorbeelden zijn vet gedrukt.

**jîyîn** ww. (dijî, bijî) 1. leven 2. wonen **ez li Den Haagê**  
**dijîm** ik woon in Den Haag  
**kê** vr.vnw. wie, wiens **Kê te re got?** Wie heeft jou dat verteld?  
**Kê li wî xist?** Wie heeft hem geslagen? **Ew ya kê bu?** Van wie was dat? **Ew bavê kê ye?** Wiens vader is hij?

In sommige gevallen zijn de voorbeeldzinnen tevens gezegdes of spreekwoorden. In zo'n geval zijn de voorbeelden niet letterlijk vertaald, maar met overeenkomstige spreekwoorden of gezegdes. In dit geval staat het teken ◊ voor de vertaling.

**enîşk** zn. 1. anat. de elleboog 2. anat. (enîşkê borî/lûle) de elleboog 3. wisk. de rechthoek **enîşk dan** ◊ iemand de rug toekeren, geen contact meer willen hebben

25

*Ji Ferhenga Kurdî-Holendî/ Koerdisch-Nederlands rûpelek mînak.*

### 2.1.13. Swêdî-Kurdî

Ferhenga Reşo Zîlan ya Swêdî-Kurdî bi navê *Svesk- Kurdiskt Lexikon* di sala 1989an de li Stockholme hatiye weşandin. Ferheng 311 rûpelan pêk hstiyê. Ferheng ji bo koçberên Kurd fêrê zimanê Swêdî bibin hatiye nivîsîn. Ji bilî vê Enstîtû jî ferhengeke Swêdî-Soranî derxistiyê. Li hemberê her peyveke Swêdî wateyên cuda yên Kurdî hatine nivîsîn. Di ferhengê de wêne jî cih girtine û bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn (Chyet, 2003: XII; Akin, 2013: 63).

*Ferhengoka Swêdî* di sala 1981an de ji aliyê Monika Holm û M. Mathlein ve hatiye amadekirin. Ferheng bi alfabeya 'erebî û latînî hatiye nivîsîn (Yıldırım, 2008: 81). Ev ferheng ji aliyê Reşo Zîlan ve hatiye tercume kirin. Ferheng ji 74 rûpelan pêk hatiye.

Mustafa Aydoğan, Vildan Tanrikulu, Mahmud Lewendî, bi navê *Ferhena Kurmancî/ Swenska- Kurdiska Lexikon* ferhengek amade kirine. Ferheng di sala 2006an de li Stockholme ji aliyê Enstîtûya Pêşvebirina Xwendegehên Swêdê hatiye weşandin. Ferheng bi 1100 rûpelan pêk hatiye û qasê 28500 peyvên sereke cih dane lê 70 hezar peyvên Swêdê tê de cih girtine. Ev ferheng li ser internetê jî heye. Ferheng ji aliyê Liber distribution û Myndigheten för skolutveckling (Liber û Ajansa Pêşvebirina Dibistanan) ve hatiye belavkirin. Bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn.

Müjde K. Raşîd di sala 1994an de bi navê *Kurdisk-Svensk Ordbok (Kürdçe-İsveççe Sözlük)* ferhengek amade kiriye. Ferheng li weşanxaneyê Studentlitteratur de li Swêdî hatiye weşandin. Müjde K. Raşîd di sala 1997an de bi navê *Ferhengî Pizîskî: Swedî-Kurdî (Tıp Sözlüğü: İsveççe-Kürdçe)* ferhengek amade kiriye. Ferheng li Swêdî hatiye weşandin.

### 2.1.14. Somerî-Kurdî

Ferhenga Somerî-Kurdî/Kurdî-Somerî ji aliyê lêkolîner û zimannas Mamê 'Elî û Suleyman Yıldırım ve hatiye amade kirin. Di ferhengê de bi qasê 1500 peyvên Somerî hene û ji 176 rûpelan pêk tê. Di ferhengê de wateya peyvên ya bi Kurdî jî hatiye nivîsîn Çend Mînak; KA.A: Rovî, GALGA: Aqil, Av: A, Tirs: HUŞ, Reng: HI.HI, Teşî: GIŞBAL hwd .

Di dawiya ferhengê de çend deqên Somerî û wergera wan jî cih girtine. Ferheng di 2011an de li çapxaneyê Berdan ji aliyê weşanên J&J ve hatiye weşandin. Di destpêka ferhengê de behsa ziman û malbatên zimanan hatiye kirin. Ferheng bi alfabeya latînî

hatiye nivîsîn. Lê peyvên ku bi tîpên [C, Ç, F, J, O, Q, Ê, V, W] dest pê dikin nehatine peyda kirin. Di peyvên Somerî de hin xal [...] hatine danîn. Ev xal ji bo ku yekeyên peyvên Somerî bêne dîtin hatine danîn û tu wateyê wan nîne. Wek mînak: Ê.DUB.BA.A dema ku bê bilêvkirin wekî ÊDUBBAA tê gotin (Mamê 'Elî û Suleyman Yıldırım, 2011:7-20).

*Malbata zimanan a Hînd û Ewropî ji hêla dîrokî û civaknasiyê ve xwedî giringiyek mazin in hêla lêkolîneran ve bi baldarî lêkolîn li ser wan hatiye kirin û di encamê de jî hema hema tevahiya xwemaliyên van zimanan hatine ispat kirin(peyîtandin). Di navbera van zimanan de nemaze têkiliya vokabuler ango dengzaniyê eşkere ye. Wekî mînak; peyva "bav" di Almanî de "vater"; di Latîni de "pater" ; di Yewnanî de "pater" ; di Persiya Kevnar de "athîr" ; di zimanên Gotî de "fatar"; di Sanskritî de "pîta" û di Toçerî de jî wekî "pâcar" tê gotin. Her wiha, peyva "heft"(Hejmar) di Emanî de "sieben" di Latîni de "septem" ; di Yewnanî de "hepta" ; di Persiya Kevnar de "seçt"; di Sanskritî de "sapta" di Toçerî de jî wekî "spât" û di Hitîti jî wekî "septa" tê gotin. Ji bilê peyvên nêzî hev qertafên kişandinê û şeweyên pêkanîna peyvan jî wekî hev e. Wekî mînak; kirdeya lêkereke gergûhez qertafa (-s) û pêgera wê jî qertafa (-m) digire. Di lêkeran de, li gorî dema niha, civaka kesane ya yekjimar û sêyem, qertafa kesane (-î), qertafa dema borî ya heman cînavê (-t), qertafa pirjimariya heman cînavê (-ntî) û (-nt) ye. Di pêkanîna peyvê de gûherînên deng yên van zimanan bi van mînakan de baştir bê ravekirin.*

<i>Elmanî</i>	<i>"bînde" (girê bide)</i>	<i>"bend" (girêk)</i>
<i>Latîni</i>	<i>"tego" (binixumîne)</i>	<i>"hoga" (xila)</i>
<i>Yewnanî</i>	<i>"demo" (damezirîne)</i>	<i>"domus" (xanî)</i>
<i>Slawî</i>	<i>"vezo" (biajo)</i>	<i>"vozu"( siware-erebe) (Mamê 'Elî û Suleyman Yıldırım, 2011: 19).</i>

#### **2.1.15. Tirkî-Îngîlîzî-Kurdî**

*Ferhenga Aboriyê ya Tirkî-Îngîlîzî-Kurdî* di sala 2010an de ji aliyê Huseyîn Deniz ve hatiye amade kirin. Huseyîn Deniz pêşî amadekirina ferhengê bi Tirkî-Kurdî difikire, pey re Îngîlîzî jî lê zêde kiriye û bi wê awayê çap kiriye. Ferheng bi alfabeya latîni hatiye nivîsîn û li Stenbolê ji aliyê Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Amedê ve hatiye weşandin. Nivîskar bi salan di rojnameyên Kurdan de xêberên aboriyê çêkiriye. Di ferhengê de derdorê 4 hezar peyv hene û ji 287 rûpelan pêk hatiye. Armanca nivîskar ew e ku ji aliyê aboriyê ve dewlemendiya zimanê Kurdî bide nasîn (Deniz, 2010: 1-8).

Amadekar tevahiya herêm û gundan negeriyaye. Ev jî di ferhengê de wekê kêmasiyek tê xuya kirin. Ji xwe Huseyîn Denîz bi xwe jî dibê xwezî derfet hebûna ku em hemû herêm û gundan bigeriyana û me têgehên aboriyê yên bi Kurdî berhev bikira. Nivîskar ji çavkaniyên, Zana Farqînî, Salah Sadallah, Kamêran Botî, Yusuf Ziyaeddin Paşa, J. Blau, Nûbihara Biçûkan û Hüseyin İzol îstîfade kiriye (Deniz, 2010: 9-10).

Ji ferhenga aboriyê çend mînak û muqayesekirina wî bi çend ferhengên din re:

*Açık artırma: Open bidding, Auction: Mezar 1. Mazat 2. Mezar* (Deniz, 2010: 14). Ev peyv di Ferhenga Zanistên Civakî ya Abdullah Kıran de wek; lihevzêdekirin; mal an eşyayê (alavê) ku dixwaze bê firotan li pêş kiryanan tê bazarkirin û kesê ku buhayê herî zêde da dikire.

*Açık finansman: Deficit (financing): 1. Daraya kêr 2. Peredana kêr, Darayîkirina kêr* (Deniz, 2010: 14). Ev peyv di Ferhenga Zanistên Civakî ya Abdullah Kıran de wek;

Açık Finansman (Deficit Financing): Girtina Kêmfîmansî; çaxê ku dewletê ji bo geşkirina aborî bi zêdehî mirov kirin kar û bi vî awayî mesrefên wê ji hatina wê derbas kir, hingê kêmahiyek finansmanî dertê holê û dewlet ji bo dagirtina vê kêmahiyê an rasterast pere çap dike an jî bi riyên deyndariya hundirîn vê kêmahiyê dadigire.

*Değiştirme ( Mübadele): Exchange, Interchange: 1. Guhirandin, Veguherandin 2. Gorîn, Guhartin, Guherandin, Bedêlandin, Dêl 3. Berdêlî, Pêkguhartin, Guhartin* (Deniz, 2010: 54).

*Egemen sınıf: Dominan classes: Çîna zal, Çîna serdest* (Deniz, 2010: 67).

*Egemenlik: Sovereignty, Possession, Domination: Zalî, Serwerî, 1. Serwerî, Serdestî,*

*Zalî, Hikumranî 2. Bandûr, Serwerî, Hakîmiyet 3. Zalî 4. zalkirin* (Deniz, 2010: 67).

Ev peyv di *Ferhenga Zanistên Civakî* ya Abdullah Kıran de wek "serwerî; hêz û desthilatiya sereke" derbas dibe. 1) Hêz û desthilatiya sereke; rewşa ku hukûmeta netewî li ser tevahiya welat serwer e û bi awayê huqûqî "gotina dawî" ew dibêje. 2) Rewşa serweriya tevahî û xwe rêvebirinî. 3) Welatê ku wek dewleteke serbixwe heye.

*Emeklilik: Retirement: 1. Emekdarî, Karkinarî, Jikarketîbûn, Malnişînî, Xanenişînî, Teqawidî 2. Karkinarî, Teqawidî (Deniz, 2010: 74).*

*Emekli sandığı: Pension fund, Retirement fund, State retirement fund: Sindoqa karnikarî (Deniz, 2010: 74).*

Ev peyv di Ferhenga Zanistên Civakî ya Abdullah Kîran de wek;

Emekli Sandığı (Retirement Fund): Fona Keddarî; saziya civakî ya ku li karên sîgorta, mirin, seqetî û kalbûnî ya karmend û xizmetkarên ku ji bo dewletê dixebitin dinêre.

Abdullah Kîran bi navê *Ferhenga Zanistên Civakî* ferhegeke amade kiriye. *Ferhenga Zanistên Civakî* bi zimanên Kurdî-Tirkî-Îngilîzî di sala 2014an de li Stenbolê û ji aliyê Weşanên Nûbiharê ve hatiye weşandin. Bi alfabe ya latînî hatiye nivîsîn û ji 391 rûpelan pêk hatiye. Di ferhengê de nêzê 2700 peyv cih girtine û di dawiya ferhengê de jî ferhengokeke cih girtiye. Di ferhengokê de jî bi qasê 2700 peyv hene. Hin peyv û têgeh hene ku eşkalekî gerdûnî standine û ne hewce ye ku di şûna wan de gotinên nû bên çêkirin. Hin peyv jî hene hê ji dûrî ve xwe kifş dikin ku divê ji bo peyv û gotinên wiha, ji axa Kurdî, ji baxçê gulistana Kurdî, bi gotineke din ji qumaşê Kurdî peyv û têgehên nû werin birîn an danîn. Lê hin peyv jî henin t'ema Kurdî tê de xuya nake. Wekî mînak:

Beşeri Din (Human Religion) : Dîne Mirovî; dîne ku bingeha wî, rê û rêbazên wî ji alî mirov ve hatiye danîn (Kîran, 2014: 29).

Di nav gel de piranî bi vî awayê tê gotin û fêmkirin:

Dîne Beşerî; dîne ku bingeha wî, rê û rêbazên wî ji alî mirov ve hatiye danîn

Abdullah Kîran di ferhenga xwe de di pêşgotinê de ji bo hinek peyvên wiha gotiye;

*Me ji gotina "yasa" re "rêbaz", ji "anayasa" re "rêbazavahî" gotî. Ev peyv bi Erebi "Dustûr," bi Farisî "Qanûn Esasî" û bi Îngilîzî "Constîtution" e. Gotin ji Latînî di salên 1350-1400an de ketiye Îngilîzî û di gellek zimanên Ewrûpî de nêzîkî hev hatiye xebitandin. "Constîtution" ji gotina "constitue" tê, ku bi mana "çêkirin" "danîn" "sazkirin" ango "avakirinê" ye. Di Kurdî de jî carna bi awayê "Qanûna Esasî" "Qanûna Bingehîn" "Zagona Bingehîn" an "Makeqanûn" hatiye xebitandin. Belê ev gotin hemû jî ji wergerandina Erebi an Tirkî tîne û bi rastiya koka "constitue" re naçin ser hev. Çimkî di "constitue" de "çêkirin," "danîn," ango*

“avakirin” heye û divê em jî ji ser vê kokê herin. Loma me ji bo yasa “rêbaz”, ji bo “anayasa “rêbazavahî,” ji bo “yasama”yê “rêbazdanî” û ji bo meşru “rêbazwarî” çêkir. Çimkî “Rêbazavahî,” dê û kaniya hemû rêbazan e û tu rêbaz nikare pê re dijber be, li hember rêbaza ku hîmê civakî li ser hatiye danîn derkeve. Di gotina “constitûtionê” de, li ser hîm, anga bingehê avakirina civatê û pergaldana dewletê heye. Loma “rêbazavahî” ji gotinên ku hilm û bîhna Tirkî ji wan tê û jî rastiya “constitûtionê” dûr in, gellek çêtir e. Gotinên “özne- nesne- yüklem” bi Erebi “ fail- mefûl- fîl,” bi Farisî “nîhad- mefûl- fîl,” bi Îngilîzî “subject- object- verb,” mamoste bi Kurdî bi awayê “Barbir- Bar- Bargir” bi nav kirî. Celadet Bedirxan jê re “Kirde (Kirar) Bireser- Pêveber” gotiye. Mixabin ya ku wî daniye li kirasê Kurdî xweş nehatiye; hînbûn û hînkirina wan jî ne hêsan e.. Çawa ku Celadet “lêkerê ji “lêkirinê” çêkiriye, me jî bi heman riyê “bargir” ji “bar girtinê” deranî. Ji bo ku di navbera gotinan de ahengek hebe û di çarçova mantiqa ziman de têkildar bin, mamoste “barbir- bar- bargir” got. “Barbir” ew kes an ew tişt e ku di hevokê de kar an çalakîyê lidar dixê. “Bar” tişt e, anga obje ye û her tiştê heyî bi awayekî bar e. Loma, me ji “mefûl” anga obje re “bar” got. “Bargir” kar an çalakiya ku ji alî “barbir” ve hatiye lidarxistin digire ser xwe, anga hil digire. Bi gotineke din, “bargir” di hevokê ew hêman e ku dem û modalîtê nîşan û di derbarê tiştê de dadbariyê (yargî) çêdike. Îcar di hînkirinê de jî em dikarin “barbir- bar- bargir” bi awayê “b,” “br” û “bg” kurt bikin (Kıran, III-IV).

Di ferhengê de peyvên folklorîk zêde cih negirtine. Ji ber vê jî peyvên rojane bêhtir yê aborî, felsefîk û têgehên zanistî cih girtine. Ji ferhengê çend mînak û di nav gel de awayê bikaranîna wan:

Agnostisizm (Agnosticism): Nayêzanînî; li gor vê nêrîna felsefî, tiştên ku dikevin warê metafîzîkê û di derbarê hebûnê de ne nikarin bîn zanîn. Ji hêla din ve tu agahiyek ku herkes eynî manê jê derîne û li ser li hev bike jî tune (Kıran, 2014: 3).

Peyva xeybê li her terefê tê bikaranîn û li gorî mana peyva agnostisizme bêtir diherike. Lê nayêzanînî divê hevokê de naherike. Hem wateyê teng dike hem jî dê gel vê peyvê necibîne. Ev peyv li gor 'emilandina di nav gel de wiha bê gotin çêtir dibe;

Agnostisizm (Agnosticism): Xeybî; li gor vê nêrîna felsefî, tiştên ku dikevin warê metafîzîkê û di derbarê hebûnê de ne nikarin bîn zanîn. Ji hêla din ve tu agahiyek ku herkes 'eynî manê jê derîne û li ser li hev bike jî tune.



Emperyalizm (Imperyalizm): Emperyalîzm; 1) Rewşa ku dewletek ji bo pêşvebirina berjewendiyên xwe destdirêjîya welatên din dike an wan welatan dike bin serweriya xwe. 2) Rewşa ku hêzeke serwer dewlemendiyên welatên din îstismar dike û wan bi awayê siyasî, çandî û zanistî bi xwe ve girê dide. 3) Li gor teoriya Marksist, rewşa ku kapîtalîzm di karê îstismarê de digihîje asta herî bilind û bi her awayî yekdestiya xwe pêk tîne (Kıran, 2014: 82).

Peyva koledariyê di nav Kurdan de bêtir hatiye ecibandin. Herwiha wateya emperyalîzmê jî di xwe de dihêwirîne. Eger ev peyv di dewsa emperyalîzmê de bê bikaranîn çêtir e.

Emperyalizm (Imperyalizm): Koledarî; 1) Rewşa ku dewletek ji bo pêşvebirina berjewendiyên xwe destdirêjîya welatên din dike an wan welatan dike bin serweriya xwe. 2) Rewşa ku hêzeke serwer dewlemendiyên welatên din îstismar dike û wan bi awayê siyasî, çandî û zanistî bi xwe ve girê dide. 3) Li gor teoriya Marksist, rewşa ku kapîtalîzm di karê îstismarê de digihîje asta herî bilind û bi her awayî yekdestiya xwe pêk tîne.

Esneklik (Elasticity): Vekişêrî; 1) Rewş û taybetiya vekişêrbûnê. 2) Taybetiya piştî ku bi aliyekî ve hat kişandin jî cardin li rewşa xwe ya berê zivirîn. Di aboriyê de, çaxê ku di buhayê malekî de guherîn çêdibe û ev yek bandora xwe li ser mîktara daxwazî ya malekî din nîşan dide re vekişêriya daxwazî ya çeperast tê gotin. Gava ku di buhayê malekî kifş de guherîn çêbû û vê yekê di raberiya wî malî de guherînek pêk anî re, ji vê rewşê re vekişêriya buhayî ya raberî tê gotin (Kıran, 2014: 86).

Esneklik (Elasticity): Sîstî; 1) Rewş û taybetiya vekişêrbûnê. 2) Taybetiya piştî ku bi aliyekî ve hat kişandin jî cardin li rewşa xwe ya berê zivirîn. Di aboriyê de, çaxê ku di buhayê malekî de guherîn çêdibe û ev yek bandora xwe li ser mîktara daxwazî ya malekî din nîşan dide re sistiya daxwazî ya çeperast tê gotin. Gava ku di buhayê malekî kifş de guherîn çêbû û vê yekê di raberiya wî malî de guherînek pêk anî re, ji vê rewşê re sistiya buhayî ya raberî tê gotin.

#### **2.1.16. Kurdî-Almanî/ Almanî-Kurdî**

Feryad Fazil Omar, ferhenga Kurdî-Almanî ya bi navê *Kurdish-Deutsches Wörterbuch* di sala 1992an de li Berlînê çêkiriye. Ferheng bi alfabeya 'erebî û latînî hatiye nivîsîn û ji 721 rûpelan pêk hatiye (Chyet, 2003: XIV).

Amîrxan, di sala 1992an de ferhengeke bi du dengî Kurdî-Almanî û Almanî-Kurdî amade kiriye û li Ismanningê çap kiriye. Ferheng ji 1200 rûpelan pêk hatiye û di ferhengê de bi qasê 75 hezar peyv cih girtine. Peyre Amîrxan di sala 1997an de ferhengeke ‘Erebî-Kurdî amade kiriye û li Viennayê çap kiriye. Ferheng ji 982 rûpelan pêk hatiye (Chyet, 2003: XIII).

*Ferhenga Kurdî (Kurmancî)- Almanî/Kurdîsh-Deutsches* ya Yusuf Budak jî di sala 2013an de li Stenbolê hatiye weşandin. Li ser qapaxa ferhengê wiha nivîsiye; *Ferheng bo xwendegha pêşîn/ Wörterbuch für die grundschule*. Ferheng ji du beşan pêk hatiye û 146 rûpelî ye. Di beşa yekem de peyvên Kurdî û wateya wan ya Almanî nivîsiye. Di beşa duyem de jî cînav, rengdêr, demên heyî, sereteyên hevokê, peyvên diywate, tewandina navan, navên amûretên dibistanê (mînak: raker-der Radiergummi-silgi, pêûsdank-das Federpennal-kalemlîk hwd.) peyvên matematîkê (mînak: berhevkirin-einsammeln-toplamak, caran-mal- kere, parek/parva- geteilt durch/durch- bölü hwd.) ( Budak, 2013:101-140)

#### **2.1.17. Kurdî-Azerbaycanî/ Azerbaycanî-Kurdî**

Şamîl Esgerov, sê ferhengên bi navê; *Kurdî-Azerbaycanî, Azerbaycanî-Kurdî û ferhenga Mişarên Zimanê Kurdî* çêkiriye. Ev sê ferheng di sala 1999an de li Bakûyê hatine çap kirin û ji aliyê Weşanxaneyê Elnurê ve hatiye weşandin. Ferheng ji 640 rûpelan pêk hatiye.

#### **2.1.18. Ferhengên Pirzimanî**

Abdurrahman Önen *bi navê Ferhenga Erdnîgariyê* di sala 2008an de ferhengek amade kiriye. Ferheng li Stenbolê û ji aliyê Weşanxaneyê Dozê ve hatiye weşandin. Di nava gel de peyva 'erdnigarî zêde nehatiye 'emilandin, ji ber vê yekê jî peydakirina peyvên 'erdnigarî pir dijwar bûye. Pêşî baweriya nivîskar tune bûye, lê wexta ku ferheng qediyaye, dîtiye ne tiştêkî xewn û xeyal e. Bêje li gor zimanan bi vî awayî rêz bûne: Kurdî-Tirkî-Fransî- Almanî-Îngîlîzî. Armanca vê ferhengê ya sereke ew e ku bi peyv, têgîn û şîroveyên xwe ji bo ziman bibe bingeş. Ferheng 352 rûpelan pêk hatiye û bi alfabe ya lafînî hatiye nivîsîn (Önen, 2008:1-3).

*Ferhenga Erdnîgariyê* ji hêla Konseya Ewrûpayê ve di sala 1967an de hatiye weşandin. Çapa yekem ya vê ferhengê, ji 3 hezar bêje û biwêjan pêk hatiye û bi şeş zimanê

Ewrûpî hatiye weşandin. Di vê çapê de bêje wek lîstê û bê wateyên wan hatibûn weşandin. Çapa Tirkî ji hêla Sami Öngör ve bi wateyên bêjeyan hatiye nivîsîn û di sala 1975an de ji aliyê Wezareta Perwerdeyê ya Netewî ve hatiye weşandin.

Di nivîsandina Kurdî de vê çapa Tirkî wek çavkanî bi kar aniye, lê zimanên Îtalî û Spanî nenivîsiye, tenê Tirkî, Frensî, Almanî û Îngilîzî nivîsiye. Nivîsandina vê ferhengê hîn neqediyaye. Ji bo ku hem jê bê îstifadekirin him jî rexne, pêşniyar û nirxandin were kirin ev beş bi rêya înternetê gihêştiye xwendevanan. Bêjeyên ferhengê li gor elfabeyê nehatine rêzkirin li gor beşên erdnigariyê hatine rêz kirin ([www.oocities.org](http://www.oocities.org)).

Bi navê *Ferhenga Pirzimanî*; bi Tirkî-Kurdî (Kurmancî, Zazakî, Soranî)- Farisî-Îngilîzî ferhengeke hatiye amadekirin. Ev ferheng ji aliyên Osman Aslanoğlu, Bedirhan İslamoğlu, Zeki Gürür, Hayrullah Acar û Evren Aslanoğlu ve hatiye çêkirin. Di sala 2011an de li Stenbolê û ji aliyê Weşanên Nûbiharê ve hatiye weşandin. Ferheng ji çar beşan û ji 240 rûpelan pêk hatiye. Ferheng bi alfabe ya latînî û ‘ereb’î hatiye nivîsîn (Ferhenga Pirzimanî, 2011: 2-3).

*Ferhenga Akademiya Swêdî* (Svenska Akademiens Ordbok) ku bi kurtî wek SAOB tê nasîn ev 117sal e hê jî neqediyaye. Cilda yekem di sala 1898an de derketiye û hê jî ev proje berdewam dike. Akademiya Swêdê di sala 1786an de saz dibe û piştî salekî biryar tê girtin ku ferhengeke mezin a zimanê Swêdî bê amade kirin. Heta niha 35 cildên vê ferhengê derketine û li gorî rêza alfabetîk heta tîpa "T" hatiye. Ferheng li gor plana Akademiyê dê di sala 2017an de biqede. Kareke ew qas duvdîrêj e ku tenê tîpa "S" yê 35 sal berdewam kiriye (1965-2002). Redaksiyona ferhengê niha li bajarê Londê ye, qasî bîst zimanzan û kesên din li wir kar dikin.

Ferhenga Akademiya Swêdî ferhengeke etîmolojîk û dîrokî ye. Ji sala 1521an heta niha peyvên ku di zimanê Swêdî yê nivîskî de hatine bikaranîn bi pergaleke gelek zanistî û sistematîk dide nasîn. Zêdetir koka peyvan nîşan dide. Her peyvek bi dirêjahiya sedsalan çawa formên xwe guhertine/mirine yan jî wateyên cihê wergirtine bi alîkariya jêgirtên çavkaniyên Swêdî yek bi yek di ferhengê de xuya dike. Di ferhengê de ziman, edebiyat û dîrok gelek nêzikî hev bûne. Mirov dikare bêje ku ev çavkanî wek xezîneyeke zimên zêdetir alîkariya lêkolîner û nivîskaran dike. Armanc ew e ku hemû peyvên mirî û yê ku di zimanê îroyîn de tên bi kar anîn ligel jêgirtan di vê ferhengê de cih bigirin. Xebata ferhengê ya bingehîn ji berhevkirin û qeydkirina peyvan pêk hatiye (Nûbihar

jimar: 130, Rohat Alakom, r: 5-8 Ferhenga Akademiya Swêdî Ferhenga ku 115 sal e hê jî neqediyaye).

Di rojnameya taybet Kurdî ya Parîsê de xebateke bi navê *Kurmancî* li ser zaravayê Kurmancî bi Kurdî-Tirkî-Fransizî-Îngîlîzî xebat hatiye kirin û qasê 55 hejmar hatiye weşandin. Di her hejmarê de ferhengokek û her cureyê de gelek peyv hatine weşandin. Hinek peyv di sala 2014an de di hêjmara 55an de wiha hatine weşandin. Peyvên ji Gundê Mêrxasan ya 'Eliyê 'Evdirehman, peyvên Folklorê yê Kurdî ji Sadiq Bahaeddîn Amedî, Peyvên ji dîwana Şêx Memdûhê Birîfkanî, Hikayatêd Cimaeta Kurdiyê ya Heciyê Cindî (devoka Berriya Mêrdînê) Hinek peyvên kêmnas/nenas tê de cih girtine. Biryara weşandina van peyvên ku di rojnameyê de hatine weşandin di civîna Kurmanciya li kitêbxaneya Kurdî ya li bajarê Stockholmê hatiye dayîn. Yên ku beşdarê civînê bûne ev in; Mistefa Aydogan (Mêrdîn), Rojan Barnas (Diyarbakir), Lezgînê Çalî (Barzan), 'Elîşêr (Wan), Rênas Awdal (Zaxo), Newzad Hirorî (Dihok), Hamîd Kiliçasalan (Mêrdîn), Sidqî Hirorî (Dihok), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozi (Batman), Zinar Soran (Dêrik), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zîlan (Agirî).

<u>Kurdî</u>	<u>Tirkî</u>	<u>Fransizî</u>	<u>Îngilîzî</u>
çilo; çil û	yemlik meşe yaprağı	foufrage defeuilles de chène	oak leaves used as fodder
hewdan	1. iltihaplanmak 2. yangı, iltihap	1.s'infecter 2. infection	1.to become infected 2. infection
Perijîn(biriqîn)	ışıldamak,ışın saçmak	scintiller, briller	to sparkle, to shine
Jaravkirin,jorav kirin, carî kirin, av tê werdan	durulamak	rincer	to rinse
kûrnêt, kûrniyet	derin düşünce	meditation, pensee profonde	meditation

***Ji Rojnameya taybet Kurdî ya Parîsê bi navê Kurmancî, 2014 hejmar: 55***

*Ferhenga Hiqûqî* ya yekem ku tê zanîn bi Kurdî (Sorani)-'Erebî-Îngîlîzî-Fransî ji aliyê Nouri Talabany (Nûri Talabanî) ve hatiye amadekirin. Nouri Talabany bi alîkariya Tewfîq Wehbî li Londrayê dest bi berhevkirina termên qanûnî dike û di sala 2004an de

vê xebatê bi çar zimanan Kurdî (Sorani)- 'Erebî- Almanî- Fransî diweşînin. Me çapa duyem bi dest xist. Çapa duyem ya Ferhenga Hiquqî di sala 2006an de hatiye weşandin. Ferheng ji 319 rûpelan pêk hatiye û bi qasê 5500 peyv tê de cih girtine. Ji bo zelalkirina peyvyan nêzê 250 heb dîpnot nîşe kiriye. Ferheng bi alfabeya 'erebî û lafînî hatiye nivîsîn.

Dr Nouri Talabany		فرههنگی قانونی کوردی	
Protest for non-payment	Protêt faut de paiement	پروٲستی نه دانهوه <sup>1</sup>	احتجاج عدم الدفع
Protest for non-acceptance	Protêt faut d'acceptation	پروٲستی نا قایلی <sup>1</sup>	احتجاج عدم القبول
Protest costs	Frais de protêt	خه رچی پروٲست	- نفقات الاحتجاج
Profession	Profession	پیشه گه ری	احتراف
Respect for the law	Respect de la loi	رێز گرتن له قانون	احترام القانون
Keeping, retention	Garde, rétention	گلدانهوه، هه لگرتن، باراستن	احتفاظ
To keep the books and documents	Garder les registres et documents	باراستنی (هه لگرتنی) دو کیمه نته کان	- الاحتفاظ بالوثائق
Contempt, disdain	Dédain	سووکابه تی، ریسوایی	احتقار
Monopoly	Monopole	قورخکرن، مۆنۆپۆل کردن، یاوانکردن	احتکار
Government monopoly	Monopole gouvernemental	مۆنۆپۆلی میری، یاوانکردنی میری	احتکار حکومی
Fraud	Fraude	فیل کردن، فیلبازی، که له کبازی	احتیال
Fraudulently	Frauduleusement	به فیل، به ساخته، به که له ک	- باحتیال

<sup>1</sup> نه گه ر روژی دانهوه ی قهرزینک به پنی قهواله یکی بازرگانی بگات و قهزده که نه درینه وه، هه لگری نه و قهواله یه ده بی له ماوه یه کی دیماری کراودا قهرزاز ناگادار بکاته وه به دانه وه ی نه و قهزره، نه م شینوه ی ناگادار کردنه وه پنی ده گوتریمت (پروٲستی نه دانه وه).

<sup>2</sup> نه گه ر قهرزاز قهواله که ی قبول نه کرد، ده بی نه م پروٲسته بکریت .

Current account	Compte courant	حسبى گهراو (سووراو)	حساب جاري
Bank account	Compte bancaire	حسبى بانكى	حساب مصرفى
Final account	Compte final	دوا حسب	حساب ختامى (نهائى)
Deposit account	Compte de dépôt	حسبى ياره دانان	حساب ودائع
Sensitive	Sensible	بههست، ههستيار	حساس
Sensitivity	Sensibilité	ههستيارى	حساسىة
Pro re nata	Selon l'exigence	به يئى يئويست	حسب الحاجة
Well-behaved	Se comporte bien	رهوشت ياك	حسن السلوك
Good faith, bona fide	Bonne-foi	نيازى ياكى، ئبهت ياقزى	حسن النية
Economic embargo	Embargo économique	ئابلوقهى ئابوورى	حصار اقتصادى
Diplomatic immunity	Immunité diplomatique	ئامبزرگرتنى دىپلوماسى	حصانة دىپلوماسىة
Immunity from jurisdiction of the courts	Immunité de juridiction	ئامبزرگرتنى داوهرى	حصانة قضائىة
Part, share	Part, portion	بهش، يشك، بههر	حصة
The lion's share	Part léonine	بهشه شير	حصة الأسد
Capital invested	Apport en société	بهش له كوهميانادا	حصة فى شركة
Share in common	Part commun	بهشى تىكه لاو	حصة شائعة
Civilisation	Civilisation	زىيار	حضارة

*Ferhenga Termên Fenî Kurdî (Kurmancî)-Tirkî- Îngîlîzî/Fen Terimleri Sözlüğü Türkçe- Kürtçe- İngilizce, Dictionary Scientific Terms* ji aliyê Bahattin Gümğüm ve wek sê beş hatiye amadekirin. Ferheng, di sala 2015an de li Stenbolê ji Weşanên Weqfa Îsmail Beşikçi ve hatiye weşandin. Ji bo peyvên Fîzîkê jî Hatice Budak Gümğüm alikarî kiriye. Ferheng bi alfabeya Latînî hatiye nivîsîn. Ferheng jî 896 rûpelan pêk hatiye. Di ferhengê de behsa alfabeya Kurdî û xwendinên wan hatiye kirin û hin bêje jî bi kurtahî cih girtine (Gümğüm, 2015:3-14).

Di beşa Ferhenga Termên Fenî Kurdî (Kurmancî)- Tirkî- Îngîlîzî de nêzê 11300 peyv cih girtine (Gümğüm, 2015: 17-307). Di beşa Fen Terimleri Sözlüğü Türkçe- Kürtçe- İngilizce de 11300 peyv cih girtine (Gümğüm, 2015: 309-601). Di beşa Dictionary Scientific Terms de jî 11300 peyv cih girtine (Gümğüm, 2015: 605-894). Di her sê beşan de peyvên ku cih girtine wekê hev in, ev jî kêmasiyekî ferhengê ye ku tê xwuya kirin.

Ev ferheng xebatekî dirêj li ser hatiye kirin Nivîskar di sala 2000an de du ferhengan dibine, ji wan yek ya Îngîlîzî-Kurdî ya din jî Tirkî-Kurdî, di ferhengê de li hinek peyvên dinhêre û difikire ku lazim e ferhengeke fenî were çêkirin bi wê awayê dest bi xebatê dike.

Ji bo *asit* di ferhengên Kurdî de bi gelemperî *tirşîn* derbas dibe.

Ji bo *atom* di ferhengên Kurdî de bi gelemperî *dendik* derbas dibe.

Ji bo *molekül* di ferhengên Kurdî de bi gelemperî *nûn* derbas dibe.

Mînakên ku me li jor daye em ê binirxînin. Bi rastî hin peyv henin bi zanistî çawa tê gotin an jî di nava gel de çawa hatiye gotin lazim e ku bi wê awayî werin 'emilandin. Peyvên ku me mînak daye di nava gel de zêde nayê 'emilandin, tenê di nava mijarên zanistî de derbas dibe. Ji bo vê peyva *asit* lazim e ku mirov bêje *asît* êdî çêtir e, peyva *tirşîn* peyvek gelemperî ji bo tiştên ku tirş be tê gotin li *asit* rûnanê. Ji bo peyva "atom" jî *atom* were gotin, ji bo peyva "molekül" jî *molekul* were gotin êdî çêtir dibe. Ji ber vê yekê peydakirina peyvên erdnigarî pir dijwar bûye. Herwiha peyvên ku di zimanê Swêdî yê nivîskî de hatine bi kar anîn bi pergaleke gelek zanistî û sistematîk dide nasîn. Em ji ferhengê çend mînanan bi rêza Tirkî-Kurdî (Kurmancî)- Îngîlîzî bidin;

karışım: tétel: admixture

karışım: tétel, tevîhev: mixture

karıştırmak: lihevdan: admix

karıştırmak: hiljendin, tevlihevistin: stir

karıştırmaq: lihevdan, lihevexistin, têkil: mix (Gümgüm, 2015: 455).  
 basınç: pest, pesto: pressure (Gümgüm, 2015: 339).  
 bileşik: komhev: compound (Gümgüm, 2015: 346).  
 bileşik: hevedudanî, têkel: compound (Gümgüm, 2015: 346).  
 çözelti: vehûrî: solution (Gümgüm, 2015: 367).  
 radyoaktif(fr): tîrêjçalak, tîrêjdar: radioactive (Gümgüm, 2015: 524).  
 tepkime, reaksiyon: bertek, reaktî, reaksiyon: reaction (Gümgüm, 2015: 563).

Di ferhengê de hin peyv henin wexta ku meriv bi awayê zanistê difikire rûdinê.

Mînak;

yanma ısı: tîna şewatê: heat of combustion (Gümgüm, 2015: 584).  
 demir filizi: gewhera hesin: iron ore (Gümgüm, 2015: 375).  
 yoğunluk: sifî, tîrî: density (Gümgüm, 2015: 594).

Ev peyva “yoğun” di nava gel de zêdetir tê 'emilandin. Di Kurdî de ji bo peyva “yoğun” ya Tirkî, “tîr” tê gotin. Mînak; ev mast masteke *tîr* e an jî ev şîr şîreke *tîr* e.

Termodinamik: Zanisteke bi heraret û hilmgermiyê re têkil e. Termo-ı, dinamik-hareket. Di ferhengê de ji bilî termên fenî gelek peyv cih girtine. Peyvên folklorîk kê in û peyvên zanistê zêdetir tê de hene.

*Ferhenga Termên Matematîkê* ji aliyê Dilawer Zeraq û Mem Wenda ve hatiye amade kirin. Di çar salan de hatiye çêkirin û çapa yekem di sala 2015an de ji aliyê Weşanên Lîsê ve li Amedê hatiye weşandin. Ferheng ji du beşan pêk hatiye. Beşa yekem bi Kurdî- Fransî- Îngîlîzî-Almanî-Tirkî û beşa dûyem jî ji Rêzîna Tirkî-Kurdî pêk hatiye. Di beşa yekem de bi qasê 6 hezar peyv cih girtine, di beşa duyem de jî bi qasê 8790 peyv cih girtine. Ev ferheng ji 374 rûpelan pêk hatiye û bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn (Dilawer Zeraq û Mem Wenda, 2015:1-7).

*Kurdî û Matematîk*

*Wekî hemû zimanan, Zimanê Kurdî jî xwedî mantiq û matematîkeke hundirîn e. Zimanê Kurdî hem ji alî hev girtîbûna mantiqa xwe a hundirîn ve hem jî ji alî sererastbûna gramerê ve, tu kêmasiyeke xwe nîn e. Loma jî, wekî hemû zimanan, zimanê Kurdî jî di nava xwe de matematîkê dihewîne; û her wiha bi saya vê matematîkê jî, ji alî zimên û mantiqê ve pir bi hêsanî bi matematîkaku li ser jimêryarî, arîtmîk, cebîr û geometrî û beşên di avabûyî re li hev dike. Me jî di amadekirina xwe vê ferhengê de piştî xwe spart van*



*taybetiyên Zimanê Kurdî ku gelek rêyên ku li rêyên dîtir vedibûn, nîşanî me dida û ji bo avakirin û bikaranîna peyv û têgihan rê li ber me dixist. Her wiha, me di avakirina hin têgehên de, carinan mantiqa matematîkê da pêş, carinan zimanê matematîk û zimanê Kurdî digel hev meşand, carinan jî me piştî xwe spart taybetiyê matematîkê û tenê mantiqa Zimanê Kurdî anî pêş.*

*Heke me bivê ku em mîna keke bo vê yekê derpêş bikin, em ê karibin, peyva 'kêmîn'ê ku bi Tirkî 'çıkarma işkemi' û bi Îngîlîzî jî wekî 'subtraction' tê pêş. Herçî peyva bi Îngîlîzî ye hem bi wateya, 'kêmkirin' hem jî bi wateya 'derxistin' tê pêş. Û ev peyv, bi Tirkî jî bi wateya, 'derxistinê' tê pêş. Û ev her du peyv jî: 'kêmîn' 'derxistin- deranîn', hem li mantiqa matematîkê hem jî li mantiqa zimên tên. Di neqandina peyvên 'kêmîn' û 'derxistin- deranîn'ê de, me serî li mantiqa avabûna peyvsaziya Kurdî da û em li ser felsefeya vê peyvsaziyê sekinîn (Dilawer Zaraq û Mem Wenda, 2015:8-9).*

Peyvên matematîkê wekî zanistiye ku di nav gel de zêde nehatiye 'emilandin, ji ber vê peyvên ku di ferhengê de cih girtine zêdetir hilm û bêhna û t'ema Kurdî jê nayê. Lê hin peyv jî henin ku di nav gel de de tên gotin. Ji ferhengê çend mînak;

*arîtmîk: (fr. aritmétique, İng.aritmetik, alm. arîtmîk, tr. arîtmîk) (Dilawer Zaraq û Mem Wenda, 2015: 13).*

*açî: kujî (Dilawer Zaraq û Mem Wenda, 2015:216).*

*açîortay: kujînivke; açîölçer: kujîpîv (Dilawer Zaraq û Mem Wenda, 2015:217).*

*artî: zêdek; artî: zêde. (Dilawer Zaraq û Mem Wenda, 2015:223).*

*bölme(işaret olarak): parînek; bölme (işlem olarak): parîn; bölme (okunurken): par. (Dilawer Zaraq û Mem Wenda, 2015:235).*

*Çarpma (işaret olarak): carînekçarpma (işlem olarak): carîçarpım: caran. (Dilawer Zaraq û Mem Wenda, 2015:241).*

*çıkarma(eksi negatif işareti (-): kêmek; çıkarma (eylem olarak): kêm kirin; çıkarma (işaret olarak): kêmînek; çıkarma (işlem olarak): kêmîn; çıkarma (okunurken): kêm; çıkarma: kêmîn (Dilawer Zaraq û Mem Wenda, 2015:243).*

*orantî: rêjetî. (Dilawer Zaraq û Mem Wenda, 2015:326).*

*Toplama (artî pozitif işareti (+): zêdek; toplama (eylem olarak): komkirin; toplama (işaret olarak): komînek; toplama (işlem olarak): komîn; toplama (okunurken): kom; toplama: koman. (Dilawer Zaraq û Mem Wenda, 2015: 359).*

Bi navê ferhenga termên matematîkê li ser înternetê gelek xebat hatine çêkirin. Lê ev xebat têr nedikirin ji bo vê ev xebat hatiye çêkirin. Li ser înternetê jî bi qasê 8 rûpelan xebateke hatiye çêkirin.

Di sala 1787an de li Rusyaya Çarîfî P.S.Pallasê Almanî, ferhengeke bi navê Ferhenga Muqayeseya Hemû Ziman û Zaravayan xebatekî çêkiriye. Ev ferheng li Rusyaya Çarîfî wek xebata herî ewil ya li ser Kurdolojiyê tê zanîn (Rohat, 1991: 5-6).

### **Ferhengên Zazakî**

*Ferhenga Zazakî(Dimilî)-Tirkî* di sala 1987an de li Stockholmê ji aliyê Malmîsanij ve hatiye çêkirin. Bi zaravayê Zazakî wek ferhenga yekem tê zanîn. Li Weşanxaneya Jina Nû de hatiye weşandin. Çapa duyem di sala 1992an de li Stenbolê ji aliyê Weşanxaneya Dengê ve hatiye weşandin. Ferheng 431 rûpelan pêk hatiye û nêzê 20 hezar bêje tê de cih girtine (Yıldırım, 2008: 108).

*Ferhenga Kurdî (Kirmackî/Zazakî)-Tirkî* di sala 1994an de li Stockholmê ji aliyê Munzur Çem ve hatiye çêkirin. Di destpêkê de li ser rêzimanê rawestiye. Ferheng 589 rûpelan pêk hatiye (Yıldırım, 2008: 109).

Malmîsanij, ferhengeke *Kirdkî-Pehlevkî-Kurmanckî* di sala 1997an de li Stockholmê çap kiriye (Yıldırım, 2008: 109).

*Ferhenga Zazakî-Tirkî/ Zazaca-Türkçe sözlük* di sala 1997an de li Stenbolê ji aliyê Mesut Özcan ve hatiye amadekirin. Amadekirina ferhengê li gor devoka Dêrsimê êsas hatiye hildan û li gor wî amade kiriye. Ferheng 234 rûpelan pêk hatiye û nêzê 10300 peyv cih girtine. Ferheng bi alafabeya latînî hatiye nivîsîn û ji aliyê weşanxaneya Kaynakê ve hatiye çapkirin (Özcan, 1997:1- 12).

*Ferhenga Zazakî-Tirkî/Tirkî-Zazakî* ji aliyê Turan Erdem ve di sala 1997an de li Stenbolê hatiye çapkirin. Ji aliyê Weşanxaneya Dozê ve hatiye weşandin. Ev ferheng di sala 2006an de ji aliyê Turan Erdem û Orhan Erdem ve hatiye berfirehkirin û di weşanên Aryayê de hatiye weşandin. Çapa yekem 222 rûpelan û 9 hezar peyv, çapa duyem jî 440 rûpelan û 14 hezar peyv pêk hatiye. Di pêşgotina ferhengê de tê diyarkirin ku amadekirina vê ferhengê di sala 1993an de dest pê kiriye. Ferheng bi alafabeya latînî hatiye nivîsîn (Erdem T., Erdem O., 2006:1-12).

*Ferhenga Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî* ji aliye Komala Xebatê ya Vateyê ve hatiye amadekirin. Amadekarên çapê M. Malmîsanij, Mehmet Uzun û J.Îhsan Espar e. Grûba Xebate ya Vateyê bi navê Ferhengê Kirmanckî(zazakî)- Tirkî/ Kirmancca(zazaca)-Türkçe Sözlük gelek caran hatiye çapkirin.

Grûba Xebate ya Vateyî çapa yekem di sala 2001an de li Stenbolê hatiye weşandin. Ferheng ji 256 rûpelan pêk hatiye û weşanxaneya avestayê de hatiye weşandin. Di ferhengê de nêzê 13 hezar peyv cih girtine.

Grûba Xebate ya Vateyî çapa dûyem ya berfireh kirin di sala 2004an de li Stenbolê hatiye weşandin. Ferheng ji 400 rûpelan pêk hatiye û weşanxaneya vateyê de hatiye weşandin. Di ferhengê de nêzê 28 hezar peyv cih girtine.

Grûba Xebate ya Vateyî çapa sêyem ya berfireh kirin 2009an de li Stenbolê hatiye weşandin. Ferheng ji 624 rûpelan pêk hatiye û weşanxaneya vateyê de hatiye weşandin. Di ferhengê de nêzê 40 hezar peyv cih girtine.

Grûba Xebate ya Vateyî çapa çaremîn 2011an de li Stenbolê hatiye weşandin. Ferheng ji 624 rûpelan pêk hatiye û weşanxaneya vateyê de hatiye weşandin. Di ferhengê de nêzê 40 hezar peyv cih girtine. Ji van nêzê 20.000 peyvên varyant in, 5.000 jî lêkerên hevedudanî ne. Peyvên vê çapê di encama 17 cîvînên Koma Xebatê ya Vate de hatine tespît kirin. Di cîvînên Koma Xebatê ya Vateyê de rêzikên rastnivîsîna vê zaravayê tê tespît kirin, li ser peyv û têgehên di hundirê çarçoveyek de nîqaş tên kirin. Di encamê de li gor piraniya fikrê komê formeke peyv yan jî têgehê wekî standart tên qebûl kirin (Grûba Xebate ya Vateyî, 2009: 2-10).

Harun Turgut bi navê *Ferhenga Zazaca-Türkçe sözlük/ Zazakî-Tirkî* ferhengek amade kiriye. Çapa yekem di sala 2001an de hatiye çapkirin. Ferheng 336 rûpelan û nêzê 19 hezar peyvên pêk hatiye. Çapa duyem jî di sala 2006an de hatiye çapkirin. Ferheng 403 rûpelan û nêzê 24 hezar peyvên pêk hatiye. Ji aliyê Weşanxaneya Tijê ve hatiye weşandin. Ev ferheng bi axaftina herema der dorê Palu û Karakoçan ve bihed maye. Di ferhengê de wekî Malmîsanij; di şûna "i" de "î"; di şûna "î" de "i" bi kar aniye. Harun Turgut, di sala 2008an de bi navê *Tirkî-Zazakî* ferhengeke din amade kiriye. Ev ferheng 410 rûpel e û ji aliyê Weşanxaneya Do yê ve hatiye weşandin. Hemî çapên ferhengan bi alfabe ya latînî hatiye nivîsîn (Turgut, 2001:1-4; Turgut, 2006:1-5).

*Ferhenga/Vajname Kurmancî-Hewramî-Zazakî* ji aliyê Seîd Veroj û Abdurrahman Uçaman ve hatiye amadekirin. Di sala 2002an de li Stenbolê û ji aliyê Weşanxaneyê Warê ve hatiye weşandin. Seîd Veroj, bi navê *Kurmancî-Dimilî* ferhengeke din amade kiriye. Ferheng di sala 2003an de li Stenbolê û ji aliyê Weşanên Warê ve hatiye weşandin. Seîd Veroj, di sala 2010an de ji aliyê Kovara Bîr ve ferhengokeke amade kiriye (Yıldırım, 2008: 111).

Mehmet Aydar, di sala 2003an de bi navê *Zazaca-Türkçe sözlük/ Zazakî-Tirkî Qalier* ferhengek amade kiriye. Ferheng 440 rûpelan û nêzê 17 hezar peyvên pêk hatiye. Ferheng li Stenbolê ji aliyê Weşanên Dorukê ve hatiye weşandin. Aydar, di vê ferhengê de behsa wan zimannasên ku li ser Zazakî xebitîne kiriye. Amadekirina ferhengê li gor devoka Çewlêqê hatiye çêkirin. Di pêşgotinê de li ser peyva Zaza jî rawestiye (Aydar, 2003: 2-13).

Hûseyîn Çakmak, bi *Kirmanckî-Dimilkî-Sobê* ferhengeke amade kiriye. Bi giştî li ser herêma Dersîmê rawestiye. Ferheng di sala 2004an de ji aliyê Weşanxaneyê Kalan ve hatiye weşandin. Nivîskar di pêşgotinê de behsa armanca amadekirina vê ferhengê kiriye (Varol, 2011: 359).

Roşan Lezgîn di sala 2005an de ferhengeke bi navê *Ferhengê Îdyomanê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî* amade kiriye. Di vê ferhengê de 2700 îdyomê Kirmanckî cih girtine. Ferheng 210 rûpelan pêk hatiye û ji aliyê Weşanên Vateyê de li Stenbolê hatiye weşandin (Yıldırım, 2013: 70).

Musa Canpolat, di sala 2006an de ferhengeke *Zazakî-Tirkî* amade kiriye. Musa Canpolat di sala 1970an de dest bi xebata vê ferhengê kiriye, lê mîxabin hinek tengasî çêbûne. Ji ber vê yekê di sala 2006an de li Stenbolê ji aliyê matbaaya Can ve tê çap kirin. Ferheng 992 rûpel e (Canpolat, 2006:2-7).

Çeko Kocadağ, di sala 2010an de ferhengeke *Kirmanckî (Zazakî)-Kurmancî/Kurmancî-Kirmanckî (Zazakî)* amade kiriye. Ferheng li Berlînê ji aliyê Weşanên Komkar ve tê weşandin û 1075 rûpel e (Varol, 2011: 360).

Alî Ekîcî, di sala 2010an de li Stenbolê bi navê *Türkçe- Zazaca/Qesexaniya Tirkî-Kirmanckî/ Dimilki-Zazaki* ferhengeke amade kiriye. Ferheng 223 rûpelan pêk hatiye û tê

de nêzê 8500 peyv hene. Amadekirina ferhengê li gor devoka Dêrsimê( Özelde Ovacık- Hozat- Çemişgezek) êsas hatiye hildan û li gor wî hatiye amadekirin. Ferheng bi alfabeya latînî hatiye nivîsîn ji aliyê Weşanxaneyê Kardelenê ve hatiye weşandin. Di ferhengê de beşeke 6 rûpelî ji bo rêzimanê hatiye veqetandin ( Ekici, 2010:1-10).

Roşan Lezgin, di sala 2013an de ferhengeke *Berîkê bi Kurdî (Zazakî)-Tirkî û Tirkî-Kurdî (Zazakî)* amade kiriye û li Stenbolê çap kiriye. Mîzanpaja vê xebatê ji Weşanxaneyê Roşnayê ye, û li matbaaya Berdan hatiye çap kirin. Bingeha vê ferhengê ji rojnameya Newepel tê. Di amadekirina vê ferhengê de ji Komala Vate û ferhenga M. Malmîsaniyê îstîfade kiriye. Di beşa Kurdî (Zazakî)-Tirkî de 9.021 peyv, di beşa Tirkî-Kurdî (Zazakî) de jî 7.632 peyv hene (Lezgin,2013).

Kamber Akbalık bi navê Ferhenge Kirmanckî- Tirkî/ Türkçe- Kirmancki Sözlük ferhengek amade kiriye. Ferheng di sala 2011an de li Stenbolê û di nava weşanên El de hatiye weşandin. Ferheng ji 288 rûpelan û nêzê 18 hezar peyvyan pêk hatiye. Ferheng bi alfabeya Latînî hatiye nivîsîn. Nivîskar li gor axaftin û telaffûza Hozat û Ovacikê ferhengê çêkiriye. Nivîskar zimanê xwe Kirmancki an Zazakî di nav vî gengeşiyê de ya rast lazim e ku bê Kirmanckî an jî Kirmanccadır. (Akbalık, 2011: 8). Di ferhengê de behsa malbata ziman û alfabeyê jî kiriye. Di ferhengê de tîpa "ğ" cih girtine. Mînak; ğelet: hatalı, yanlış- ğıl: moloz, çakıl- ğeal: hayal hwd (Akbalık, 2011: 63).

Serkan Oğur bi navê Farsça- Zazaca- Kurmancca Mukayeseli Gramer ve Temel Sözlük ferhengek amade kiriye. Ferheng çapa duyem ya berfireh di sala 2014an de li Stenbolê û di nava weşanên Yazılamê de hatiye weşandin. Ferheng 349 rûpelan pêk hatiye. Ferheng bi alfabeya Latînî hatiye nivîsîn. (Oğur, 2014: 2-5). Di ferhengê de behsa malbata ziman û alfabeyê jî kiriye.

R. Hayıg û B. Werner bi navê *Zazaca- Türkçe Sözlük/ Türkçe- Zazaca Sözcük Listesi* ferhengek amade kiriye. Ferheng di sala 2012an de li Stenbolê û di nava weşanên Tîj de hatiye weşandin. Nivîskar di sala 1995an de dest bi vê xebatê kiriye. Ferheng 448 rûpelan pêk hatiye. Di ferhengê de di beşa Zazaca- Türkçe Sözlük de qasê 12 hezar peyv di beşa Türkçe- Zazaca Sözcük Listesi de jî qasê 12 hezar peyv cih dane. Ev ferheng bi usûleke berfireh hatiye amade kirin ku hemû devokên zazakî di heman astê de nirxandiye (Çermik- Çüngüş- Siverek- Gerger). Ferheng bi alfabeya Latînî hatiye nivîsîn. Di

ferhengê de behsa malbata ziman, gramer û alfabe-yê jî hatiye kirin (Hayig û Werner, 2012: 9-26).

Sözlükdeki varyantların toplandığı köy adları:

Köy Adları	Şehir	Köy Adları	Şehir
Akrag	Çermik	'Hesûd	Çermik
Aldûşek	Gerger	Mexmûr	Çermik
Axırmat	Çermik	Miyalan, Mûskan	Çermik
Bab, Bahser	Siverek	Nişnig	Çermik
Bawank	Çermik	Ninyat	Gerger
Belwan	Çermik	Piran	Çüngüş
Bêsin, Birût	Çermik	Qelacıx	Çermik
Bibol	Gerger	Qerxan	Siverek
Bir	Çermik	Qırwar	Siverek/Çermik/Gerger
Birêveran	Çermik	Qula	Gerger
Bûdran	Çermik	Sa'hrık	Siverek
Cılar	Çermik	Sinag	Çermik
Derdere	Çüngüş	Şêxanê Cori	Çermik
Feqi	Siverek	Şinto	Çermik
Gewrek	Çermik	Vilayrek	Çermik
Gurız	Çermik	Xeybiyan	Çermik
Hebırman	Gerger	Xoy	Çüngüş
Helûl	Gerger	Zeyndelan	Çermik
'Hesno	Çermik	Zibêdik	Çermik
'Hesran	Çermik		

<sup>1</sup> Yaklaşık 200 Zazaca asıllı, alıntı olmayan sözcük, Pehleviyeyle olan dil akrabalığı MacKenzie'nin sözlüğü (1971) ile kanıtlandır. Bu çalışmamızda MacKenzie'nin 1971'deki transkripsiyon kullanılmıştır: Ünlüler üzerindeki çizgi ünlünün uzunluğu belirtir (ā, ē, ī, ō, ū), şapkalı ünsüzler de (š, j, ç) Zazaca ve Türkçe alfabedeki ş, ç ve harflerini karşılar.

*Ji ferhenga R. Hayig û B. Werner bi navê Zazaca- Türkçe Sözlük/ Türkçe- Zazaca Sözcük Listesi rûpelek mînak.*

## ENCAM

Ferheng sîstemeke berfireh e ku tê de hêmanên cuda bi ahengê bi hev re dixebitin. Ferhengnasî jî şaxezanistek e ku her cihê vê sîstemê kontrol dike û ji bo wergirtina netîceyên baştir hewl dide. Ji ber vê ferhengnasî xwediyê çarçoveyê pir berfireh e ku di vê çarçoveyê de ji sedemên nivîsîna ferhengê heta amûrên ferhengî, ji nivîsîna ferhengê heta gihîştina cem xwendevanan gelek rewş hene. Her wiha meriv dikare ferhengnasiyê wekî şaxezanistekê navberdisîplînî binirxîne ku her cure vekolînên di derbarê ferhengê de pêk tîne û hemû xebatên amadekirina ferhengê di nav xwe de dihewîne.

Ferhengnasî ku di nîvê sedsala dawî de gelek pêşketinan pêk aniye êdî wekî şaxezanistekê serbixwe tê nirxandin. Lê belê di vê pêvajoyê de di derbarê hebûna ferhengnasiyê de gelek fikrên cuda jî hatine gotin. Mesela hinekan diyar kirine ku ferhengnasî şaxezanistek nîne û digel vê hinekan jî wê di binê banê zimannasî û peyvsaziyê de nirxandine. Di salên dawî de bi pêşketina teknolojîk ve kar û xebatên li ser ferhengnasiyê jî gelek pêş ketine. Di encama vê pêşketinê de ferhengnasî jî bûye wekî şaxezanistekê serbixwe û navberdisîplînî. Îro li dinyayê ev zanist bi giştî bi peyva lexicographyê tê dîar kirin ku di zimanê Tirkî de ji bo vê ferhengnasî, zanista ferhengê, ferhengvanî û hwd tên bikaranîn. Di nav van nalêkirinan de navên ferhengvanî û leksîkografiyê di nav Ferhenga Rojane ya Saziya Zimanê Tirkî de hatine bikaranîn. Lê belê ji ber ku navê ferhengvanî çarçoveya ferhengnasiyê nikare tijî bike û leksîkografi jî peyveke ne Tirkî ye her du jî cihê ferhengnasiyê nagirin. Divê ku li şaxezanistên nêzîkê ferhengnasiyê bê temaşe kirin (watesazî, peyvsazî û zimannasî) û li gorî wan naveke nû bê dariştin ku ew jî ferhengnasî ye.

Ferhengnasî qadeke navberdisîplînî ye ku digel gelek daneyên zimanî daneyên derveyê zimanî jî di nav xwe de dihewîne. Ji ber vê bi gelek şaxezanistan re têkiliyên wê yên berfireh hene. Ferhengnasî carinan di derbarê peyvan de daneyên peyvsaziyê, carinan di derbarê meneyê de daneyên watesaziyê, di derbarê şiklê de daneyên hevoksaziyê û di derbarê dangan de daneyên fonolojiyê bikar tîne. Digel van ji bo agahiyên di dest da tesnîf bike û ji bo agahiyan wekî ferheng bigihîjîne destê xwendekaran ji derfetên teknolojîk û teknîkên bazirganiyê jî îstîfade dike.

Di dinyayê de ji salên 1980î vir de eleqeya ji bo ferhengnasiyê zêdetir bûye û di derbarê vê qadê de gelek berhem hatine dayîn lê belê li Tirkiyeyê ev rewş hinek li paş maye. Li Tirkiyeyê bi tenê hin jimarên taybet yên hin kovaran ji bo vê mijarê weşan

kirine. Digel vê bi alîkariya Saziya Zimanê Tirkî û zanîngehan ve hin çalakiyên zanistî ji bo qada ferhengnasiyê hatine kirin.

Îro li Tirkiyê vekolînên ferhengî hema hema bi tevahî li zanîngehan pêk tê. Lê belê ji ber ku li zanîngehan hê jî makezanista ferhengnasiyê nehatiye damezirandin, xebatên qada ferhengnasiyê jî her ku çûye li paşiya xebatên dinyayê maye. Ji bo ku pêşî li vê rewşê bê girtin divê ku li zanîngehan di warê akademîk de ferhengnasî wekî makezanist bê qebûl kirin û di vê mijarê beşên hewce bîne damezirandin.

Di encama vê vekolînê de hate dîtin ku li dinyayê kar û xebatên gelek saziyan bi tevahî li ser ferhengnasiyê ye. Lê belê li Tirkiyê hê avabûneke bi vî şiklî tune ye. Li Tirkiyê ev bar li ser milê Saziya Zimanê Tirkî ye. Bi rastî digel xebatên din xebatên ferhengnasiyê ji quweta saziyê der dixuyê. Ji ber vê sazî nikare kesên ku bi ferhengan re eleqe dikin di bin banek de bicivîne û xebateke organîze pêk bîne. Her wiha li Tirkiyê kesên ku vî karî wekî pîşe pêk tînin û kesên ku di saziyan de vî karî dikin di binê banek de nekarîne werin cem hev. Ev jî bûye sedem ku agahiyên teorîk gelek venegere berhemê û negihîje destê xwendevanan. Ji ber vê jî di piyaseyê de gelek ferhengên ku ji meqseda xwe der in hatine çapkirin. Ji bo divê ku bi awayekî acîl derbarê her zimanê de Saziya Ferhengnasiya Tirkiyê bê damezirandin.

Ev xebat ji bo ku gotinên berê radigihîne qedemeyek bilind û ji pêşketinên dawî xeberdar dike muhîm e. Lazim e ku têkiliya ferhengnasî û peyvsaziyê, sînorên ferhengnasiyê kifşe bike û wê bi xetên giştî dayne holê, daxuyaniya termê û wergera wê, Li vê derê jî xebatên di derbarê qadê de bi awayekî giştî û bi nimûneyên ji dinyayê hatine pêşkêş kirin û muqayese kirin. Roj bi roj zêdebûna van xebatan ji bo kifşekirina mahiyeta ferhengnasiyê gelek muhîm e. Bi van xebatan ve divê ku sînorên ferhengnasiyê bê kifşe kirin, û divê ku ji bo pêşengiyê planeke xebatê bê amadekirin da ku di qadê de vekolîn û xebat bîne birêvebirin.

Xebatên zanistî yên di qada ferhengnasiyê de gelek kêr in. Bi lezgînî pêwîstî bi monografîyên teorî, qad, termînolojî, armanc û pirsgerêkên ferhengnasiyê hene. Lazim e ku saziyekî tekûz ferhengên ku heta îro hatine nivîsîn bi baldarî vekolîn bike noqsanî û kêmasiyên wan tespît bike, her wiha aliyên wan ê pêşketî jî bixe rojevê û di vê rêyê de pêşketinek pêk bîne. Ev saziya ku barê vê organîzasyonê hildide ser milê xwe, dê di warê xebatên ferhengnasiyê de pêşketinekî mezin pêk bîne.



Ji bo ferheng çêkirinê hewceye ku mirov bêjeyan berhev bike. Berhevkirina bêjeyan ked û emek dixwaze. Ji bo vê karê, divê li afirandinên edebî û zanistî yên kevn û nû baş bê nihêrîn û fêhm kirin. Bêje lazim e ku ji nava gel bête kom kirin. Gund, ji bo berhevkirina bêjeyan çavkaniyeke herî girîng û mezin e. Bêjeyên nûser yên ku li gundan dijîn dizanin û bi kar tînin. Hin peyv û têgeh hene ku eşkalekî gerdunî standine û ne hewceye ku di şûna wan de gotinên nû bête çêkirin. Çêtir e ku em peyv û têgehên wiha di zimanê xwe de jî biparêzin. Lewra ev di gelek zimanên dinyayê de jî yek in. Lê belê, hin peyv û têgeh hene ku li bejn û bala zimanê Kurdî nayên. Zirr û bêpîr in, wek şûjin an diriyê ku çewal çirandine û derketine der xuya dikin. Bi kirasê Kurdî re naçin ser hev, bi sewt, awaz û ahenga Kurdî re li hev nakin, li bejn û bala Kurdiya şêrîn û narîn nayên. Hê ji dûr ve xwe kifş dikin. Loma divê ji bo peyv û gotinên wiha, ji axa Kurdî, ji baxçê gulistana Kurdî, bi gotineke din ji qumaşê Kurdî peyv û têgehên nû werin birîn an danîn. Peyv û têgehên ku xweş li bedena Kurdî rûdinên û pê dikevin. Peyv û têgehên ku Kurd xerîbiya wan nakşînin; dizanin ku ji axa Kurdî, ji milkê Kurdî firiyane. Hilm, bêhn û tîna Kurdî ji wan tê.

Li ser girîngiya berhevkirina ferhengên Kurdî heta niha gelek tişt hatine gotin. Ne tenê berhev kirin, divê tiştên ku tên berhev kirin bi awayekî zanistî bêne analîz kirin. Em baş dizanin gelek berhemên ku hatine berhev kirin jî baş nehatine nirxandin. Bi taybetî jî ferhengên ku di demên dawî de hatine çêkirin. Wisa xuya dike ku bi gelemperî ew ferhengên ku demên dawî de hatine çêkirin te'ma Kurdî nadin dilê mirovan. Mixabin nexweşiyêke di nav rewşenbîr û nivîskaran de belav e, ew jî bikaranîna peyv û têgehên bi zimanêke din e (Tirkî, Îngîlîzî, Farsî hwd). Bi zimanên din difikirin û rasterast werger dikin. Ev yek ji bo pêşerojê û geşbûna ziman xeter e.

Ev xebata ku me kir hin probleman anî berçav. Di esnaya van xebatên ku hem di bin bandora kartêkerên ekonomîk û civakî de bi awayekî tijî dewam dikin têgehên lexicology û lexicography tene tevlêhev kirin û heta dixuyê ku ji alê naverok û qadê ve jî di hişê nivîskaran de şîlobûnek heye. Ji ber vê yekê ez jî wek *Ferhenga Têgehên Zimannasiyê/ Dilbilim Terimleri Sözlüğü* (1979:179) ku ji gelek aliyan ve "hev girtî" dibînim têgeha leksigokrafîyê bi têgeha ferhengnasiyê îzah bê kirin çêtir e. Ji aliyê din ve pirs ku ferhengnasî (lexicography) wek şaxekî zanistî tê qebûl kirin yan nayê qebûl kirin jî bê bersiz dimîne. Eger ku em ferhengnasiyê wek şaxekî zanistî (yan jî qada vekolînê) qebûl bikin lazim e ku em teorî, tixûb û rêbazê vê qadê jî bînine ziman. Axir, lazim e bi

esasiya wan faliyetên ku li jor hatine vegotin "vekolîna ferhengî" bê qebûl kirin û tixubê wî bê diyar kirin. Problemeke jî çêkirina ferhengan ne bi sere xwe lazim e ku bi qomisyonan ve bê çêkirin.

Me di vê xebatê de bi perspektîfeke berfireh behsa ferhengên di hemû diyalektên Kurdî de kiriye. Xebata me de wek rêbaz di derbarê her ferhengê de agahiyên kunyeyê daye û di derbarê naverokê de jî bi kurtasî agahî daye. Li gel vê, ferhengên ku di vê xebatê de cih girtine ji aliyê kêmasiyan ve jî hatine rexne kirin. Herwiha me ji nusxeyên resen yê hinek ferhengan ji bo ku bibe mînak rûpel li xebata xwe zêde kiriye.



## ÇAVKANÎ





- Akalın, Ş. H. (2010). "Sözcük Bilimi ve Sözlükçülük" Atatürk Kültür Ve Tarih Yüksek Kurumu Türk Dil Kurumu: Ankara.
- Akin, S.( 2013). *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî*, Stenbol: Weşanên Avesta.
- Balkhkanlou, A. (Azad Makûyî). (2011). *Wêneferhenga(PhotoDictionary) Îngîlîzî-Frensî- Kurdî(Kurmancî)/ English- French- Kurdish(Kurmanji)*. Tehran.
- Anter, M. (1967). *Ferhenga Khurdî-Tirkî*, Stenbol: Enstîtu Kurdî ya Parîsê.
- Aslanoğlu, O. û y. d. (2011). *Ferhenga Pirzimanî*, İstanbul: Nûbihar.
- Aslanoğlu, O. (2009). *Ferhenga Çapameniya Kurdî*, İstanbul: Nûbihar.
- Aydar, M. (2003). *Zazaca-Türkçe Sözlük*. İstanbul: Doruk.
- Baran, M. (2013). *Ferhenga Kurdî- Tirkî/ Türkçe - Kürtçe*. İstanbul: Ozan.
- Baskın, S. (2014). "Türkiye ve Dünyada Sözlük Bilimi: Tanımı, Kapsamı ve Diğer Bilimlerle ilişkisi/ Lexicography in turkey and throughout the world: the definition and the scope of lexicography and its relationship with other sciences". *International Journal of Language Academy*. S.446- 454.
- Bingöl, Z. (2006). "Sözlük Ve Sözlükçülük Üzerine Bir Araştırma" *Akademik Bakış Dergisi*. Sayı 9: 198-202.
- Borak, M. (2005). *Ferhenga Biwêjan*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Botî, K. S. (2006). *Ferhenga Kamêran(Kurdî-Kurdî)*. Duhok: Weşanên spîrêz.
- Bozarslan, M. E. (2011). *Ferhenga Kurdi (cilda dıduyan E-K)*. Stenbol: Deng.
- Bozarslan, M. E. (2011). *Ferhenga Kurdi (cilda pêşin A-D)*. Stenbol: Deng.
- Bruinessen, M. V. (1985). "Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine evliya Çelebinin Notları",Fransa: *Studia Kurdica Dergisi*.
- Budak, Y. (2013). *Kurdî(Kurmancî)- Elmanî/ Kurdish- Deutsches*. Veng: Stenbolê.
- Canpolat, M. (2006). *Zazaca-Türkçe Sözlük*, İstanbul: Can.
- Celalî, M. Ê. ( 2014). *Gotinên pêşiyên ên kurdan*. İstanbul: Sîtav.




- Cemil Seyda, M. (1987). *Qamûsu'l-Heyat, Kurdî(kurmancî)- 'Erebî Ferhenga Jîn*. Bêrûd: Çapxana Emîralê.
- D.Cano û M.Şêrgo. (2003). *Ferhenga 'Erebî- Kurdî bi zaravayê Kurdmancî*. Lubnan.
- Dağlı, Y. û Kahraman, S. A. ( 2013). *Günümüz Türkçesi Evliya Çelebi Seyahatnâmesi 1-6*. İstanbul: yky.
- Dankoff, R. (2013). *Evliya Çelebi Seyahatnâmesi Okuma Sözlüğü*. İstanbul: yky.
- Demîrhan, U. (2007). *Ferhenga Destî (Kurdî bi Kurdî)*, Bazîdê: Weşanên Sewadê.
- Denîz, H. (2010). *Ferhenga Aboriyê(Tirkî-Îngîlîzî-Kurdî)*, Amed: Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Amedê.
- Dilawer Z. û Mem W. (2015). *Ferhenga termên matematîkê*. Diyarbakır: Lîs.
- Dirihî, E. (2013). *Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî*, Stenbol: Mardin Artuklu Üniversitesi.
- Diyadînî, B. (2014). *Ferhenga Bêwar*. Stenbol: J&J.
- Ebdo, S. E. (2006). *Ferhenga Ronak*. Suriye.
- Ekîcî, A. (2010). *Türkçe- Zazaca/Qesexaniya Tirkî- Kirmackî/ Dımilki-Zazaki* İstanbul: Kardelen.
- Farizov, İ. Ö. (çeviri Mehmet Demir). (1957). *Türkçe- Kürtçe Sözlük/ Ferhenga Tirkî-Kurdî*. Ankara: Özge.
- Farqînî, Z. (1992). *Ferhenga Mezin Tirkî-Kurdî*, Stenbol: Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê.
- Farqînî, Z. (2011). *FerhengaKurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî (navîncî çapa pêncemîn)*, Stenbol: Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê.
- Fırat, M. (2013). *Ferhenga Navên Riwakên Bi Kurdî*, Ankara: Weşanên Sîtav.
- Fossum, L.O. (1919). *A Practical Kurdish Grammar*. American Missionary: The Inter-Synodical Ev. Lutheran Orient- Mission Society.
- Grûba Xebate ya Vateyî. (2001). *Ferhengê Kirmanckî(Zazakî)-Tirkî*, Stenbol: Weşanxaneyê Vateyî.

- Grûba Xebate ya Vateyî. (2004). Ferhengê Kirmanckî(Zazakî)-Tirkî, Stenbol: Weşanxaneyê Vateyî.
- Grûba Xebate ya Vateyî. (2009). Ferhengê Kirmanckî(Zazakî)-Tirkî, Stenbol: Weşanxaneyê Vateyî.
- Grûba Xebate ya Vateyî. (2011). Ferhengê Kirmanckî(Zazakî)-Tirkî, Stenbol: Weşanxaneyê Vateyî.
- Gümgüm, B. (2015). *Ferhenga Termên Fenî Kurdî( Kurmancî)- Tirkî- Îngîlîzî, Fen Terimleri Sözlüğü Türkçe- Kürtçe- İngilizce, Dictionary Scientific Terms*. Stenbolê: Vakfa İsmail Beşikçi.
- Îzolî, D. (1992). *Ferheng (Kurdî-Tirkî Tirkî-Kurdî)*. Stenbol: Weşanên Dengê.
- Jaba, M.A. (1879). *Dictionnaire Kurde-Français*, St. Pêtersbourg: WeşanênPar ordre de l'académie impériale des sciences.
- Jaba, M. A. (2014). *Dictionnaire Kurde-Français*, St. Pêtersbourg: Weşanên Avesta.
- Kıran, A. (2014). *Ferhenga Zanistên Civakî*, Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Kocaman, A. (1998).” Dil bilim, Sözlük, Sözlükçülük”. *Kebikeç İnsan Bilimleri İçin Kaynak Araştırmaları Dergisi*, sayı:6. ss: 111-113.
- Koma Kurdîya Kurmancî (Azad Makûyî, Haşîm Mehmûdî, Şehnaz Omerzade, Nasir Ecemî, Mohsin, Qulîzade, Kejal Padaş, Efsûn Yûsifî). (2012). *Ferhenga Kurdî( Kurmancî)- Farsî*. Tehranê.
- Kurdistanî, 'E. E. (2010). *Ferhenga Kurdistanî*. Stenbol: Nûbihar.
- Kurdo, Q. (1960). *Ferhenga Kurdî-Rûsî*, Moskovê: Neşîrxana dewletê ya ferhengêd zimanê milletêd dereve û yê sovêtîstanê.
- L.Chyet, M. (2003). *Kurdish-English Dictionary*, London: Yale Üniversitesi.
- Mahabad, B.Q û N.Q. (2002). *Ferhenga Kurdî- Holendî/ Koerdisch- Nederlands*. Bulaaq: Amsterdam.
- Malmîsanij. (2012). *Ji bo rastnivîsînê ferhenga Kurdî(Kurmancî)-Tirkî*, İstanbul: Rûpel.
- Mazî, Ç. (2005). *Ferhenga Gotinên Pêşîyan*. Stenbol: Elma.





- Mukriyanî, G. (2010). *Ferhengî Kurdidtan*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Oncu, M. (2015). *101 Biwêj- Çîrok*. İstanbul: Avesta.
- Öncü, M. (2015). *Ferhenga Biwêjan*. Enqere: Sîtav.
- Önen, A. (2008). *Ferhenga Erdnigarîyê*, Stenbol: Weşanên Dozê.
- Özcan, M. (1997). *Zazakî-Tirkî/ Zazaca-Türkçe sözlük*. Stenbol: Kaynak.
- Pertev, R. (2012). *Mîrsadu 'l-Etfal/Şehranê Kodekan*. Mêrdîn.
- Robar, B. (2013). *Ferhenga Botan[Peyvên Wenda]*. Stenbol: J&J.
- Alakom, R. (1991). *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi(1787-1987)*, İstanbul: Weşanên Deng.
- Şirîn. (2006). *English-Kurmanjî, Kurmancî-Îngîlîzî Word List*, Dohuk: Weşanên Spîrêz.
- Erdem T. û Erdem O. (2006). *Ferheng Zazakî-Tirkî/Tirkî-Zazakî*: İstanbul: Arya.
- Turgut, H. (2001). *Zazaca-Türkçe Sözlük*, İstanbul: Tij.
- Turgut, H. (2001). *Zazaca-Türkçe sözlük/ Zazakî-Tirkî*. İstanbul: Tij.
- Turgut, H. (2006). *Zazaca-Türkçe sözlük/ Zazakî-Tirkî* İstanbul: Tij.
- Usta, H. İ. (2010). "Sözlükçülük ve Sözlük Araştırmalığı" Modern Türklük Dersgisi. Cilt 7. sayı 2: 93- 94.
- Usta, H. İ. (2010). "Sözlükçülük ve Sözlük Araştırmalığı" ModernTürklük Dersgisi.cilt7. Sayı 2: 94- 95.
- Usta, H. İ. (2010). "Sözlükçülük ve Sözlük Araştırmalığı" Modern Türklük Dersgisi.cilt7. Sayı 2: 96- 97.
- Varol, M. (2011). "Zazaca Sözlükçülüğünün Tarihi, Sorunları ve Çözüm Yolları", Bingöl: I.Uluslararası Zaza Dili Sempozyomu, Bingöl Üniversitesi.
- Yıldırım, K. (2008). *Nûbehara Biçukan(Ehmedê Xanî)*, İstanbul: Weşanên Avesta.
- Zinar, Z. A. (1992). *Nûbar Ehmedê Xanî*. Stenbol: Fırat.

PEVEK




















هذا كتاب نو بار الله شانی رحمة الله  
 بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِیْمِ  
 سبدهی هر علی نای عیلم حدوتنا و شکرانی  
 زیبوی و خالق رحمانی کوفصاحت بیان دایه انسانی  
 لسان دایه انسانی هندی صلواتن همی  
 برسول منہ امی کویونه پیروی دوی  
 عرب گوما جورومی زباش حدو صلواتان  
 اشد کنگنه زلفانان فیک خیزن احمدی خانی  
 نای

قواریه شوشه عمره هلو دخان دغ صومرو نای دور  
 مجمل هرینه سئل برین تکم خبره ان تبسم کتبت  
 بنادر مجل سرعه هرینه برین حدیقه و بستان و جنت برین  
 و کاتب نیشین مرکب میداد بلاوت چه خونین مجتهدان  
 کیشین برانه وصول و ورود هم آفراره چونه عروج و صعود  
 عرج لیکه و عوج خواریه اعانه و نصرت چه یار یار  
 زبان زده می ربوه عمر دبلند ضیافت قره روکی قریه کند  
 حد در ربع و قصد صلواتی همی رینه مهدی و هادی لیل  
 ریل زوری چونه هم هر ولد نیافت زبون بونه هم حوقله  
 شجاعت جلالت جوامیریه سفیرت بریح و شیع نهریه  
 رجم و رفت و لمکان بذله ذکر کیه و فرج و کنی خستیان  
 تدفق فریبین نلد دخواستی و کسقی اقدان نصارت کشتی

سکه انان وی پیغمبر و مشایخ کبریا  
 لیدی نامیده و جنتین او هفت حمت طبعین وی  
 وین آرضی دا بهت هستین و السراسمانان  
 رتی شش با وریه کو خیر و شر بقدر اویک  
 همی مژگ و عمل و مخلوقان زبویه نفیسینه  
 و معلومینک خدی زاول حتی باخر هر چه  
 بقوم و می و قوت نفیسینه  
 به کجای و نیکه هر سال الفی  


کجی زوی عرب و کیمیا علم دنیانه و زحمت بونا و نشی  
 و خیانتی و سرداریا بد اصلا نه و هر چه وی کوی  
 زواقیات و حشری و کی مور بونا چانه و گرگر  
 بونا ایسانانه و در زایانای سیر کانه و بی نور بونا  
 روز و هیفانده و سیکل بون و هیشک بونا بحرانه و صیر  
 فان همی حقی بی شک و بی بقومین مخلوق جوماع  
 بین شایر جمع بین کاغذی خیر و شران یکفنه دست  
 مروف عمل بیته حساب کرن سؤلا عملان وی بکون  
 به میرانی بیته کیشانوت تو عملی جزا نایب  
 یسرمانا خدی بری وی دیننه سر جهمی هشتی  
 وی در ناس بین هرنه سر جوماس کورنی  
 جهمی وی بلرزن یکفنه اکدی شفاعت





# فرهنگ

## کردی (کرمانجی) - فارسی

۲۷۰۰۰ واژه  
به ترتیب میزان فعالیت :

علی پاک سرشت، شهناز عمرزاده

هاشم محمودی، ساریا آران  
کاروان کوچر، منصور شمسی

ناصر عجمی، محسن قلی زاده،  
شیرین دولت پور، کزال پاداش،  
افسون یوسفی

*Kurmancî / ۱*

۴۵۷

# فرهنگ

## کردی (کرمانجی) - فارسی

آزاد ماکویی (ع.ب.)، هاشم محمودی،  
شهناز عمرزاده، ناصر عجمی، محسن قلی زاده،  
کزال پاداش، افسون یوسفی

*Kurmancî / 1*

# فرهنگ گولی

## فارسی - کوردی

مسعود خالد گولی

---

دعوی 2002

# قاموس





## عربی - کردی





(الجزء الأول)

اعداد




د. جانو م. شرکوه



























علم داريا منا محنتي ما تهلر

كلمت منا محنتي ما تهلر

افندي حضرتنا حضرتنا

نقص داريا محنتي ما تهلر  
۱۲

برالاي  
سليمانى


عبدالله


Kitabın bir nüshasını Süleyman Nazif'e armağan eden Miralay  
(Albay) Emin Feyzi'nin sunuş yazısı ve imzası :

«İlim ve edebın misal-i muhteşemi, fazl ve kemalin timsal-i  
mücessemi Süleyman Nazif Beyefendi Hazretlerinin, huzur-u  
samilerine takdim ve ihda olunmuştur. 12 Şubat Sene 41 (1925)



Miralay  
Süleymaniyeli  
Emin Feyzi»

*Ji Ferhenga Yusif Ziyaeddîn Paşa El-Hediyyetu'l Hemîdiyye fi'l luxeti'l-Kurdiyye*













**Ferhenge Zimanê**

Kurdi – Tirkî Türkçe – Kürtçe

Berhevkirin û çapandin

**Sinan Alptekin**

Kilianstr. 17 D-33142 Büren-Brenken  
Tel.: +49 29 51 931 782  
Fax: +49 29 51 932 116  
e-mail: alptekin@uni-paderborn.de  
internet: www.alptekin.de

Paderborn, dem Adar 29, 2003 Almanya

## KURTEJIYAN

Ümit IŞIK 30.12.1983an de li Muşê hat dinyayê. Dibistana seretayî, ya navîn û lîsê li Muşê qedand. Di sala 2004an de li zanîngeha Yuzuncu Yilê(Y.Y) Fakulteya Fen Edebiyatê beşa Kîmyayê mezûn bû. Heman salê li zanîngeha Y.Y dest bi lisansa bilind ya bêtez kirî û 2005an de mezun bû. Peyra di şaxa makezanista Fîzîkokîmya de dest bi mastêrê kir. Di sala 2013an de li zanîngeha Muş Alparslanê lisansa bilind ya bêtez qedand. Di sala 2014an de li zanîngeha Muş Alparslanê, Enstîtûya Zanistên Civakî dest bi Mastîrê kir. Niha li zanîngeha Muş Alparslanê de weke erkedarê hîndekariyê dixebite. Zewicî ye û du zarê wî hene.



## ÖZGEÇMİŞ

Ümit IŞIK 30.12.1983 tarihinde Muş'ta doğdu. İlk, orta ve lise öğrenimini Muş'ta tamamladı. 2004 yılında Yüzüncü Yıl Üniversitesi(Y.Y.Ü) Fen Edebiyat Fakültesi Kimya Bölümü'nden mezun oldu. Aynı yıl Yüzüncü Yıl Üniversitesi Tezsiz Yüksek Lisans programına başladı ve bu programı 2005 yılında başarıyla tamamladı. Sonra Fizikokimya Anabilim Dalında Yüksek Lisans programına başladı. 2013 yılında Muş Alparslan Üniversitesinde Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında Tezsiz Yüksek Lisans programını bitirdi. 2014 yılında Muş Alparslan Üniversitesinde Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında Tezli Yüksek Lisans programını başladı. 2013 yılında Muş Alparslan Üniversitesine Öğretim Görevlisi olarak atanmış olup halen bu görevini sürdürmektedir. Evli iki çocuk babasıdır.